FRIEDRICH NAUMANN STIFTUNG Für die Freiheit.
Lebanon and Syria

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûriyayî ya Ragihandinê û Azadiya Derbirinê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# Endazyariya Demografîk li Sûriyê

## Encam yan sedemeke cengê ye?

1962 - 2021



# Endazyariya Demografîk li Sûriyê

## Encam yan sedemeke cengê ye?

1962 - 2021

**Navenda Sûrîyayî Ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê**

Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê navendeke sivîlane, serbixwe, ne hikûmî ya neqezencdar e, li ser avakirina civakekê ku azadîya derbirîn û bawerîyê, mafên mirovan û gihaştina bo dadmendîyê garantî dike, kar dike, nerîna wê cîhaneke demokratîk e li ser dadmendî, azadî, wekhevî û rêzdarîya li maf û rûmeta mirovan ava dibe. Ji çaxa damezrandina wê ve di 2004an de, Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê li ser berevanîya di ber mafên kesên setemxwar de ji ber nerîn û bawerîyên xwe, belavkirina çanda mafên mirovan û piştgirî û geşkirina ragihandina pispor, serbixwe û rexnegir kar dike, her weha navend xwedî posteke şêwirmendî ya taybet e di Encumena Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî de ji sala 2011an ve.

**Saziya Frêdrîş Nawman ji bo Azadiyê (FNF)**, ku Saziya Elmanî ya Siyaseta Lîbralî ye, sala 1958an ji aliyê Siyodor Hiyûs Serokê yekem yê Komara Elmaniya ya Federal ve hatiye damezrandin, Sazî ji bo bihêzkirina prensîpên lîbralî kar dike, beriya her tiştî jî Azadiya Takekesî ji bo bidestxistina kêfxweşiyê.

Saziya Frêdrîş Nawman bi hevkarî li gel hevbeşên xwe yên xwecihî, fikir û siyasetên lîbralî bi hêz dike, ew yek jî bi rêya perwerdeya sivîl, diyaloga siyasî ya navdewletî û şêwirmendiyên siyasî, armanca Saziyê li Lubnanê piştevaniya kompaniyên Lubnanî yên nû û rêxistinên civaka sivîl û partiyên siyasî yên lîbralî ye, û zêdekirina hişyariyê derbarê perwerdeya siyasî û bihêzkirina jinê û geşepêdana domane, ye.

Mafê çapê ji bo Navenda Suriyeyî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê, parastî ye 2021©

Mijdara 2022an

FRIEDRICH NAUMANN STIFTUNG Für die Freiheit.
Lebanon and Syria

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûriyayî ya Ragihandinê û Azadiya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

## Spasî û pêzanîn

Bê bejdarî û piştevaniya sereke ji aliyê şahidhalên ku bejdarî çavpêketinan bûne, ev raport pêk nedihat.

Spasî ji bo lêkolînerên ku bi hevkarî li gel tîma Navendê li ser pilan û cîbicîkirin û nivîsandina raportê, kar kirin, ji wan

Lêkolînerê sereke **Eymen Mun`im**

Lêkoler û bejdar **Nîzar Eiyûb, û Yûsif Wehbê, û Mensûr El-`Umerî**

Sepereştiya giştî **Mazin Derwîş**

Herweha em spasiya hemî endamên Navendê yên bejdarî di amadekirina çavpêketinan û di komkirina zaniyariyan de kirin, û di kar de heta encamdana raportê, alîkar bûn, dikin.

# NAVEROK


**Kurtasî** ........ 5

**Rêbaza lêkolînê** ........ 7

**Pêşgotin** ........ 7

**Danasîna aliyên çalak yên sereke ku di vê raportê de hatine, li gorî Alfabêyê** ........ 9

- Beşê yekem: Endazyariya Demografîk ........ 13
  - Yekem: Danasîna Endazyariya Demografîk ........ 13
  - Duyem: Alavên Endazyariya Demografîk ........ 17
- Beşê duyem: Endazyariya Demografîk li Sûriyê beriya 2011an ........ 21
  - Yekem: Cizîrêya Sûriyê: Dîrokek ji Endazyariya Demografîk ........ 21
  - Duyem: Yasakirina Endazyariya Demografîk ........ 24
  - Sêyem: Kurteyek derbarê guhertinên pêkhateyî yên civakî li Sûriyê ........ 26
- Beşê sêyem: xuyatirîn operasiyonên koçberkirina bi neçarî ji sala 2011an ve ........ 35
  - Koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran li ser destê Hêzên Hukûmeta Sûriyê ........ 35
  - Praktîkên koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran li Gundewarên Dîmeşqê ........ 41
  - Timamkirina koçberkirinê ........ 46
  - Xuyatirîn piroseyên koçberkirina bi neçarî yên ku Îran û milîsên bi ser ve, encam dane ........ 52
  - Xuyatirîn operasiyonên koçberkirina bi neçarî yên ku Rêveberiya Xweser ya Demokratîk encam dane ........ 58
  - Xuyatirîn operasiyonên koçberkirinê yên ku dagîrkeriya Trukî û komên alîgirên wê encam dane ........ 61
  - El-Nusra / Desteya Tehrîr El-Şam ........ 64
  - Dewleta Islamî li Îraq û Şamê-DA'IŞ ........ 66

**Rasparde** ........ 68

- Ji bo hemî aliyên milmilaniyê û Hukûmetên ku piştevaniya wan dikin ........ 68
- Hukûmeta Sûriyê ........ 68
- Opozisyona Sûriyê ........ 69
- Hukûmeta Turkiyê ........ 70
- Rêveberiya Xweser ya Demokratîk ........ 70
- Neteweyên Yekgirtî û Civaka Navdewletî ........ 70
- Neteweyên Yekgirtî ........ 71
- Civaka Navdewletî ........ 72
- Civaka Sivîl ya Sûriyê ........ 72
- Kompanî û weberhênerên egerkirî ........ 73
- Ragihandin û Ekadîmînas ........ 73

**Lîsteya çavkanî û jêderên zêde** ........ 74

# Kurtasî

**“Ji bo herkesê ji Sûriyê bo welatekî din xwe dûr xist û herkesî revî, Ez hêvî dikim venegere, eger Dewlet li te bûrî, em soz didin ku em ê ji bîr nekin û nebûrin.”**

`Emîd Îsam Zehredîn, di çavpêketineke xwe de li gel kenala El-`Ixbariye ya Sûriyê Îlûna 2017an[1]

Di heyama deh salan ji destpêkirina tevkera gelêrî sala 2011an de, û piştre şerê li Sûriyê, 3 ji 5 hemwelatiyên Sûriyê[2] neçar bûn ji malên xwe derbider bibin, hin ji wan neçar bûne ku bihtirî carekê derbider bibin. Derdora 14 milyon hemwelatiyên Sûriyê[3] bûne derbider û penaber, ango derdora 60 ji sedî ji hejmara hemwelatiyên Sûriyê. Derbarê wêrankirina avahiyan, Banka Navdewletî pêşbînî kir[4] ku ta destpêka 2017an derdora sêyekê xanî û derdora nîvê avahiyên pizîşkî û yên xwendinê rastî wêrankirina tevahî yan beşekî hatine. Herweha «Peymangeha Neteweyên Yekgirtî ya Rahênan û Lêkolînan - UNITAR, sala 2019an pêşbînî kir ku ji sala 2011an ve derdora 53% ji hemwelatiyên Sûriyê yên li bajar û bajarokan dijîn rastî ziyanê ji encama topbarana asmanî û şerûpevçûnên ku li nava bajar û bajarokan rûdidn, hatine.[5]

Piraniya lêkolîn û raportan tekezî li ser bombebarankirin û wêrankirina navçeyên niştecêbûnê yên li ser destê Hukûmata Sûriyê hatine encamdan, û li ser bikaranîna bombebarankirina bêserûber weke siyaseteke rêbazkirî di şerê xwe de li navçeyên bajarî, dikin, bi armanca isbatkirina tawanên cengî. Ev edebiyad bi şêweyekî bingehîn didin xuyakirin ku Hukûmet van tektîk û praktîkîn cengî ji bo sedemine leşkerî girêdayî bi bidestxitina serkeftina leşkerî ku bi çi nirxî jî be, dinave de jî tawanên cengê, bi kar tîne. Bi giştî armanca van edebiyatan isbatkirina siyaseta bombebarankirina bêserûber ya rêbazkirî ye weke bingeh ji bo twanbarkirina Hukûmeta Sûriyê bi pêkanîna tawanên cengî û tawanên li dijî mirovahiyê ye.

Tevî wê yekê jî, ev isbat û destnîşankirina niyaza Hukûmetê ji bo wêrankirina tevahî ya Cihên Sivîl, roleke sereke ji bo isbatkirina pilana Endazyariya Demografîk ku bi şêweyekî berfireh tê bicîkirin, nalîze.

Ji bo were isbatkirin ku Hukûmeta Sûriyê Endazyariya Demografîk ji bo bihêzkirina desthilata xwe li ser pişta nişteciyên resen, pêk tîne, divê siyasetên Hukûmetê yên piştî wêrankirinê beramberî navçeyên wêrankirî, werin lêkolînkirin, dinav de jî ya ku jê re dibêjin jinûveavakirin, serbarî babetên ku em di vê raporê de bi berfirehî şirove dikin weke berdewamiya Jinavbirina Bajaran, ku tê de em girêdana deverên pilanên rêxistinî yên berê û yên nû û deverên wêrankirin û herifandinê ji sala 2011an ve, nîşan didin.

Ev raport herwiha peywendiya di navbera pilanên rêxistinî yên beriya sala 2011an, pilanên nû û deverên wêrankirî yên piştî 2011an, şirove dike, û amaje bi wê yekê dike ku eger ev peywendî rewşî be yan sedemî be jî, lê awayê reftarên Hukûmeta Sûriyê piştî wêraniyê, pêwîstiya îsbatkirina sedemê red dike, û îsbat dike ku Hukûmeta Sûriyê Endezyariya Demografîk ya ciyawazker, bicî dike.

Eger niyaza sereke ya pêşdem ya bombebarankirina tevahî ya bajar û bajarokan, bidestxistina

1 Vîdiyoya kenala El-Cisir li ser YouTube, veguhestî ji çavpêketinekê li ser kenala El-`Ixbariye ya Sûriyê https://www.youtube.com/watch?v=PDbWKyI8uJE û çend vîdiyêyên wek wê hene.

2 “Piştî 9 salan ji êşûazar, vîn û hevgirtinê, divê cîhan penaber û derbiderên Sûrî ji bîr neke” 10ê Adara 2020an, UNHCR, https://www.unhcr.org/ar/news/press/2020/3/5e67d14b4.html

3 Rewşa Awarte li Sûriyê, UNHCR, https://www.unhcr.org/ar/58fc758e10.html

4 »Bandora berçav ya Şerê li Sûriyê, dibe ku Tenê beşekî kêm ji bandoreke mezin be”, 10ê Tîrmeha 2017 Banka Cîhanî, https://www.albankaldawli.org/ar/news/press-release/2017/07/18/the-visible-impacts-of-the-syrian-war-may-only-be-the-tip-of-the-iceberg

5 “Atlasa Ziyanên gehiştine Bajarên Sûriyê”.

serkeftina leşkerî be (bi rêya tawanên cengî jî be), yan beşek ji pilaneke Endazyariya Demografîk be jî, lê tişta ku Hukûmet piştî wêrankirinê pêk tîne, temamkirina tawana Endazyariya Demografîk ya c ciyawazker, destnîşan dike. Di herdu rewşan de jî, tê xuyakirin ku Hukûmetê ji rewşa niha ya ji encama tawanên koçberkirina bi neçarî û wêrankirinê, ji bo temamkirina stûnên Endazyariya Demografîk, sûd wergirtiye û bi kar tîne, wate eger Hukûmet hewla vegera mafan bo xwediyên xwe, û berçavbirina mafên mulkiyetê weke bingeh û merc ji bo her piroseyeke avakirin û dubareavakirinê, nede, Hukûmet dibe berpirs di ber de.

Ev lêkolîna ku ji aliyê Navenda Belgekirina Binpêkirinan ve bi sernavê «Endazyariya Demografîk li Sûriyê: Encam yan sedemeke cengê ye» hatiye berhevkirin, piroseyên koçberkirina niştecêyan û wêrankirina avahiyan di çarçoveya guhertina bi niyaz ya pêkhateya demografîk li Sûriyê, li gorî Endazyariya Demografîk, şirove dike.

Lêkolîn pêvajoyên demografîk yên pêş û yên serdemê milmilaniyê, dişopîne, û têgehine nûjen weke Endazyariya Demografîk û Jinavbirina Bajaran di çarçoveya rewşa Sûriyê de, naşîn dide, herweha xuyartirîn piroseyên koçberkirinê li Sûriyê tîne zimên.

Ev lêkolîn li ser sedemên siruştî yên guhertina demografîk, weke hejmara jidayikbûyan û derbideriya siruştî berev bajaran ve, û sedemên girêdayî seqayê ve û sedemine din, naxebite, lêbelê tekeziyê dixe ser hewlên bi niyaz yên ji bo guhertina demografîk, wate Endazyariya Demografîk, û balê dikişîne ser rola helwestên siyasî û yên olî û yên neteweyî û yên corbicor yên ku weke handan ji bo koçbarkirin û karên dirindane ku niştecê neçar kirin ku ji mal û navçeyên xwe koçber bibin, hatin bi kar anîn.

Di beşê xwe yê yekem de, raport bi berfirehî li ser danasîna herdu têgehên Endazyaria Demografîk û Jinavbirina Bajaran radiweste, ji ber ku ew herdu têgeh nûjen in, û danasînên wan ciyawaz in, û di rastî de ti hebûna wan herdu têgehan di Yasayên Navdewletî de weke têgeh yan danasîn, tunene, lêbelê ew herdu têgeh weke derwazeyeke berfireh ji bo têgehiştin û şirovekirina bûyerên li Sûriyê hatin bikaranîn, dinav de jî koçberkirina bi neçarî û wêrankirina Cihên Sivîl yan avahiyan. Raportê hewl da ku herdu têgehan derbasî çarçoveya Yasaya Navdewletî bike, û pêngavên pêşîn û dîtinên destpêkî derbarê girêdana wan bi rewşa Sûriyê ve, duriust bike.

Di beşê xwe yê duyem de, Raport li ser kiryarên Endazyariya Demografîk li Sûriyê beriya destpêkirina Şoreşa Sûriyê, dixebite, û bandorên wê weke yek ji tevgêrên sereke yên Şoreşa Sûriyê û milmilaniya niha, şirove dike.

Di beşê xwe yê sêyem yê dawiyê de, raport xuyatirîn kiryarên Endazyaria Demografîk li Sûriyê yên hevdemî destpêkirina Şoreşa Sûriyê Adara 2011an, tîne ziman, ew kiryarên ku ji aliyê Navenda Belgekirina Bipnêkirinan li Sûriyê hatine belgekirin, û tîma çavdêran ew kiryar kom kirine, û li gorî pêkîner dabeş kirine, ew pêkîner jî ev bûn: Hukûmeta Sûriyê, Opozisyona Sûriyê, Rêveberiya Xweser ya Demokratîk, Dagirkerê Turk û girûpên çekdar yên bi ser ve, serbarî kiryarên Îran û Hêzên ku ew piştevaniya wan dike.

Em raportê bi hejmarek rasparde «Pêşinyar» ji bo aliyên milmilaniyê û civaka navdewletî û aliyên berjewendîdar, bi dawî dikin, û em tekeziyê li ser bidawîkirina piştguhkirina berçav ya ku ji aliyê civaka navdewletî û aliyên peywendîdar derbarê dosyaya niştecêbûn û zevî û mulkiyeta li Sûriyê heye, dikin, û giringiya dîtina wê dosyayê weke karê pêşîn di her danûstandinekê de, dikin, û em tekeziyê li ser wê yekê dikin ku ev maf weke bingeheke sereke di her piroseyeke çareseriyê de li Sûriyê, were dîtin, serbarî gerentiya karîna derbider û penaberan ji bo ku di dema guncaw de vegerin bo mal û navçeyên xwe. Herweha rawestandina piştguhkirina qurbaniyên koçberkirinê û xwediyên mafan û bihêzkirina wan ji bo bejdariyê di her piroseyên biryarê yên girêdayî mal û mulkên wan û vegera wan, û bihêzkirina karîna wan ji bo xistina bandorê li ser standina Biryarên girêdayî çarenivîs û malûmulkên wan, bibin.

# Rêbaza lêkolînê

Ev lêkolîn li ser hejmarek jêder û alavan hatiye berhevkirin, di nav de lêkolîna li nivîsgehê û ya meydanî, û axaftinên qurbanî û şahidhalan, û nerînên pisporan û belgekarên lêkoleran yên berê yên Navenda Belgekirina Binpêkirinan li Sûriyê.

Lêkoleran Yasayên Sûriyê yên peywendîdar şirove kirin û li raportên Neteweyên Yekgirtî û li Komîteya Vekolînê ya taybet bi Sûriyê û li Rêxistinên Mirovî yên Navdewletî û Rêxistinên Mafên Mirovan û Rêxistinine din, vegeriyan.

Lêkolerên Navenda Belgekirina Binpêkirinan li Sûriyê hevdîtin bi rêya peywendiyên telefonî û rûbirû li gel hejmarek şahidhal û qurbaniyan re li hinder û derveyê Sûriyê, pêk anîn. Herweha daxuyaniyên aliyên milmilaniyê li Sûriyê, dinav de jî Hukûmeta Sûriyê, bi rêya alavên ragihandinê yên hukûmî û pilatformên hukûmî yên peywendîdar, belge û şirove kirin.

Ji bo silametiya hejmarek ji şahidhalan, Navendê navên wan neanîn ziman yan jî navine din li wan kirin.

# Pêşgotin

Ji ber cihê wê yê navendî, ji hezarên salan ve, Sûriye xwedî hejmareke hemereng ya komên neteweyî û olî ye, Sûriye cihê gelek navendên niştecêbûnê yên herî kevin li cîhanê ye, dinav de jî Heleb ku li gorî gelek jêderan kevintirîn bajarê ku hatiye niştecêkirin li cîhanê ye. Lê tevî wê yekê jî, ev hemerengî heta radeyeke mezin di milmilaniya niha li Sûriyê, alîkar bû, û xewnên komên neteweyî û olî yên cudacuda di bihtirkirina destdanînê li ser desthilatan li dijî hev, geş kirin.

Lawaziya parastina dewletê û lawaziya mafên sereke, dilsozî bo netewe û tayîfe û ol li ser pişta têgeha hemwelatîbûnê û li ser pişta dilsoziya ji dewletê, bi hêztir kir. Ev yek weke faktereke sereke di gurkirina milmilaniya niha û bihêzkirina destwerdana biyanî ya ku bi şêweyekî bingehîn pişta xwe bi wan dilsoziyan girê dida, bû.

Bi dirêjahiya bihtirî pêncî salî, partiya El-Be`is ya desthilatdar û Rêjîma El-Esed, ew dilsoziya bo netewe û tayîfe û olê, bi armanca bikaranîna wê di kontirolkirina welêt de, bihêztir dikir. Hukûmeta Sûriyê bi dehên salan pişta xwe bi wan dilsoziyan di rêvebirina siyasetên Endazyariya Demografîk de li seranseî Sûriyê, girê dida.

Siyasetên Endazyariya Demografîk ji destpêka milmilaniya li Sûriyê bi hêz, hebûn, û li gel wê milmilaniyê di qonaxên corbicor de, man. Qebareya guhertina demografîk bi wirdî di deh salên bûrî de ku heta niha jî berdewam e, nayê zanîn, ew guhertin li ser destê hemû aliyan bi rêya koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran, hatiye encamdane, ew yek jî bi armanca berhevkirina civatine wekhev ango xwerû tayîfî, mîna Rêkeftina herçar bajaran, û civatine neteweyî li hin navçeyên Rêveberiya Xweser ya Demokratîk yan li hin navçeyên dagirkeriya Turk û girûpên Opozisiyona Sûriyê yên bi ser ve.

Di Hizêrana 2018an de «Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya taybet bi Sûriyê» raporta xwe derbarê dorpêçkirina Xûtaya Rojhilat belav kir, tê de got ku [6] dorpêçkirina Hêzên Hukûmeta Sûriyê ji Xûtayê re «Dirêjtirîn dema dorpêçkirinê di dîroka nû de ye», û got ku «Ev şêwazê şer li Sûriyê şêwazekî hovane ye û yê serdemê sedsalên naverast e», û tê de behsa ziyanên mezin yên hemwelatiyan ji aliyê laş û derûnî ve ji encama bombebarana hemahema rojane û bêparkirina dijwar ku bû sedema hejmarek rewşên jiyanjidestdanê hevdemî ku karîn ji bo rûnedana wê rewşê, hebû.

Ji Nîsana 2011an ve, Hukûmeta Sûriyê dest bi dorpêçkirin û birçîkirina bajar û bajarokan kir û xwarin, derman û pêdiviyên jiyanê li ser wan qedexe kirin, ew yek jî weke bersivdanekê bû li dijî xwepêşandanên gelêrî ku li seranserî Sûriyê rûdan ku dê de daxwaza çaksazî û mafên sereke hatin kirin. Ev dorpêçkirin û birçîkirin û sizayên komî ku bi salan berdewam kirin, bû sedem ku gelek kes ji navçeyên dorpêçkirî derbider bibin. Hevdemî bombebarankirina berdewam ji aliyê Hukûmeta Sûriyê û armanckirina sivîlan û jêrxaneyê, dinav de jî nexweşxane û saziyên xizmetguzariyê, Hukûmetê tenê rêyek li pêş sivîlan heta ku jiyana xwe rizgar bikin danî, ew jî derbiderî ji van navçeyan bû.

Hukûmeta Sûriyê siyaseta bombebarankirina seranserî bê ku parastina sivîlan yan Cihên Sivîl berçav bibe, şopand, wê yekê bi milyonan neçar kir heta ku jiyana xwe rizgar bikin derbider bibin. Hêzên Sûriyê di bombebarankirina van navçeyan û wêrankirina wan de berdewam bûn, heta ku êdî ev navçe bi kêrî niştecêbûnê nehatin. Niştecêyên ku tirsan yan nikarîn derbiderî navçeyên li jêr destê Hukûmetê bibin, neçar bûn ku li ser derbideriyê berev navçeyên jêr kontirola Opoziysonê, êrê bikin, ew yek jî bi rêya «Rêkeftinên Lihevhatinê».

Hukûmetê gotara aramncikirina himbêza gelêrî ya Opozisyonê weke giringî ji bo serkeftina leşkerî di ragihandina xwe û dinava alîgirên xwe de bi kar anî, serokê dewletê Beşar El-Esed piştevaniya vê gotarê kir û ew yek bi hêz kir, di gotara xwe ya sala 2014an behsa rola himbêza gelêrî ya Opozisyonê kir û got: «Em himberî bi deh hezaran ji terorîstan in.. li pişt van terorîstan himbêzeke civakî heye, malbatek heye, cîranek heye, mirovek heye, hevalek heye».

Netweyên Yekgirtî di raporta xwe ya Gulana 2018an de got ku gelo çawa Hukûmeta Sûriyê tenê bijardeyek li pêş sivîlên ku ji aliyê wê ve hatine dorpêçkirin daniye, ango divê ji malên xwe derkevin û derbiderî navçene berê destnîşankirî bibin:

> **Piştî ku aliyê desthilatdar derbasî agirbest û Rêkeftina derxistina sivîlan dibûn, yekser piraniya sivîlan rastî sizane din dihatin, ew jî tenê bijardeya bicih-hiştina malên xwe, heta ku di navçeyên hundirê Sûriyê de berev cihine berê destnîşankirî ku piraniya caran ne bi xwesteka wan jî bû, derbider bibin ango bêcihûwar bimînin. Man jî ji bo sivîlan tê wateya ku dê rûbirûyê metirsiya tolhildanê li ser destê aliyê serkeftî bibin.**

Piştî Rêkeftinan, Hukûmeta Sûriyê gelek çîn armanc kirin, êdî kesên di warê pizîşkî û pêşkêşkirina xizmetguzarî û hawarçûnê de kar dikirn bûn armanceke sereke ya tolhildana dewletê, mîna girtin, işkencekirin û terorkirin. Ji ber wê yekê ev kes û malbatên xwe berî her kesî hewla derketinê dan.

Li gorî Neteweyên Yekgirtî ku bi tenê di sala 2018an de, derdora 50 hezar kesî di çarçoveya rêkrftinên xwecihî yên agirbestê de, derbider bûn.

Piştî bombebarankirin û koçberkirinê, Hukûmeta Sûriyê hin tax bi tevahî roxandin, dewletê

---

6 »Tawanên cengê û tawanên li dijî mirovahiyê ji taybetmendiyên dorpêçkirina Xûtaya Rojhilat û piroseya vegerandina wê ne20 ,«ê Hizêrana 2018an, Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya taybet bi Sûriyê, https://www.ohchr.org/AR/HRBodies/HRC/Pages/NewsDetail.aspx?NewsID=23226&LangID=A

û ragihandina wê gelek çîrok derbarê sedema wê roxandinê belav kirin. Carinan bi behaneya rêxistina avakirinê û carinan jî bi behaneya jinavbirina terorîstan, lêbelê fakterê hevbeş di van piroseyan de ew bû ku nişteciyên van tax û navçeyan ji Opozisyonê bûn yan li jêr destê Opozisiyonê bûn.

Berbelavbûna piroseyên roxandina li piştî valakirinê û rêznegirina li mafên mulkiyetê li wan deveran, nîşana nebûna niyaza Hukûmetê derbarê rêpêdana vegerê ji bo koçberkiriyan e, û tê wateya bicîkirina guhertina demografîk ya bi niyaz ji aliyê Hukûmetê ve li gelek ji van navçeyan.

Li navçene din ên Sûriyê, şerûpevçûn li ser bingehine neteweyî navbera Opozisyon û Rêveberiya Xweser rûdan, ku bû sedema koçberkirina li ser bingehine neteweyî li ser destê Hêzên Rêveberiya Xweser û Hêzên Opozisyonê yên piştevankirî ji aliyê Turkiyê ve. Herweha hin komên Opozisyona Islamî û tundurew koçberkirin li ser bingehine olî û tayifî pêk anîn, dinav de jî El-Nusre û DAI`Ş.

# Danasîna aliyên çalak yên sereke ku di vê raportê de hatine, li gorî Alfabêyê

## Ehrar El-Şam

Tevgera Ehrar El-Şam ya Islamî: Girûpeke çekdar ya Islamî ya Sunî ye, û yek ji girûpên şerker yên sereke ye, sala 2011an ji bo şerê Hukûmeta Sûriyê hatiye avakirin, li ba Tevgerê dîtineke siyasî û civakî heye û hewla avakirina dewleteke Islamî dide.

Teveger li ser malpera xwe ya elektironî[7] xwe weha dide naskirin: «Tevgereke Islamî ya tevahî ye, kar ji bo rizgarkirina xak û mirov û avakirina civakeke islamî şaristanî li Sûriyê bi rêya karê saziyane, dike».

Ji armanên Tevgerê[8] «Hewl dide ji bo avakirina dewleteke islamî ku bi şerî`eta Xwedê ya rasteqîne, desthilatê dike» û «Parastina nasnameya islamî di civakê de».

Tevgerê di daxuyaniya xwe ya damezrandinê[9] de gotiye ku ew islama Sunî di raman û kar de, dişopîne.

7 »Derbarê Tevgerê«, malpera elektironî ya Ehrar El-Şam.

8 Heman jêder.

9 Daxuyaniya damezrandinê ya Ehrar El-Şam »Arşîfa internêtê«.

## Dagirkeriya Turk

Bi piştevaniya girûpine leşkerî yên Opozisyona Sûriyê, Artêşa Turkiyê operasiyonine leşkerî li Bakurê Rojhilatê Sûriyê encam dan, û ew navçe bi leşkerî dagîr kirin. Niha, Turkiye serpereştiya leşkerî û ya ewlekarî ya wan navçeyan dike, û piştevaniya girûpên çekdar yên li wan navçeyan li jêr navê «Artêşa Niştîmanî ya Sûriyê» dike. Turkiye bihtirî 50 hezar şervanên Sûriyê rahênan dike û mûçeyan dide wan[10]. «Zimanê Turkî weke zimanê duyem tê xwendin û nexweş li nexweşxanene Turkî ku li wan navçeyan hatine avakirin, têne dermankirin, herweha elektirîk ji Turkiyê tê dabînkirin, û bihtiriya tevgera aborî bi Lîreya Turkiyê ye».[11]

## Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Pirojeya rêvebirin û hukumkirina navçeyên Bakurê Rojhilatê Sûriyê, ji aliyê Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd ve hat damezrandin, ew yek jî li gorî pirensîpên demokratîk û niştîmanê hevbeş û maf û azadiyan ku li ser malpera xwe ya elektironî belav kirine[12], û hewl dide ji bo «Bidawîkirina serdestiya nerênî ya aydiyolojîk û zanistî ku bi matêriyalîzima mîkanîkî û dogmatîzimê ku ji aliyê sîstema nûjenkariya sermayedariyê li ser cîhanê hatiye ferizkirin, tê naskirin».

Rêveberiya Xweser kontirola navçeyên Bakurê Rojhilatê Sûriyê dike, dinav de navçeyên ku kurd lê piranî ne û navçeyên ku Hêzên Sûriyaya Demokratîk ji destê DA`IŞê rizgar kirine.

## Hizbulah

Danasîna malpera Oksfordê ya lêvegerî[13]: «Girûpeke Şî`î tundurew e, girêdanên wê yên kûr bi Îranê re hene, piştî Şoreşa Îranî ya sala 1979ê hat avakirin û bi taybet li Lubnanê çalak e».

Ferhenga Oksfordê ya Islamî wê weha dide nasîn[14]: Tevgereke siyasî û civakî ye, di destpka salên heştêyan de bi armanca veguhertina Lubnanê bo dewleteke Islamî, hat damezrandin.

Li gorî Hesen Nesrullah[15] Emîndarê Giştî yê Hizbulahê ji sala 1992: Hizbulah «Partiyeke islamî, şî`î, îmamî, dozdehî ye û piştevaniya xwe ji Îranê dibe[16].

«Hizbula»a Lubnanî xwedî hejmarek endam di perleman û hukûmetê de ye, û xwedî baskekî leşkerî ye ku operasiyonine leşkerî li derveyê Lubnanê encam dide, operasiyonên wê yên herî giring li Sûriyê ne.

10 »Pilana mezin ya Turkiyê li Sûriyê çi ye?- Financial Times«, BBC erebî, 26ê Tîrmeha 2022an.

11 Heman jêder.

12 » Pirojeya Rêveberiya Xweser«, malpera elektironî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk.

13 Oxford University Press (2006). Ḥizbullāh, The Oxford Dictionary of Phrase and Fable. https://www.oxfordreference.com/view/10.1093/oi/authority.20110803095939353

14 Oxford University Press (2003). Hizb Allah, The Oxford Dictionary of Islam. https://www.oxfordreference.com/view/10.1093/acref/9780195125580.001.0001/acref-9780195125580-e-862

15 »Nesrullah: Em partiya şî`î îmamî ne û em dev ji Filestînê bernadin«, BBC Lubnan/Youtube, 2ê Tebaxa 2013an.

16 »Hemû nivîsa gotara Birêz Nesrullah di bîranîna çilîya serkirdeyê cîhadî yê mezin şehîd Mustefa Bedreddîn» , Kenala El-Menar, 24ê Hizêrana 2016an.

## Eniya El-Nusra / Desteya Tehrîr El-Şam

Eniya El-Nusra li-Ahil El-Şam (Eniya El-Nusra ji bo xelkê Dîmeşqê) yan Eniya El-Nusra: Girûpeke çekdar ya islamî ya Sunî ya tundirew e, sala 2011al li Sûriyê hat damezrandin, û bi Rêxistina El-Qa`îde ya li Îraqê ve hat girêdan û bû bi ser Rêxistina El-Qa`îde ya li Efxanistanê [17]. Sala 2016an, El-Nusra got ku ew ne bi ser ti aliyî ve ye, wate cudabûna wê ji Rêxistina El-Qa`îde[18], û navê xwe guhert bo «Eniya Fetuh El-Şam». Sala 2017an piştî ku girûpine din ên çekdar tevlî xwe kirin, navê xwe guhert bo «Desteya Tehrîr El-Şam».

Desteya Tehrîr El-Şam kontirola hin navçeyên parêzgeha Idlib û derdorê dike, û bi rêya «Hukûmeta Rizgarî ya Sûriyê» wan navçeyan birêve dibe.

El-Nusre li dijî kêmîneyên olî li Sûriyê, xwedî helwesteke tund e, mîna Durzî û Elewiyan, û wan weke derketî ji islamê bi nav dike, û kar ji bo neçarkirina wan bo guhertina bîrûbûçonên xwe heta ku hevşêweyê bîrûbûçonên El-Nusreyê bin, dike.

## Artêşa El-Islam

Artêşa El-Islam: Girûpeke çekdar ya islamî ya Sunî ye[19], sala 2013an bi yekbûna Lîwaya Islam ya çekdar û girûpine din ên çekdar hat damezrandin, yek ji mezintirîn girûpên çekdar li Sûriyê ye. Tevger xwedî dîtineke siyasî û civakî ye û hewl ji bo avakirina dewleteke islamî dide.

Artêşa El-Islam di malpera xwe ya elektironî de[20] xwe dide naskirin ku ew girûpeke leşkerî ya dijber e, şervanên xwe li gorî eqîdeya islamî ava dike, «Û berovajiyê rêxistinên tundirew, mîna Dewleta Islamî li Îraq û Şamê (DA`IŞ) û Eniya El-Nusra, ew rêbazeke miyanrew dişopîne «.

Artêşa El-Islam nerînine olî ku handanê li ser dunûtujiyê li dijî kêmîneyên olî yên Sûriyê mîna Elewiyan, li xwe digre. Rêberê berê yê Artêşa El-Islam, Zehran Elûş, Elewî weha bi nav kirin «Ji Cuhû û Nuseyriyan gawirtir in», pişta xwe bi Ibin Teymiya, Zanayê Islamî yê sedsalên naverast, girê da, ku li ser Elewî û Durziyan fetwa dabû û gotibû ku ew gawir in û divê bêne kuştin.

17 »Eniya El-Nusra ya Sûriyê bey`etê bo El-Zewahirî Rêberê El-Qa`îde dide«, Reuters, 10ê Nîsana 2013an.

18 Arşîfa internênê.

19 » Gotara Serkirdeyê Giştî yê Xûtaya Rojhilat û serkirdeyê Artêşa El-Islam Şêx Zehran `Elûş Aba Abdullah«, Youtuba Hekîm Cebir, 30ê Nîsana 2015an.

20 » Em kî ne«, Malpera elektironî ya Artêşa El-Islam«.

## Hêzên Sûriyaya Demokratîk


Hêzeke leşkerî ye ku Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê piştevaniya wê dike, û Yekîneyên Parastina Gel, baskê leşkerî yê Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd[21] a Sûrî ku baskê Partiya Karkerên Kurdistanê[22] ya li Turkiyê ye, serkirdayetiya wê dikin.

Wîlayetên Yekgirtî di gelek boneyan [23] de niyaza xwe ji bo hebûna hêzeke xwecihî[24] li ser xaka Sûriyê weke alîkar di şerê li dijî Rêxistina Dewleta Islamî-DA`IŞê de, aniye ziman.

Di 11ê Cotmeha 2015an de, komek ji girûpên çekdar avakirina Hêzên Sûriyaya Demokratîk ragihandin[25], û dane nasîn ku ew «Hêzeke leşkerî niştîmanî yekgirtî ye, ji bo hemû Sûriyan e, û ji Kurd û Ereb û Suryan û hemû pêkhateyên din ên li ser ciyografiyaya Sûriyê hene, pêk tê. Û armanca vê hêzê, avakirina Sûriyayeke demokratîk e».

Di 30ê Cotmeha 2015an de, Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê şandina hêzine Emerîkî ji bo hemahengiya[26] Hêzên bejayî yên xwecihî li gel hewlên Hevpeymaniyê li dijî DA`IŞê, ragihand.

### Nexşeya kontirolê li Sûriyê, 01ê Çileya 2022an, Liveuamap




21 «» Encûmena Niştîman ya Kurdî li Sûriyê«, Navenda Malcom Kerr-Carnegie ya Rojhilata Naverast.

22 » Li jêr desthilata kurdî: Binpêkirin li navçeyên jêr desthilata Partiya Yekîtiya Demokrat li Sûriyê«, Human Rights Watch, 18ê Hizêrana 2014an.

23 Why Obama's assurance of 'no boots on the ground' isn't so reassuring, Rosa Brooks, The Washington Post, 26 September 2014.

24 Daily Press Briefing by the Press Secretary Josh Earnest 10/30/15, Obama White House Archives, 30 October 2015.

25 » Hêzên Sûriyaya Demokratîk: Daxuyaniya jimare (1)» , Rûpela fermî ya Facebookê ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG), 12ê Cotmeha 2015an.

26 U.S. Will Send Special Operations Troops to Help Fight ISIS in Syria, NPR, 30 October 2015.

# Beşê yekem: Endazyariya Demografîk

### Danasîneke kurt:

Têgehek e ku nîşana guhertina bi niyaz ya pêkhateya niştecêbûnê li navçeyekê dike, û Endazyaria Demografîk armanca niştecê û navçeyên niştecêbûna wan dike.

## Yekem: Danasîna Endazyariya Demografîk

### Demografîk:

Ji aliyê zimên ve: bi Ingilîzî: Demography ye. Ev peyv vedigere yûnaniya kevin, ji peyva «Demo» ango xelk, û «grafîk» ango pîvan yan wesif, pêk tê.

Weke têgeh: Îro Demografîk weke zanista niştecêyan yan lêkolînên niştecêbûnê û bi taybet girêdayî hejmar û densîtî û belavbûna ciyografî, tê danasîn. Û guhdanên demografîk yên serdemî û danûstandina navbera xelk û geşepêdana aborî, qerebalixa bajaran, û koçberkirina nerewayî û babetine din, li xwe digre. Ew yek, wê ji zanistên din yên girêdayî niştecêyan, weke Enterpolojîst / zanista mirov ango mirovnasî û deronnasî û babetine din, cuda dike.

«Peymangeha Maks Plank ya Lêkolînên Demografîk» Demografikê weha dide nasîn:[27]

> Zanista niştecêyan: Zanayên demografikê hewl didin ku dînamîkên niştecêyan bi rêya vekolînê di sê operasiyonên sereke yên demografikê de, têbigihin: jidayikbûyî, koçberî, û pîrbûn (mirin jî dinav de). Ev hersê babet di duristkirina guhertinan niştecêyan, alîkar in, dinav de jî çawaniya niştecêbûna xelkê ji zeviyî re, û avakirina milet û civakan, û pêşxistina çandê.

### Peymangeh tekez dike ku:

Demografîk nikare şêwirmendiya siyasî derbarê çareserkirina guhertina demografîk pêşkêş bike, lêbelê, zanayên demografikê hewl didin ku diyardeyên girêdayî wê guhertinê bidin nasîn, û sedemên wê têbigihin. Bi rêya bikaranîna datayên belgekirî û çareseriya serhijmarî ya van serhijmaran. Lêkolîna nûjen ya demografikê hejmarek beşên zaniştî li xwe digre, dinav de jî bîrkarî, aborî, zanisên din ên civakî û ciyografi yan zanista zindiyan.

Endazyarî: Ferhenga Oksford têgeha Endazyarî[28] weke kar weha dide nasîn: «Rêzbendiya bi zîrek û nihênî ya piraniya caran, ji bo rûdana tiştekê, bi taybet tiştekê ku di berjewendiya te de be» yan: «Avakirina tiştekê bi rêya pirensîpên zanistî».

Serbarkirina peyva «Endazyarî» ji bo «Demografîkê», wê vediguhere bo karekî bi niyaz û birêxistinkirî û pêş-pilankirî ji bo guhertina demografîk ya niştecêbûnê, dibe ku ne-eşkere be, ji ber girêdana peyva Endazyariyê ya pêş cîbicîkirinê bi wirdbûn, niyaz û pilanê re.

Danasînên Endazyariya Demografîk di edebiyatên ekademîk de ji aliyê berfirehî û balkişandinê ve cudacuda bûn, lêbelê di gelek xalan de hevbeş bûn, xala herî giring guhertinta pêkhateya

27 "What is Demography?", Max Plank Institute for Demographic Research, retrieved 13 Oct 2021, https://www.demogr.mpg.de/en/about_us_6113/what_is_demography_6674/

28 Engineer (v.t) in Cambridge Dictionary site, https://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/engineer

esnî ya navçeyekê ji aliyê welatan[29] yan ji aliyê Hêzên desthilatdar ve ye, dinav de jî niştecêkirina girûpên zorîne[30] li navçeyên dûr yên ku kêmîne lê niştecê ne, û dubareniştecêkirina kêmîneyan li navçeyên hundir yên welêt. Gelek rêkar û şêwazên Endazyariya Demografîk hene, ji wan ên ku dewlet bi behanene corbicor encam dide, mîna ewlekarî û rêxistinkirin û rêvebirina nakokiyên navdewletî yan yên xwecihî, hin ji wan digihin asta jinavbirina bi kom, ku yek ji dirindetirîn tawanên navdewletî ye. Herweha dewlet Endazyariya Demografîk ji xwe re di rûbirûbûna milmilaniyên derve û yên hundir ji bo bihêzkirina kontirola xwe li ser sînor û navçeyên ku kêmîneyên esnî lê niştecê ne, bi kar tîne. Weke mînak, piştî nakokiyên Çîn û Soviyetê (1959-1982), derkirina Rûsiyan û dubareniştecêkirina esniya Elhan ya çînî li navçeyên sînorê Çînê bi Yekîtiya Soviyetê re, bihtir bû, piroseyên dubareniştecêbûnê armanca navçeyên ku esniya Rûsî lê niştecê bû, dikir. Li aliyê Soviyetê jî, piroseyên derkirina çîniyan û dubareniştecêbûna Rûsiyan li navçeyên sînorî, bihtir bûn.

Têgeha Endazyariya Demografîk di gelek lêkolînan de hatiye, piraniya wan tekezî li ser bingeha esnî û olî ya Endazyariya Demografîk, kirine, ji wan:

"Endazyariya Demografîk[31]: Tevgera komên esnî ya ku dewlet weke rêkar ji bo rêxistinkirina milmilaniyê, birêve dibe" ya Pirofesorê Êrlendî Con Mekgrî, ku tê de behsa niştecêkirina komên zorîne li navçeyên dûr ên ku kêmîne lê niştecê ne, û dubareniştecêkirina kêmîneyan di navçeyên hundir ên dewletê de, dike. Mekgrî di lêkolîna xwe de sedemên livandina dewletan ji komên esnî û rewşên wan, gengeşe dike.

Pirofesor Mîlîka Zarkofîtş Bokman di pirtûka xwe de: «Endazyariya Demografîk û milmilsniya ji bo desthilatê» sala 1997an, şirove dike[32] û dibêje: Aya çawa hejmara giştî ya niştecêyên dewletê êdî di destnîşankirina desthilatê de, ne fakterê yekalîker e, û Endazyariya Demografîk bûye alaveke kontirolê bi rêya dana desthilat û aboriyê bo çîneke esnî yan olî li ser pişta çînên din ên niştecêyan.

Ekadîmînasê Turk Nesîm Şîkir di gotara xwe sala 2007an de danasîna Endazyariya Demografîk[33] berfireh kir, û got:

> Têgeheke nû ye, ji bo şiroveya koçberkirina bi neçarî û jinavbirina esnî di sedsalên dawiyê de li hejmarek navçeyên cîhanê, weke Belqan û Qefqaz û Efrîqiyayê, hat bikaranîn. Tevî wê yekê jî, bikaranîna vê têgehê tenê di navçeyekê û / yan di serdemeke dîrokî de, neguncaw e, ji ber ku ew têgeh destwerdana dewletê di babetên girêdayî asta niştecêyan û avakirin, belavbûn û zêdebûn / kêmbûnê de, destnîşan dike. Bi gotineke din, em dikarin her program yan siyaseteke hukûmî ya bi niyaz weke Endazyariya Demografîk bidin nasîn eger li ser bingeha ciyawaziya olî / esnî, yan ji bo sedemine siyasî, yan stratejîk, yan ayidiyolojîk bi armanca bihêzkirina hêza siyasî û aborî ya komeke esnî bi tenê li ser pişta komên din bi rêya destkariyê di niştecêyan bi rêkarine corbicoe, bin

29 John McGarry (1998) 'Demographic engineering': the state-directed movement of ethnic groups as a technique of conflict regulation, Ethnic and Racial Studies, 21:4, 613-638, DOI: 10.1080/014198798329793

30 McGarry, J. (1998). 'Demographic engineering': the state-directed movement of ethnic groups as a technique of conflict regulation. Ethnic and Racial Studies, 21, 613-638.

31 Ibid.

32 Bookman, M.Z. (1997). The Demographic Struggle for Power: The Political Economy of Demographic Engineering in the Modern World (1st ed.). Routledge. https://doi.org/10.4324/9781315037738

33 Nesim Şeker (2007) Demographic engineering in the late Ottoman empire and the Armenians, Middle Eastern Studies, 43:3, 461-474, DOI: 10.1080/00263200701246157

Herweha Pirofesorê Holendî Or Omît Angor, di pirtûka xwe ya sala 2011an: «Duristkirina Turkiyeya Nû[34]- Milet û Dewlet di rojhilatê Anadolê de 1913-1950» di lêkolîn û hurguliyên Endazyariya Demografîk de berfireh bû, ku tê de behsa wê yekê dike ku sîstema nû ya Turkiyê ji sala 1913an ve li rojhilatê Anadolê rastî şêwene corbicor ji siyasetên niştecêbûna neteweyî hat, bi armanca yeksankirina esnî ya nevçeyê û tevlîkirina wê dinava dewleta neteweyî ya Turkî de. Angor alavine sereke ji bo Endazyariya Demografîk destnîşan kirin, ji wan: Destkarî di serhijmariya niştecêbûnê de, guhertina bi neçarî ya çand û ziman, xistina fişaran ji bo koçberkirinê, guhertina niştecêbûnê, jinavbirina esnî û jinavbirina bi kom.

Tevî nûjeniya rêjeyî ya Endazyariya Demografîk weke danasîn û weke warekî lîkolînê, lêbelê ew wek praktîk, bi demeke dirêj li pêş danasînê ye, bi giştî bi milmilanî û cengan ve girêdayî bû. Dibe ku praktîkên Endazyariya Demografîk vedigerin beriya zayinê, dibe ku weke lêkoler binav dikin[35] Jinavbirina bi kom ya yekem di dîrokê de hatiye belgekirin, ew bû dema ku Romaniyan Qertaja ya ku îro li Tûnisê ye, piştî milmilaniyekê li ser dahat û kontirola li deverê, dagîr kir, û ew bajar piştî ku yek ji mezintirîn şaristaniyên wê serdemê bû, bi tevahî sala 146an beriya zayinê, wêran kir, Piştî sedsalî, Romaniyan bajarekî nû li cihê wî bajarî ava kir, ji ber wê yekê zaniyarî li ser aliyê madî yê wî bajarê Fînîqî pir kêm in[36], dibe ku ev bûyera dîrokî yekem mînaka tomarkirî ya jinavbirina bi kom be.

Em dikarin bibêjin ku operasiyonên Endazyariya Demografîk di dîrokê de nayên hejmartin.

Imperatoriyên herî mezin bi dirêjahiya sedên salan li gelek navçeyên cîhanê, pêkhateya niştecêbûnê têk dan, dinav de jî Imperatoriya Birîtanî û ya Osmanî û ya Rûsî. Herweha niştecêyên resen li gelek navçeyên cîhanê rastî jinavbirin, koçberkirina bi neçarî, û guhertin bi niştecêne nû, hatine, weke ku li Emerîka û Usturaliyayê rûda.

Derbarê cengên mezin, bi taybet Cenga Cîhanî ya Duyem, bi milyonan rastî koçberkirina bi niyaz hatin û neçar bûn ku birevin yan rastî jinavbirina bi kom hatin, weke Cihû û Qereç û Sintî.

Heta roja îro jî, kiryarên Endazyariya Demografîk têne encamdan, ji bo bicîkirinê; tundûtujî û tawan mîna jinavbirina bi kom û jinavbirina esnî û tawanine din, tên encamdan. Jinavbirina bi kom ya Rohînga li Miyanmar yek ji wan tawanan e. Li Çînê gelek welatan, dinav de jî Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê[37], tawanên li dijî mirovatiyê û musulmanên Oygur hatine encamdan, weke jinavbirina bi kom binav kirin.

Li Sûriyê, piştî destpêkirina milmilaniyê sala 2011an, hemû aliyan Endazyariya Demografîk ya ciyawazkirinê bi astene corbiror bi piştevaniya welatine din ku destê wan di milmilaniyê de heye, pêk anîn. Lêbelê ev kiryar ne tenê di serdema şer de jidayik bûn, lêbelê bi piraniya xwe li ser bingehine ku beriya destpêkirina milmilaniyê, kar jê re hatibû kirin, bûn. Weke Zinara Erebî, û Komcivakên niştecêbûnê yên tayifî, û gelek mînakên din jî.

34 Üngör, U. (2011-04-21). The Making of Modern Turkey: Nation and State in Eastern Anatolia, 1913-1950. : Oxford University Press. Retrieved 12 Oct. 2021, from https://oxford.universitypressscholarship.com/view/10.1093/acprof:oso/9780199603602.001.0001/acprof-9780199603602

35 Kiernan, B. (2004). The First Genocide: Carthage, 146 BC. Diogenes, 51(3), 27-39. https://doi.org/10.1177/0392192104043648

36 "North Africa, the growth of urban life", retrieved 12 Oct, Encyclopedia Britannica, https://www.britannica.com/place/North-Africa/The-growth-of-urban-life

37 "China's Oppression of Muslims in Xinjiang, Explained", 20 January 2021, The New York Times. Retrieved 13 Oct 2021. https://www.nytimes.com/2021/01/20/world/asia/china-genocide-uighurs-explained.html

Bi dirêjahiya dehên salan, Endazyariay Demografîk netenê armanca niştecêyên Sûriyê li ser bingehine esnî kirin, lê fakterên tayifî / olî jî li xwe girtin. Kiryarên bicîkirina Endazyariya Demografîk behaneyên rêxistinkirina avakirin, çaksaziya çandinî, ewlekariya neteweyî û parastina sînor jî li xwe girtin, û gehiştin asta tawanên cengî, dinav de jî jinavbirina çandê.

Dinava van bingehên berê yên milmilaniya Sûriyê, hin bingeh hebûn ku ji encama Endazyariya Demografîk bûn ku dewleta Sûriyê ji serdema serxwebûna xwe ji Fransayê, û hatina Partiya El-Be`is ya Erebî ya Sosiyalîst sala 1963an, ku dest bi Endazyariya Demografîk bi piştgirêdana bi yasa û siyasetên dewletê kir, encam daye, û bi rêklama siyasî jî piştevaniya wê kir.

Piştî milmilaniyê, aliyê siyasî û çemandin ji desthilata hukumdar re weke bingeheke eşkere bû ji bo Endazyariya Demografîk ya ku Hukûmetê bicî kir, lêbelê ew yek beriya milmilaniyê li ser bingehine tayifî û esnî eşkere bû. Tevî wê yekê jî, û ji bo berfirehkirina ciyografiya Endazyariya Demografîk ji destpêka milmilaniyê li Sûriyê, em dikarin praktîk û bingehên wê li gorî navçeyê dabeş bikin. Li navçeyên têkel yên Sune û Elewiyan, guhertina demografîk tayifî dihat xuyakirin, û li navçeyên weke El-Bêda û Ras El-Nebi[38] ên Baniyasê, gehişt asta jinavbirina bi kom. Îran û Hêzên ku ew piştevaniya wan dike siyaseteke tayifî eşkere hin caran şopand, ew yek weke bingeheke eşkere bû di destpêka destwerdana wê di milmilaniya Sûriyê de ji bo berevaniyê di ber pîroziyên Şî`î. Herweha aliyên ne fermî yên ku xelk leşker dikirin[39] bi eşkere bang li xwebexşan dikirin ku berevaniyê di ber «Komara Islamî» û piştevaniya Şî`e di rûbirûbûna şervanên Sune de, bikin, û şervanên Şî`e ji Lubnan, Îraq, Efxanistan, û Pakistanê anîn. Herweha Opozisyona Islamî û Eniya El-Nusre û DA`IŞê jî niyazên xwe yên olî / tayifî di leşkerkirin û şerê xwe li dijî Şî`e û Elewiyan de, eşkere dikirin.

Li aliyekî din, rûyê esnî di kiryarên Rêveberiya Xweser û di Dagirkeriya Turk û di Opozisyona Sûriyê ya ku Turkiyê piştevaniya wê dike, xuyayî bû. Kiryarên girûpên islamî yên Opozisyonê nimûneyeke zelal li ser Endazyariya Demografîk ya tayifî yan olî, pêşkêş kirin.

Rêxistina tundurew ya çekdar «Dewleta Islamî li Îraq û Şamê / Sûriye» ku bi DAI`Ş tê naskirin, operasiyonine demografîk berfireh bicî kirin, û jinavbirina esnî û olî şopandin, û tawanên wê gehiştin asta jinavbirina bi kom ya Êzîdiyan[40].

38 »Ti kes nema: Sêdaredanên meydanî li ser destê Hêzên Sûriyê li El-Bêda û Baniyasê13 ,«ê Îlûa 2013an, Human Rights Watch, https://www.hrw.org/ar/report/2013/09/13/256470

39 » Vekolîn-Îranî dev ji pabendiya xwe ya olî berdidin û şanaziyê bi rola xwe di şerê Sûriyê de dikin22 ,«ê Îlûna 2016an, Reuters, https://www.reuters.com/article/iran-syria-dr6-idARAKCN11S1EO

40 »DAI`Ş jinavbirina bi kom li dijî Êzîdiyan pêk tîne16 ,«ê Hizêrana 2016an, Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya Taybet bi Sûriyê, https://www.ohchr.org/AR/NewsEvents/Pages/DisplayNews.aspx?NewsID=20113&LangID=A

# Duyem: Alavên Endazyariya Demografîk

Heta ku pêkînerên Endazyariya Demografîk bikarin armancên xwe bicî bikin û pilanên xwe yên nijadperest li dijî sivîlan berdewam bikin, divê hejmarek alavên tundûtujî û neçarkirinê bi kar bînin, ew alav netenê li dijî sivîlan bûn, lêbelê li dijî xaniyên wan in jî bûn, heta ku venegera rewşa berê ya niştecêbûnê gerentî bikin, û piştre avakirina rewşeke nû li gorî arasteyên desthilata hukumdar, ew yek jî ji bo veşartina tawanên ku di dema bicîkirina van pilanan de, hatine encamdan.

**Ji alavên Endazyariya Demografîk li Sûriyê:**

- Jinavbirina Bajaran
- Koçberkirina bi neçarî

**Di vê raportê de, Ev herdu armanc ji bo bicîkirina Endazyariya Demografîk li Sûriyê hatine xwendin:**

- Bajar, bi Jinavbirina Bajaran.
- Niştecê, bi şêweyekî sereke bi rêya koçberkirina bi neçarî, dinav de jî veguhestina bi neçarî, yan bi encamdana tawanên ku berê niştecêyan dide koçberiyê..

Gelek ji lêkoler û belgevanên şer û wêraniya li Sûriyê û şirovekirina bandora wê li ser sivîlan li Sûriyê, tekeziyê li ser wê yekê dikin ku wêrankirina navçeyên niştecêbûnê û jêrxaneyê, ku cihine sivîl in; tawanine cengî ne. Dibe ku yek ji sedemên vê tekeziyê, û nexwendina vê wêrankirinê bi çavê Jinavbirina Bajaran û bandora wê li ser sivîlan, nebûna vê têgehê di Yasaya Navdewletî û Yasayên taybet bi cengê ye.

**Lêbelê, raporta me giringiyeke taybet dide Jinavbirina Bajaran ji ber du sideman:**

**Yekem**: Ji ber bandora wê ya mezin li ser bihêzkirina koçberkirina bi neçarî û gerentiya venegerandina rewşa berê ya niştecêyan. Ew yek dike ku koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran bibe stûneke Endazyariya Demografîk ya ku Hêzên Hukûmeta Sûriyê û aliyên din yên milmilaniyê li Sûriyê, bicî dikin.

**Duyem**: Berfirehkirina di zelalkirina têgeha Jinavbirina Bajaran weke têgeheke lêkolînê, bi rêya şirovekirin û daxistina wê li ser rewşa Sûriyê, û tekeziya li ser wê yekê ku dubareavakirina piştî wêrankirinê li ser bingehine nijadperestî, mafan binpê dike, û xeleka dawî ya giring ji bo timamkirina piroseya Jinavbirina Bajaran weke beşek ji Endazyariya Demografîk ya berfirehtir.

# Danasîna Jinavbirina Bajaran

Di zimanê Ingilîzî de: Urbicide, ji du beşan pêk tê û vedigerin zimanê Yûnanî yê kevin: «Urbi» wate wesfa bajar yan navçeyên bajarî, û «cide» wate kuştin. Malpera Lîksîsko ya elektironî ya bi ser zanîngeha Oksfordê Jinavbirina Bajaran[41] weha dide nasîn: Wêrankirina bajarekî yan wêrankirina dîmenên wê ye.

Lê, ferhenga Oksford ya taybet bi ciyografiyaya mirovî, weha dide nasîn[42]:

> Wêrankirina tevahî yan beşekî ya jîngeha avakirî, bi armancine siyasî yan leşkerî. Gelek mînak li ser artêşine serkeftî ku bajarên dijminên xwe wêran kirin, hene, weke mînak, wêrankirina Qirtajê sala 146 beriya zayinê li ser destê Imperatoriya Romanî. Lêbelê gelek şirovekar li ser wê yekê gengeşe dikin ku di deh salên dawiyê de bajar bûne xaleke mîhwerî taybet ya tundûtujiyê, û bûne beşek ji şerê li ser navçeyên bajarî (2010 Graham). Weke mînak li ser vê yekê armanckirina avahî û navçene destnîşankirî di şerê salên notî de li Kirwatiya û Bosnayê ji aliyê Hêzên Sirbî ve, û herfandina taxine Filestînî ji aliyê Hêzên Isr`îlê ve, û êrîşa li ser Bexdadê ji aliyê Artêşa Emerîkî ve di şerê Îraqê de.

Lê weke têgeh, em Jinavbirina Bajaran di vê raportê de weha didin nasîn ku wêrankirina berfireh yan ya rêbazkirî ya avahiyan bi armancine siyasî yan esnî yan olî û tayifî, dinav de jî birîna peywendiya niştecêyên resen bi rayên xwe yên fîzîkî ve, û bihêzkirina vê birînê bi rêya afrandina rewşeke avakirinê ya nû ya guncaw bi armanc û helwestên pêkînerên rêjîmên hukumdar yan aliyên serdest.

Ev têgeh di salên şêstî yên sedsala bûrî de jî ji aliyê dijberên vegrandina dîmenên bajarî li Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê ve, hat bikaranîn, ku wêrankirina navçene niştecêbûnê bi armanca geşepêdana bajarî li xwe girt, ku bandorine civakî nerînî dijwar bi xwe re anîn, hin caran ew wêrankirin li ser bingeha siyasetine nijadperestiyê bû. Şaron Rotbard, semînarvan di Ekademiya Bezilal jî ev têgeh bikar anî, di pirtûka xwe ya bi navê "Bajarê Sipî, Bajarê Reş" gotibû ku bajarê Tel Ebîb li ser pişta bajarê Yafayê hat avakirin. Piştre ev têgeh ji bo wesifkirina wêrankrina berfireh û ya bi niyaz ya navçeyên bajarî di şerê Bosnayê 1992-1995an de, hat bikaranîn.

## Du pêngavên sereke yên Jinavbirina Bajaran hene:

1. Wêrankirin. Mîna wêrankirina di şer de, yan herifandin.
2. Dubareavakirina. Weke beşekî timamkirina pilana Jinavbirina Bajaran, dibe ku weberhêner û kompaniyayên niştîmanî yan yên biyanî û saziyên navdewletî yan yên navneteweyî yan hukûmet, di dubareavakirinê de bejdar bibin. Dubareavakirin di Sûriyê de dê rewşeke guncaw ji bo desthilata ku wêrankirin pêk aniye, durist bike, û dê bandora xwe li ser dadweriya pêşerojê hebe, dinav de jî kêmxemiya derbarê tawanên cengê bi rêya windakirina belgeyên tawanên cengê û rastiya dîrokî, û binpêkirina mafên qurbaniyan.

41 Urbicide (n), Lexico website, https://www.lexico.com/

42 Urbicide, Oxford Dictionary of Human Geography, https://www.oxfordreference.com/search?q=urbicide&searchBtn=Search&isQuickSearch=true

# Jinavbirina Bajaran û Yasaya Navdewletî

Rênimayên «Yasaya Navdewletî ya Nerêtî» yên ku di milmilaniyên çekdarî yên navdewletî û ne-navdewletî de têne bicîkirin, Cihên Sivîl weke cihên ne-leşkerî bi nav dike. Hevpêça yekem ya serbarkirî ya Rêkeftinên Cinêvê zelal dike[43] ku cihên leşkerî ew in yên ku «bi şêweyekî kara di karê leşkerî de alîkar in, eger bi sirûştiya wan dîmenan, yan bi cih, yan bi armac, yan bi bikaranîna wan dîmenan be, ku wêrankirina wan ya tevahî yan ya beşekî yan destdanîn li ser wan yan jikarxistina wan di rewşên wê demê de, weke bi timamî taybetmendiyeke leşkerî be».

Weke ku di «Sîstema Roma ya bingehîn ya Dadgeha Tawanan ya Navdewletî» de hatiye ku êrîş, yan bombebarankirina bajaran, yan gundan, yan xaniyan, yan avahiyên bêçek yên ku ne armancine leşkerî ne, tawaneke cengî ye. Herweha ji tawanên cengî yên girêdayî Cihên Sivîl ku Dadgeha Tawanan ya Navdewletî şirove kirine:

- Gihandina wêrankirineke berfireh bi mulkan û destdanîna li ser wan bê ku ti giringiyeke leşkerî hebe.
- Êrîşên bi niyaz li dijî cihine sivîl, wate cihên ku ne armancine leşkerî ne.
- Êrîşên bi niyaz li dijî avahiyên taybet bi karên olî, yan taybet xwendinê, yan avahiyên hunerî, yan zanistî, yan xêrxwazî, û şûnewarên dîrokî, û nexweşxane û cihên kombûna nexweş û birîndaran bi mercê ku ne armancine leşkerî bin.

« Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor» diyar kiriye ku Cihên Sivîl yên normal, bajar û bajarok, û navçeyên niştecêbûnê, û xanî, û avahî, û dibistan, û alavên sivîl yên veguhestinê, û nexweşxane û saziyên pizîşkî, û şûnewarên dîrokî, û perestgeh, û mulkên çandê û jîngeha siruştî, li xwe digirin, bi mercê ku di şiroveya dawî de, nebûbin armancine leşkerî.

Li gorî şiroveya navborî, û ji bo vê raportê, em dikarin têgeha «Cihên Sivîl» di Yasaya Navdewletî de ji bo navlêkirina navçeyên bajarî ku rastî jinavbirina bjarî bi rêya kiriyarine ku Yasaya Navdewletî binpê dikin, tên, bi kar bînin, bi wê yekê Yasayên Navdewletî yên taybet bi milmilaniyên çekdar yên navdewletî û ne-navdewletî li ser Jinavbirina Bajaran li Sûriyê, têne bicîkirin.

# Koçberkirina bi neçarî

«Komisyona Neteweyên Yekgirtî ya Penaberan» koçberkirina bi neçarî dide nasîn ku di dema «Kes yan civak neçar dibin birevin yan mal yan cihên niştecêbûna xwe bicih bihêlin, yan li ser wê yekê neçar dibin ji bo xwe dûr bikin ji bandora bûyer yan helwestan, mîna milmilaniya çekdar û tundûtujiya tevahî û binpêkirinên mafên mirovan û karesatên siruştî yan karesatên bi destê mirovan tên durustkirin û / yan bi pirojene geşepêdanê».

Wate, kiryarên tundûtujiyê û binpêkirin û tawanên berfireh yan ên rêbazkirî weke sedemine koçberkirina bi neçarî ne, mîna işkencekirin û windakirina bi neçarî û girtinên bêserûber û nijadperestî û ciyawaziya olî û tayifî, û zordarî û tawanên regezî û tawanine din ku Hêzên Hukûmeta Sûriyê ji dehên salan ve û aliyên din ên milmilanî piştî sala 2011an, pêk tînin.

---

43 Hevpêça yekem (Protokol) ya serbarkirî li ser rêkeftinên Cinêvê, 1977, Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor, https://www.icrc.org/ar/resources/documents/treaty/protocol-i-additional-to-the-geneva-conventions

Gelek caran danasîna koçberkirina bi neçarî di Yasaya Navdewletî de hatiye, têgeha koçberkirina bi neçarî hevşêweyê gelek têgehan bû, mîna dûrxistin û koçberkirin û veguhestina bi neçarî û derbiderkirina bi neçarî, bi hemî cudahiyên çarçove û sedem û encam û yasaya ku tê bicîkirin.

Dibe ku qurbaniyên koçberkirina bi neçarî di hundirê welatên xwe de bibin derbider, û li welatine din bibin penaxwaz yan koçber.

# Koçberkirina bi neçarî di Yasaya Navdewletî de

Yasaya Navdewletî her şêweyek ji şêweyên koçberkirina bi neçarî qedexe dike, istisnane hindik yên vê rênimayê hene. Qedexekirin di gelek rêkeftin û peymanên navdewletî ên pabendker de, hatine, mînak:

**Rêkeftinên Cinêvê**: Yasayên cengê di pirotokola duyem ya serbarkirî de neçarkirina niştecêyên sivîl li ser derbiderkirinê di milmilaniyên çekdar ên ne navdewletî de, qedexe dikin. Neteweyên Yekgirtî û Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor milmilaniya li Sûriyê bi milmilaniyeke çekdar ne navdewletî bi nav dike[44], wate yasayên cengê yên girêdayê bi vî corê milmilaniyê, têne bicîkirin.

Di Sîstema Dadgeha Tawanan ya Navdewletî de hatiye ku «Neçarkirina niştecêyên sivîl ji bo derbiderkirinê ji ber sedemine girêdayî bi milmilaniyê, eger ne ji bo silametiya sivîlên peywendîdar be, yan ji bo sedemine leşkerî dijwar be» tawaneke cengî di milmilaniyên çekdar ên ne navdewletî de ye. Herweha dibêje ku koçberkirina niştecêyan di edebiyatên herdu dadgehên Yûxislaviyaya berê û Rawendayê, tawaneke li dijî mirovahiyê ye.

Rêjîm û aliyên milmilaniyê koçberkirin ji bo bihêzkirin yan ferizkirina desthilata xwe li ser navçeyên milmilaniyê, yan li ser navçeyên kêmdesthilat di rewşên negirêdayî bi şer ve, bi kar tînin.

Di lêkolîna me de, em dibêjin ku di rewşên ku kêm caran têne rûdan ên pêdiviya leşkerî de, divê veguhestina sivîlan demkî be, û rêzê li mafên mulkiyetê bigire, û eger rêzê li van herdu mercan negire, wê demê veguhestina niştecêyan di rewşên ku kêm caran têne rûdan dibe tawaneke koçberkirina bi neçarî. Ango pêdiviya leşkerî nabe behane ji bo istixlalkirina rewşa ku piştî veguhestina niştecêyan peyda dibe, ku mafên wan werin binpêkirin. Herweha piroseyên herifandinê bê peydakirina bijardeyên yasayî ku rewş û mafên mulkiyetê berçav bibe, Yasyaya Navdewletî ya Mirovî binpê dike û dibe tawaneke cengî.

Koçberkirina bi neçarî ne tenê bi kiryarên rastewxo mîna neçarkirina niştecêyan ji bo koçberkirinê yan Rêkeftinên koçberkirinê û xistina niştecêyan di alavine veguhestinê de û dûrxistina wan, girêdayî ye, lêbelê li gorî danasîna wê, girêdayî kiryarên ku xelkê neçar dikin ku ji ber tirsa li ser jiyana xwe yan ji bo ku xwe dûrî bandorên şer bikin, koçber bibin. Weke mînak, dibe ku armanckirina jêrxaneyê yek ji sedemên koçberkirina bi neçarî be, dinav de jî nexweşxane û navendên tenduristiyê, wê demê aliyê ku wê armanckirinê pêk tîne, tawana koçberkirina bi neçarî encam dide, weke ku raporta ":Bijardeya tekane: Êrîşên li ser tenuristiyê weke handan ji bo derbideriya bi neçarî li Sûriyê"[45] şirove dike, ku ji aliyê zanîngeha Corctawn

44 https://www.icrc.org/eng/resources/documents/update/2012/syria-update-2012-07-17.htm. Accessed on 02/01/2020, at: http://bit.ly/2sY9wfE

45 "No choice attacks on health as a driver of forced displacement in Syria", May 2021, Georgetown Law Human Rights Institute, https://www.law.georgetown.edu/human-rights-institute/wp-content/uploads/sites/7/2021/06/No-Choice-Report_web.pdf

ve hatiye amadekirin:

Ji destpêka milmilaniya Sûriyê ve, Hukûmeta Sûriyê û hevpeymanên wê berê xwe dan çavdêriya tenuristiyê û êrîş pêk anîn. Ji ber van êrîşan sîstema tenduristiyê ji kar ket, û êdî gehiştin bo çavdêriya bizîşkî ya bingehîn zehmet yan astem kir. Ji ber wê yekê, li pêşiya sûriyan tenê bijardeya revê ma. Sûriyan mal û cihên xwe ji ber nekarîna wan bi şêweyekî tevahî yan beşekî ji bo bidestxistina çavdêriya pizîşkî, bicih hiştin.

# Beşê duyem: Endazyariya Demografîk li Sûriyê beriya 2011an

## Yekem: Cizîrêya Sûriyê: Dîrokek ji Endazyariya Demografîk

Di salên bîstî ên sedsala bûrî de, hejmarek pêl ji kurdan bi rêya sînorê nû yê ku welatên koloniyalîst navbera Sûriye û Turkiyê de saz kir, derbas bûn. Piştî Şoreşa Şêx Se`îdê Pîran sala 1925an, û şikestina Şoreşa Şêx Se`îd Riza sala 1938an. Hejmareke mezin ji kurdên Turkiyê ji ber êrîş û tundûtujiya Turkî derbider bûn. Tevî ku derbideriya wan demkî bû, heta ku şer kêm bibe daku careke din vegerin şoreşê, nexasim ku hin hoz bi timamî bi serkêşên xwe ve ji bo berdewamkirina berxwenadê û piştre vegrin, hatin Sûriyê. Destê kar yê kurd yê di bejayiyên Cizîrê de ku berê xwe dan çandiniya pembû, cêgîr bûn, û tevî ku Dîmeşq di destpêkê de ne bi vê koçberiyê re bû, û metirsiyên wê, hevdemî berbelavbûna gotara neteweya Ereb bihtir bûn, lê hukûmetên serok Tacedîn El-Huseynî ti tedabîr ji bo rawstandina van koçberiyan, nestandin.

Ji ber nebûna amar yan hejmareke destnîşankirî li ser kurdên ku ji Turkiyê hatine û rêjeya wan bi berawirdî li gel kurdên ku ji xakên Sûriyê yên dagirkirî koçber bûne, û ji ber nebûna ti hewleke saziyane ji bo vê diyardeyê, koçberiya kurd bû babteke istixlala siyasî û ya ragihandinê ku weke behane ji bo xizmeta Endazyariya Demografîk li dijî kurdan, û piştre ji bo bicîkirina siyasetên bêparkirin û ciyawaziyê li dijî wan, dinav de jî Zinara Erebî, hat bikaranîn.

Di salên pêncîyî de, koçberiyên kurdan bû babeteke istixlala siyasî, Serok Edîb El-Şîşeklî sala 1952an mersûmek desxit ku tomarkirina zeviyên sînorî li ser navê kesinan ku xwedî navine din in ango ne navên wan yên rasteqîne ne-Kurd - bê erêkirina serokatiya komarê, qedexe kir, ew yek jî bi mebesta qedexekirina mulkiyetê li ser wan, di çarçoveya siyaseta xwe de û bi erêkirina wî, hebûna kêmîneyan di Artêşa Sûriyê ku Mîratxwerê Artêşa El-Meşriq ya Fransî bû, kêm bû, piştî Nekbeya Filestînê û avakirina Dewleta Isra`îlê sala 1948an, hejmara endamên Artêşê ji 7000 kir 30-35 hezarî, ku bi sedan yan bi hezaran kurd bi agehdarî û rezamendiya serkirdayetiya Sûriyê, bi nasnamene sext û nasnavan, tevlî Artêşê bûn.

# Cizîre di nîvê duyem yê sedsala bîstan de

Piştî bahoza demografîkê, di destpêka nîvê duyem yê sedsala bûrî de, û weke cara yekem di dîroka Sûriyê de, danasîneke nû ji bo dewleta Sûriyê di destûra demkî ya sala 1961ê de derket holê, navê wê bû Komara Erebî ya Sûriyê ku weke zengilekê ji bo dûrxististina esnî ya hemû pêkhateyên Sûriyê ên ne Ereb bû, herweha di çarçoveya Endazyariya Demografîk de jî hin siyasetên ku ne kêmî kiryarên berê ên Hêzên biyanî bûn, derketin holê, mîna Serjimêriya Hisiça sala 1962an û veguhestina Erebên Xemir di salên heftêyî de.

# Serjimêriya Awarte ya Hisiçayê

Beriya em li ser Serjimêriya Awarte bixavin, gerek em behsa helwesta kurdan li ser yekîtiya navbera Sûriye û Misrê de biaxivin ku li gorî hin şirovekaran ku piştî wê yekîtiyê û bi kûrahî arasteyên pêdiviya kurdan ji bo cudabûnê ji dewrûberên xwe hatin sazkirin, ew dewrûberên ku hat xuyakirin ku êdî Erebbûn xiste bi ser peywendiya hemwelatîbûnê, serkirdeyên kurdên Îraqê helwesteke piştevaniyê ji bo serok Cemal Ebdulnasir piştî ragihandina niştîmankirina kenala Swîsê sala 1956an dane xuyakirin, û Mela Mustefayê Barzanî ji sirgûniya xwe li Moskoyê piştevaniya xwe ya tevahî ji bo bi niştmankirina kenala Swîsê ragihand û li Kurdistana Îraqê kurd derketin xwepêşandanên piştevaniyê ku ew piştevanî berovajiyê helwesta Hukûmeta Nûrî El-Se`îd bû ku dilsoziya wê hukûmetê bi timamî ji bo Şahnişîna Yekgirtî û Hevpeymaniya Bexdadê bû, Qahîrayê sala 1957an êzgehek bi zimanê kurdî bi navê «Dengê Îraqa Azad» vekir û kurdên Îraqê û yên Sûriyê û Mihemed Kerîm Seyda û Ebdulwehab El-Mela, tê de kar kirin.

Li Sûriyê, û piştî singvekirina Ebdulnasir ji bo Doza Kurdî, kurdên Sûriyê helwesteke yekgirtî ji wê yekîtiyê negirtin, sê astên helwesta kurdî hatin dîtin, rêjeyek ji kurdên sivîl piştevaniya wê yekîtiyê kirin weke dijatî ji Rojava û rewşa çandê û ya civakî ya giştî, beşê fiyodalîzim û malbatên dewlemend ku metirsiyên wan ji Yasayên bi niştîmankirina kenala Swîsê hebûn, helwestek li dijî yekîtiyê ranegihandin lêbelê piştevaniya wê jî nekirin, herweha çîna hizbî ku rêjeyeke berçav ji civaka kurdî bû, helwestên partiya Komonîst ya Sûriyê ku emîndarê wê Xalid Begdaş di civata perlemanê ya 5/2/1958an ku ragihandina yekîtiyê pesend kir, bejdar nebû, şopandin, Partiya Demokrata Kurd ku di Hizêrana sala 1957an de hat damezrandin ti daxuyanî ji bo piştevaniya ragihandina yekîtiyê dernexist, ku programa wê ya siyasî tekezî li ser berevanî di ber mafên kurdan ên siyasî û civakî û çandê dikir, û ti helwestên zelal weke dijatiya wê yekîtiyê jî ta sala 1961ê jê derneketin.

Di hilbijartinên perlemanê yên 5ê Îlûna sala 1961ê beriya jihevcudabûnê bi çend rojan, Partiya Dempkrata Kurd ji nerêtiya hilbijartina perlemanî ku ji serdemê Fransiyan ve dihat şopandin, derket, û lîsteke bihtir serbixwe bi serokatiya Nûredîn Zaza pêşkêş kir û endamên wê xwestekeke istixbaratên leşkerî ji bo vekişandina berbijêriya xwe red kirin, piştî wê yekê hilmeteke girtinê li dijî hejmareke mezin ya endamên Partî û serkirdeyên kurd, dest pê kir, ew yek weke bûyereke movikî di dîroka nû ya kurdan de hat binavkirin û wê yekê helwesta beşê Partî yê ku daxwaza yekîtiya Kurdistanê dikir, bihêztir kir, navê Partiyê bû «Partiya Demokrata Kurdistan li Sûriyê», piştî wê yekê bi çend rojan ango di 28ê Îlûnê de yekîtî bi jihevcudabûnê bi dawî bû, û ji bo cara yekem navê Sûriyê bû Komara Erebî ya Sûriyê.

Sala 1962an, serok Nazim El-Qudsî û Hukûmeta Xalid El-`Ezim bi serpereştiya Birêz parêzgarê Hisiçayê ku xwe weke netewpesertê Ereb yê tundirew didît, Serjimêriya Awarte ji bo bajarê Hisiçayê ragihand, tevî ku niyaza rasteqîne li pişt Biryara serjimêriyê xuyayî bû, lêbelê hin şirovekaran weke biryareke aborî girêdayî petrolê di navçeya Erebî de û vedîtina petrola

giran di Cizîrê de ku baweriyek li cem siyasetmedarên her pênc hukûmetên jihevcudabûnê durist kir ku Sûriyê ber bi wê yekê diçe ku bibe welatekî berhemdar ji petrolê re û piroseya derbasbûna kurdên Turkiye bo Sûriyê pîlanek e ku armanca wê bicihkirina hin çînên ne Ereb di sêgoşeya petrola çaverêkirî de, dîtin, şirovekarine din jî ew serjimêrî weke dilsoziyek ji serok El-Qudsî ji bo şepêla neteweyî ya Erebî ku herdem ew bi tenêkarî û dijatiya yekîtiyê tometbar dikir, dîtin.

Her çi be behaneyên serjimêriyê, û eger rast bin jî, em dikarin bibêjin eger ew Biryar hatiba hilanîn, û kurd weke hemwelatî ku jiyan li navçeyekê pejirandin, bê berçavbirina nasnameyên wan yên şaxî yan yên resen yan nasnamene din, hatiban pejirandin, û tevlî nasnameya Sûriyê weke bavûkalên serok El-Qudsî yên ji Hîcazê hatine yan weke bavûkalên serok El-`Ezim ku ji Turkiyê hatine, hatiban tevlîkirin, dê li ser niştîmaniya Sûriyê barine ku nifşên piştre niha baca wê didin, sivik kiriban, û dê êşûazarên ku li ser hemwelatiyên kurd ku ti kes giraniya wê ji bilî kesê ku di wan êşûazaran de jiyaye, nizane, neban.

Biryara Serjimêriyê ya ku ji aliyê Hukûmeta Beşîr El-`Ezmê ve hat derxistin, û ji aliyê Hukûmeta Xalid El-`Ezim ve hat bicîkirin, li ser bingeha wê yekê bû ku hemwelatiyê Sûriyê tenê ew e yê ku di tomarên sivîl beriya sala 1945an de tomarkirî bû, û her tomareke piştî wê dîrokê weke sextet dihat binavkirin, ji encama wê serjimêriyê 27.5% ji niştecêyên Cizîrê yên tomarkirî ku di wê serdemê de 309279 kes bûn, ango 53% ji kurdên Cizîrêya Sûriyê, ji tomarên sivîl hatin reşkirin.

# Êzîdî

Bihtirîn kêmîneyên olî li cîhanê ku di metirsiyê de ne, jinavbirina bi kom ya Êzîdiyan ne li ser destê DA`IŞê dest pê kiriye, beriya wê kiryarên partiya El-Be`is ya desthilatdar li Sûriyê li dijî wan hebûn, bi rêya dûrxistina wan û bêparkirina wan ji mafên hemwelatîbûnê, û destdanîn li ser mulkên wan, û piştguhkirina wan û bêparkirina wan ji regezname û mafên sereke, û guhertina nasnameya wan ya olî ya serbixwe ku ew weke musilman tomar kirin, ew kiryar digihin asta jinavbirina çandê.

Serbarî kurdên ku serjimêriyê ew ji çarçoveya hemwelatîbûnê derxistin, Êzîdî jî dihatin piştguhkirin, li dijî wan heman siyasetên dûrxistin, azadiya veguhestinê û rêwîtiyê ji bo beşekî ji wan hat sînordarkirin, ew yek jî piştî tevlîkirina wan dinava kurdên ku maf tunebûn ku regeznameyê werbigrin û ew weke Mektûm El-qeyd (Bê tomar) yan Ecanib El-Heseke (Biyaniyên Hisiçayê) hatin binavkirin. Herweha Hukûmeta El-Be`is dest danî li ser zeviyên wan ên çandiniyê ku jêdera sereke ya dahata wan bû, û piştre Erebên Xemir li şûna wan bicih kirin, herweha li navçeyên wan ti pirojeyeke geşêpêdanê yan pîşesaziyê tinebû, hin şirovekar jî dibînin ku tundirewiya oldarên Êzîdî yên bi rêya qedexekirina xwendinê li ser Êzîdiyan sedema bêparbûna wan ji tomarkirinê di tomarên sivîl de, û bêparbûna wan ji bilindbûna rêzbendiya karmendiya Hukûmî û ya siyasî û derbasbûna perlemanê û nûneratiya yek ji esniyên Sûriyê, bû, ji ber ku xwendin rêya tekane ye ji bo rahiştina serkêşî û peywendiyên bi qezenc li ser oldaran.

Tevî ku azadiya bîrûboçûnê di destûrên Sûriyê de parastî bû, lê rewşa siyasî ya ku çînên li bajarên mezin ne niştecêne, di dest pêkê de piştguh kirin, û piştre jî hukûmetên El-Be`is ku hemî çîn piştguh kirin, û hewl neda çarçovene yasayî ku kêmîneyên herî lawaz biparezin, biafrîne, Êzîdî li ber rehma nerîtên civakî û yên olî hiştin ku bêparkirina wan ji jiyana giştî berdewam kir, herweha bi behanene ewlekarî û serdestî ji rênimayên xwe yên olî yên taybet hatin bêparkirin. Herweha dijatiya navbera herdu hukûmetên El-Be`is li Sûriye û Îraqê, Êzîdî

ji rêwîtiyê bo Îraqê ji bo çûna Hecê li perestgeha «Laleş» ya nêzîkî Mûsilê yan seredana Encûmena Rohanî ya Êzîdiyan, qedexe kirin.

Tevî ku rênima û Yasayên taybet bi zewacê yên Êzîdî hene, lê ew li ser şopandina hukmên şerî`eta islamê di dozên kesane de, hatin neçarkirin, herweha tomarkirina ola wan di tomarên sivîl de hat qedexe kirin, herweha beşekî mezin ji zarokên wan weke musilman hatin tomarkirin, sala 1993an Dadwerê Şer`î yê Yekem li Hisiçayê Ebdulah El-`Urfî biryarek derxist ku bi behaneya ku Êzîdî oleke asmanî naşopînin, şehadeta wan li pêş dadgehan qedexe kir, û ev piştugkirin êdî kete xizmeta Demografikê de û Êzîdî derbasî asta man û nemanê bûn, ew yek beriya jinavbirina bi kom ya li ser DA`IŞê bû.

### Zinara Erebî: Koçberkirna Kurd û Ereban

Zinara Erebî pirojeyeke Endazyariya Demografîk bû ku «Partiya El-Be`is ya Erebî ya Sosiyalîst» ya desthilatdar li Sûriyê, li ser gelek gonaxan ji bo guhertina pergala esnî li parêzgeha Hisiça ya sînorî bi Turkiye û Îraqê re, bicî kir. Bi şêweyekî sereke armanca pirojeya kurdî kir.

Sala 1963an, lêkolîneke[46] berpirsekî hukûmî yê Sûriyê bi eşkere pêşinyara dubare-Endazyarîkirina Demografîk li navçeyên sînorî bi Turkiye û Îraqê re, kir, tê de behsa giringiya peydakirina «Çareseriyeke dawî» ji bo «Kêşeya Kurdî» û xwevalakirin ji bo dozên neteweya Erebî, kir, di lêkolînê de weha hatiye: «Divê dewleta Sûriyê kurdan berev navçeyên hundirîn ên Sûriyê koçber bike, û li şûna wan endamine Ereb û netewene din bi cih bike.. ji ber ku ew sed ji sedî ji aliyê neteweyî ve gerentîkirî ne». kiryarên Endazyariya Demografîk ne tenê girêdayî veguhestina fîzîkî ne, lêbelê girêdayî neçarkirina wan li ser derbiderkirinê bi rêne din e. Ev yek di lêkolîna Hilal de zelal bû ku hin pêşinyar derbarê ferizkirina astengiyan li ser niştecêyên kurd û neçarkirina wan li ser derbideriyê ji sînor bo hundir, dinav de jî astengkirina aborî û piştguhkirin û hilmetên rêklama li dijî wan, pêşkêş kirin «Heta ku derbasî rewşeke necêgîr bibin û neçar bibin koçber bibin».

## Duyem: Yasakirina Endazyariya Demografîk

Dinav lêkolîna Hilal de, hin pêşinyar hebûn ku ji bo cîbicîkirinê, pêwîstî bingehine yasayî bûn. Piştî salekê ji derketina lêkolînê, mesrûma jimare 136 ya sala 1964an derket, ku wê Mersûmê desthilata destnîşankirina zeviyên sînorî da wezîrê Çandiniyê. Parêzgeha Hisiça û ya Qunêtra û navçeyên li ser sînorê Turkiyê bi kûrahiya 25km weke navçene ewlekarî hatin destnîşankirin ku li wan navçeyan, avakirin yan veguhestina ti mafên madî, yan bikirêdan, yan damezrandina kompaniyan, yan girêbestên weberhênana çandiniyê ji bo dema bihtirî 3 salan bê dana moletê ji aliyê wezîrê Navxwe li gorî pêşinyarekê ji wezîrê Çandinî û Çaksaziya Çandiniyê piştî erêkirina wezîrê Berevaniyê, qedexe ye, herweha asta herî bilind ya mulkiyeta çandiniyê ya li gorî Yasaya sala 1958an hat kêmkirin, û êdî dest bi operasiyonên destdanîn û dabeşkirinê li seranserî Sûriyê, hat kirin. Weha hat xuyakirin ku ev Mersûm ji bo yasakirina

46 » Lêkolîna Muhemed Teleb Hilal li ser parêzgeha Cizîrê22 ,«ê Hizêrana 2009an, malpera WEKHEVÎ,

https://wekhevi.wordpress.com/2009/06/22/%D8%A8%D9%85%D9%86%D8%A7%D8%B3%D8%A8%D8%A9-%D9%85%D8%B4%D8%B1%D9%88%D8%B9-%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%B2%D8%A7%D9%85-%D8%A7%D9%84%D8%B9%D8%B1%D8%A8%D9%8A-%D9%86%D9%86%D8%B4%D8%B1-%D9%84%D9%83%D9%85-%D8%AF/

xaleke pêşinyarên lêkolîna Hilal, hat derxistin:

Girtina deriyê kar: Gerek em hewl ji bo girtina deriyê kar ji bo kurdan bidin, yekem, heta ku derbasî rewşekê bibin ku nikaribin tevgerê bikin, duyem, heta ku derbasî rewşeke necêgîr bibin ku ji bo koçberkirinê di her demê de, amade bin, û divê Çaksaziya Çandiniyê bi vê rolê rabe, di pêşî de li Cizîrê, ku ne kirê û ne mulkiyet ji bo kurdan nabe, Ereb gelek in û têne peydakirin.

Piştî wê yekê, gelek raspardeyên siyasî û rênima ji bo bicîkirinê, derketin.

Di Îlûna sala 1966an, partiya El-Be`is ya desthilatdar hejmarek rasparde derxistin, mînak «Kar ji bo çareserkirina kêmasiya heyî di dabeşkirina niştecêbûnê li Sûriyê bi armanca bicîkirina berhemanîna çandinniyê û ya aborî û ewlekariya neteweyî bi giştî» û «dubare-xwendina mulkiyeta çandiniyê ya ser sînorê Sûriye-Turkiyê bi dirêjahiya 350km û bi kûrahiya 10-15km û ew mulkiyet weke mulkê dewletê were çespandin, û bicîkirina sîstemên weberhênanê yên guncaw ji bo bicîkirina ewlekariya dewletê».

Piştî ku herdu wezaretên Çandiniyê û Çaksaziya Çandiniyê bûne yek wezaret, û ji bo bicîkirina piroseyên destdanînê, Yasaya jimare 145 ya sala 1966an derket, û komîteyên taybet bi pesendkirina destdanînê li parêzgehan hatin avakirin, komîteya parêzgeha Hisiçayê sala 1967an bi serokatoya parêzgar Muhemed Heyder dest bi karê xwe kir, ku weke dadgehên siyasî bû û hukimine yekcarî bê vegerandin yan rexnedan derxistin, ew yek jî bi rêya dozên desteserkirin û destdanîn û desteserkirineke esnî bû, û dan bi belgeyên kevin yên mulkiyetê û belgeyên Osmanî ku mulkiyeta malbatan li ser hêla sînorî piştrast dikin, nehat dan, rêjeya herî mezin ya xwediyên mulkên ku dest li ser zeviyên wan hate danîn, Kurd bûn, piştre Suriyan û Kildan, herweha Ereb jî.

Weke binpêkirin ji Yasaya Çaksaziya Çandiniyê ku maf dide xwediyê mulk ku zeviyê ku dê ji bo xwe û malbata xwe bibe, destnîşan bike, tedabîrên dabeşkirin û komkirinê ango destdanîna li ser zeviyan di yek navçeyê de, xwediyên mulk neçar kirin ku zeviyên xwe radest bikin û derbiderî başûr bibin bê mafê hilbijartina zeviyan, herweha dest li ser rûberên biçûk ên kêmî asta herî bilind ya mulkiyetê ên ne di çarçoveya çaksaziya çandiniyê de ne jî, hat danîn, di wê demê de, zevî li ser cotkaran nehatin dabeşkirin, ango radestî desteyeke nû bi navê Zeviyên Dewletê «Mezari` Dewlê» ji bo dabeşkirina wan li ser Erebên ku di salên heftêyî de gundên wan li jêr ava bendava Fratê ketin, hatin kirin.

Kar li ser avakirina Zinara Erebî berdewam bû, di destêka tijekirina bendava Fratê di Hizêrana sala 1974an de, Partiya El-Be`is ya desthilatdar Biryara jimare 521 derxist ku taybet bi anîna kesên ku zeviyên wan li Reqa û Helebê binav bûne û niştecêkirina wan di 35 civakgehên niştecêbûnê li ser dirêjahiya sînorê Turkiyê ye. Li gorî rêjeya baranê zevî li ser koçberkiriyan hatin dabeşkirin, qerebokirinan qebareya mulkên berê nehatin berçavbirin, û zevî bi wekhevî li ser koçberkiriyan hatin belavkirin, ji bilî hin şêxên eşîretan ku mulkine bihtir ji bo razîkirina wan, hatin dan.

Zeviyên ku li herdu parêzgehên Heleb û Reqayê hatin çaksazîkirin, li şûna ku li ser kesên Xemir «kesên ku gund û zeviyên wan binav bûn» ên ku li ser veguhestina dûrî gundên xwe bi gefa bêparbûn ji qerebokirinê, hatin neçarkirin, werin dabeşkirin, ji aliyê saziya Hewz El-Frat ve li ser karmendên wê saziyê û hin endamên Partiya desthilatdar, hatin dabeşkirin, qeydên wan Xemiran bo tomarên sivîl yên parêzgeha Hisiçayê jî hatin veguhestin.

Heta ku ti nerazîbûn yan redkirina koçberkirinê rûnede, piroseya destnîşankirina zeviyên Xemir û koçberkirina wan, ji aliyê Hêzên ewlekariyê ve hat encamdan, tedabîrine dijwar di wê piroseyê de hatin standin, weke girtina di cih de ya dibistanan û desteserkirina ceneratorên

avê û alavên çandiniyê, serbarî destdanîna li ser gelek zeviyên ku binav nebûne jî. Heta ku piroseya veguhestinê timam bibe û ji bo berçavbirina jîngeha eşayîrî, Hukûmetê komek soz dane wan, weke ku serbarî qerebokirina zeviyên ku li jêr ava bendavê bimînin, Hukûmet dê pereyên piroseyên veguhestin û koçberkirinê jî bide, û dê xizmeta leşkeriya necarî ya zaroyên eşîretan di hundirê parêzgeha Hisiçayê de be, û dê wan bo cihên ku nav lê dikirin «Gundên mînakî veguhêzin,» ku piştre hat xuyakirin ku ew gund tenê kevirên çîmentoyî û bi banên totiyayî hatine avakirin, bûn.

Dirêjahiya Zinara Erebî 275km, bi kûrahiya heta 15km bû, 3 hezar malbatên ku bi neçarî hatin derbiderkirin, li wir hatin bicîkirin. Ji ber ku Hukûmetê soz û erkên xwe ji aliyê xizmetguzarî û veguhestin û saziyên bingehîn ve pêk neanîn, ew kom «Xemir» bi dehên salan rastî dûrxistin û şerimkariya civakî hatin, û zaroyên wan bûne dagîrker û niştecêker ku di civakine girtî û sirgûnkirî di hundirê Cizîrêya bi xwe piştguhkirî de, dijîn.

## Sêyem: Kurteyek derbarê guhertinên pêkhateyî yên civakî li Sûriyê

Di çarçoveya çavdêrîkirina guhertinên demografîk de, me dît pêwîst e ku em rewşa niştecêbûnî li parêzgehan ji aliyê navend û guhrtinên ku rastî niştecêyên wan ji demê kodataya El-Be`is ta Şoreşê, bînin zimên.

Istisnaya ku Cizîrêya Sûriyê di sedsala bûrî de jiyayî, bi tevahî li hemû Sûriyê nayê berawirdkirin, ku piştî kodataya partiya El-Be`is rastî guhertinine pêkhateyî civakî hat, lê ne bi qasî guhertina ku li navçeya bakurê rojhilatê Sûriyê bû. Koçberiya xelkê gundewaran bo bajaran weke pêvajoya guhertina demografîk bû ya ku hin bi hin ji sala 1970 zêde dibû, ku rêjeya herî bilind ya sedema wê, vedigere siyasetên Hukûmetê yên bi armanca bihêzkirina desthilatê bi rêya jihevxistina pêkhateya niştecêbûna Sûriyê û tinekirina peywendiyên kesûkarî yên siruştî navbera xelkê wê de bi rêya veguhestina civakinan bi tevahî û dûrxistina wan civakan ji jîngeha xwe ya dîrokî, û rêgirtin li ber tevlîbûna wan dinava bajar de heta ku li cihên bêserûber cêgîr bimînin, bû. Li gorî hejmarên Nivîsgeha Navendî ya Serjimêriyê li Sûriyê ku sala 2007an 50% ji tevahiya xanûberan li Sûriyê, bêserûber bûn, 45% ji niştecêyên Dîmeşqê li «Navçeyên bêserûber» diman, herweha 35% ji niştecêyên Helebê û 42% ji niştecêyên Himsê jî. Li gorî amarekê ku di reşnivîsa stratejîk ya niştîmanî ya niştecêkirinê ku ji aliyê Programa Neteweyên Yekgirtî ya taybet bi dagîrgehên mirovî de, belav bûye; navçeyên niştecêya bêserûber dinavbera 1994 û 2010an de, bi rêjeya 220% zêde bûne, ku sala 2011an niştecêyên Sûriyê li parêzgehên Dîmeşq û Gundewarên Dîmeşqê û li Helebê dabeş bûn, ku rêjya rûberê wan ne zêdeyî 20% ji tevahiya rûberê Sûriyê bû, ango rêjeya 44% ji niştecêyan, wê yekê kêmbûneke dijwar di çavkaniyan de peyda kir, bi taybet çavkaniyên avê. Berovajiyê wê yekê tenê 17% ji tevahiya niştecêyên Sûriyê li sê parêzgehan ango parêzgehên Reqa û Dêrazorê û Hisiçayê ku rûberê wan derdora 41%e, diman, ew parêzgeh rastî piştguhkirineke dijwar ya geşêpêdanê û rêjeya herî bilind ya bêkariyê ku ji ber pêlên hişkesaliyê, bihtir bû, hatin, û ew parêzgeh bûn jîngeheke ku niştecê jê birevin. Li Tertûs û Laziqiyê, ku rûberê wan tenê 2.2% ji tevahiya rûberê Sûriyê ye, 9% ji niştecêyan lê diman û ti pilanine rasteqîne yên geşepêdanê li wan herdu parêzgehan nebûn.

# Bajarê Hemayê

Navenda bazirganî li Hewza Çemê El-`Asî ye, ku ji aliyê aborî ve girêdayî firoştina xanûberan bû, ji ber ku malbatên Hemawî xwedî rûberine berfireh li Deşta El-Xab û Hewza Çemê El-`Asî ne, herweha bi rêya mulkiyet û bazirganiya berhemên ajelî, girêdayî serdestiya di warê çalakiyên şivantiyê de bû, ew yek jî beriya jihevxistina jêrxaneya nerêtî bi rêya Çaksaziya Çandiniyê li Sûriyê ji sala 1958an bû. Sala 1982an, ji ber milmilaniya Hukûmetê bi «Ixwan El-Muslimîn» re ji 2ê Sibata sala 1982an bi dirêjahiya 27 rojan, bajêr rastî guhertina herî mezin di dîroka xwe de hat. «Komîteya Sûriyê ya Mafên Mirovan» pêşbînî kir ku derdora 30 heta 40 hezar kesî bû qurbanî, piraniya wan sivîl bûn. Hin raportan amaje bi windabûna 10 heta 15 hezar sivîlî di serdema milmilamiyê de, kir, herweha piştî ku sêyekê taxên bajêr bi tevahî wêran bûn, derdora 100 hezar kesî neçar bûn ku ji bajêr koçber bibin. Bajarê kevin û Sûr û kolanên wê, û mûzexaneya Koşka El-`Ezim û dîmenên şûnewarî yên kevin bi yekcarî hatin xwar. Serbarî koçberbûna bi tevahî ya malbatinan berev derveyê Sûriyê weke rev ji zordarî û hukmên sêdaredanê.

# Bajarê Himsê

Piştî avakirina parzûngeha petrolê li ser sînorê bajarê Himsê di salên pêncîyî yên sedsala bûrî de, bajêr berfireh bû, di deh salên pişrte jî bajar di berfirehbûnê de berdewam bû û hejmarek gundên derdorê tevlî xwe kirin, weke Dêr El-`Tiye û Baba `Emro. Niştecêbûna bêserûber bi rûberê 1000 hiktarî sala 1989an berfireh bû. Herweha derbideriyek ji gundên Elewiyan berev Himsê rûda, ku hejmara niştecêyên wê ji sifir piştî Serxwebûnê sala 1946an zêde bû, heta destpêka Şoreşê sala 2011an gehişt 25% ji niştecêyên Sûriyê.  Li bajêr dabeşkirineke tayifî hebû: Taxin Elewî bûn, weke `Ekreme û El-Nuzhe û El-Zehraa, Xiristiyanî li taxa El-Himêdiye û Sunî li taxên Baba `Emro û El-Sîba` û El-Xalidiye û `Eşîre û Kerem El-Zeytûn û El-Rîfa`î û El-Beyaza û El-Sebîl û Wadî El-`Ereb û El-Sultaniye, serbarî taxine taybet bi aborîkaran. Di xwepêşandana destpêkî de roja 18ê Adara 2011an, redkirina destkariyê di demografika bajêr de xuyayî bû, tê de parêzgarê Himsê, xwediyê dîrokeke kûr ya desteserkirinan û firoştinên cihê gumanê yên xanûberan, û xwediyê pirojeyeke nûjenkirinê bi navê «Xewna Himsê[47]», hat şermezarkirin, xwepêşanderan ew parêzgeh weke bicîkerê ejindene veşartî ji bo guhertina pêkhateya demografîk ya bajêr, bi nav kir. Herweha Hukûmetê ji xwe re rewşa demografîk ya bajêr û bihêzkirina wê rewşê bi rêya istixlala rewşa aborî ya piştguhkirî ya niştecêyên Elewî, bi kar anî, ji ber wê yekê Elewî bûne armanca sereke ya bi leşkerkirnê ji aliyê milîsên alîgirên Hukûmetê. Herweha dabeşkirina niştecêyan li bajêr, erkê aliyên ewlekariyê di belavkirna gotara tayifî, û veguhestina dînamîkên milmilaniya navbera tevgera xwepêşander û Hukûmetê berev milmilaniyeke navbera çînine civakî yên girêdayê tayifiyetê, hesan kir.

47 Ezmî Bişare, »Sûriye: Rêya êşûazaran berev azadiyê-Hewlek di dîroka niha de«, rûpela 75-325, 2013, Navenda Erebî ya Xwendin û Lêkolînên Siyasî, https://bookstore.dohainstitute.org/P-172.aspx

# Bajarên Berava Sûriyê

Beriya Serxwebûnê sala 1976an, bajarên Berava Sûriyê, dinav de Laziqiye, û Tertûs, û Baniyas, û Ceble, bajarine Sunî bûn, tê de rêjeyek ji niştecêyên Xiristiyanî jî hebûn. Xelkê wê di bazirganiya deryayî de kar dikirin, pişta xwe bi berhemên Helebê û yên navçeyên hundirîn ên Sûriyê yên çandiniyê, girê didan, niştecêyên navçeyên çiyayî bi piranî Elewiyên ku di çandiniya werzî de li deştên Hims û Hemayê kar dikirin, bûn. Di destpêka salên heftêyî de, ev yek hat guhertin, piştî sala 1970yî guhertineke mezin ya demografîk li van bajaran hat encamdan, piraniya niştecêyên gundewaran bûn ji tayifeya Elewî, siyasetên nûjenkirina aborî û gehiştina kesayetine Elewî bo postine bilind di Artêş û Ewlekarî û Rêveberiyê de, bû hander ku hejmarek ji xelkê gundewaran gundên xwe berdin û ji bo kar di kerta giştî de berê xwe bidin bajaran, pêlên derbideriyê bihtir berev dewrûberên navenda bajêr ya kevin bûn. Hin bi hin, ev dagîrgeh bûn beşek ji tevna bajaêr, aloziyên navbera niştecêyên resen yên Sune û Xiristiyan ji aliyekî ve û Elewî ji aliyekî din ve, ev guhertinên kûr yên demografîk, bihêztir kirin.

Hejmara Elewiyan li Laziqiyê ji 10% ji niştecêyên bajêr li sala 1945an zêde bû heta bihtirî 50% di destpêka sedsala bîst û yekê de. Li Tertûsê rêje ji 30% bû 80%, û li Baniyasê ji kêmtirê 10% bû derdora 60%. Li ser hejmara wan, girûpine Elewiyên Turkiye û yên bakurê Lubnanê yên ku bi rêya Komeleya El-Murteda ya bi serkêşiya Cemîl El-Esed birayê serokê berê Hafiz El-Esed, hatin bi regezkirin, zêde bûn.

Bendera Laziqiyê, kompaniya hevpar ku mulkiyeta wê ya Sûriyan bû, û pirojeya xewin di salên pêncîyî yên sedsala bûrî de bû, wêneyeke zelal li ser bandora Biryara siyasî ya aborî li ser pêkhateya niştecêbûnê, pêşkêş dike. Piştî sala 1970yî siyaseta leşkerkirina Benderê bi rêya bikarmendkirina derçûyên Kolêja Deryayî ya Leşkerî di rêveberiya wê de, dest pê kir, bê ku ti şarezahiya wan di rêvebirina kerta veguhestina deryayî ya sivîl û bazirganiyê de hebe. Rêveberiya nû dest bi dûrxistina karkerên ji Laziqiyê û Tertûs û Girava Erwadê, ku ji bavûkalan ve deryazan in, kir, û li şûna wan cotkar ji navçeyên çiyayî anîn ku tiştekê ji karûbarên bender û deryavaniyê nizanin. Karmendkirin li ser bingeha dilsoziya tayifî ya Elewî bû. Bi wê yekê, ji aliyekî ve rêveberî û asta benderê têk çû, û ji aliyekî din ve niştecêyên deverê bi timamî hatin veguhertin, piştî mesrûma jimare 17 ya sala 1982an derket ku li gorî wê, êdî hemû pişkên kerta taybet di kompaniya Benderê de bûn mulkê dewletê, Bender bi timamî ji aliyê endamine malbata EL-Esed yên ku li gel wî koçberî Dîmeşqê nebûn, hat birêvebirin. Êdî Bender bû cihek ji bo karên ne yasayî û qaçaxkirin û astengkirina hawirdekaran[48].

# Heleb

Paytexta pîşesazî û aborî ya Sûriyê. Dîmenê niştecêbûnê li Helebê hat dabeşkirin, aborîkar li rojavayê bajêr niştecê bûn, taxên rojhilatê bajêr xwedî şensê herî kêm di warê xizmetguzariyên bingehîn de bûn. Tevî berfirebûna bajarê herî mezin li Sûriyê û derbideriya niştecêyên gundewaran bo Helebê, lê ew bajar rastî guhertinên demografîk bi asta guhertinên ku li Dîmeşq û bajarên Berava Sûriyê hatin rûdan, nehat.

48 Hena Bitato, »Cotkarên Sûriyê: Zaroyên rîsipiyên wan yên gundewaran yên herî kêm ast û siyasetên wan2014 ,» , Navenda Erebî ya Xwendin û Lêkolînên Siyasî, https://www.dohainstitute.org/ar/BooksAndJournals/Pages/ACRPS_Publications_Match_on-the-ground_Developments_in_the_Arab_World.aspx

# Idlib

Kelha Nasiriyên ku aydiyolojiyeke siyasî ya sosiyalîst ya neteweyî girêdayî hizrê serokê Misrê yê koçbarkirî Cemal Ebdulnasir di salên pêncîyî û şêstîyî de, şopandin. Idlibê ji rojên destpêkî ve redkirina xwe ji hukmê Hafiz El-Esed re anî ziman û piştre di salên heştêyî de, bû kelha Ixwan El-Muslimîn. Idlib rastî guhertinine demografîk berçav mîna li bajarên din ên Sûriyê, nehat. li şûna ku ew parêzgeh bûba dergehê Sûriyê berev Ewropayê, Hukûmeta Sûriyê parêzgeha Idlib ya sînorî bi Turkiyê re, bi rêya siyasetên tenêkirin û pişguhkirinê ji rêyên navdewletî jî ku derdora 20km ji bajêr hat dûrxistin, siza da, herweha Idlib ji pilana geşepêdana Civakî ya Sûriyê, û pirojeyên geşepêdanê, yan pirojeyên weberhênanê jî, hat dûrxistin, bajar nebû cihê balkişandina xelkê  wê jî.

# Siwêda

Ji ber navendiya navçeyî ji bo Tayifa Durzî, û zorîneya wan ya hejmarî li wê navçeyê beramberî kêmîneyeke Xiristyanî û rêjeyeke kêmtir ya Suiyan. Û Ji ber hevgirtina civakî û cihê bilind yê serkêşiya xwecihî û oldarên ku bi şêweyekî beşekî karîn rûbirûyê hewlên Desthilatê ji bo ku wan bike layengerên xwe, bibin, ku Desthilatê nikarî jêrxaneya siyasî ya civakî biguhere, herweha ji ber nasnameya mezhebî ya hevgirtî, û rijdbûn li ser aliyê niştîmanî û neteweyî di gotar û reftarên tayifa Durzî de, Siwêda ji guhertina Demografîk parastî ma.

Ji ber wê yekê, hukûmetên Sûriyê berê xwe dan siyasetên piştguhkirin û hejarkirina Parêzgehê ku bi dirêjahiya bihtirî 50 salî ti geşepêdana çandinî yan pîşesazî yan geştûguzariyê, lê nebûn. Herweha Hukûmetê hestyariya dîrokî ya li gel Koçerên li rojhilatê Siwêdayê dimînin, bi kar anî, Hukûmet li ser bihêznekirina geşepêdanê li gundên wan, û biçeknekirina wan weke alav ji bo mana parêzgehê li jêr gefa ewlehî ku pêwîstiya wê ji Desthilatê re, zêde dike, rijd bû. Ew hestyarî gelek caran gehişt asta şerûpevçûnan, weke ya sala 2000an dema ku Artêşê ji bo rûbirûbûna xwepêşandanên Parêzgehê li dijî destdirêjiyên koçeran, deastwerdan kir, hat piştrastkirin ku hin komên wan koçeran bi ser Ewlekariya Leşkerî li Navçeya Başûrî ve bûn.

Piştî Şoreşê, Siwêda bû penagehek ji bo hin derbiderên gelek parêzgehan, ku hejmara wan derbideran sêsed hezar kes derbas kir, piraniya wan derbideran ji Hims, Der`a, Dîmeşq û Qunêtrayê bûn, û niha weke sêyekê wê Parêzgehê ne, bê hestyarî ji aliyê civaka mêvandar beramberî wan derbideran; Cebel El-Ereb rastî mezintirîn pêla derbideriyê di dîroka xwe de hat.

# Colana dagîrkirî

Colana ku ji aliyê rêveberî ve bi fermî bi ser parêzgeha Qunêtrayê ve ye, rastî tundtirîn guhertinên demografîk sala 1967an hat, bi rêya dagîrkeriya Isra`îlî û şkestin yan vekişana Artêşa Hukûmî ya Sûrî, û koçberkirina piraniya niştecêyên wê ku tenê 10 hezar kes ji eslê 145 hezar kesî ku derbiderî Dîmeşq û gundewarên Der`a û Himsê bûn, man, piştî ku Hêzên Dagîrkerî nekêmî 110 gundan herifandin û tenê pênc bajarok hiştin, ew jî Xecer El-`Ilwiya, Mecdel El-Şems, Biq`ata, Eyn Qinya û Mes`eda Durzî. Piştre Isra`îliyan ew yek weke şaştiyeke stratejîk ji encama bisernekeftina wan ji bo nehiştina Durziyên navçeyê yên ku piraniya wan nasnameya Isra`îlî red kirin, dîtin.

Weke berdewamî ji dagîrkirinê re, biryara Kenîstê ji bo tevlîkirina Colanê sala 1981ê û pilanên handana niştecêkirinê di dagîrgeha «Kitisrîn» û gundên dewrûberên wê, hat standin. Di 25ê Adara 2019an de, Rêveberiya Emerîkî dan bi serweriya Isra`îlê li ser Colana dagîrkirî da. Tevî nebûna bandora yasayî ya rastewxo ya Biryara ku ne li gorî Rewatiya Navdewletî ye, lê ji ber faktera demê û faktera demografîk bi rêya nebûna qebareyeke niştecêyên Ereb, ew Biryar biryareke gelek metirsîdar e, ku hukûmetên piştre hatine, kontirola Isra`îlî li ser Colanê, rewayî dikrin.

# Dîmeşqa paytext

Dîmeşqa ku hejmara niştecêyên wê sala 1945an 300 hezar kes bû, û sala 1970yî 800 hezar kes bû, rastî teqîneke niştecêbûnê hat û hejmara niştecêyên wê sala 1980yî ji ber hatina zêde ya penaberên Filestînî, serbarî derbiderên Colanê, gehişt 3 milyon kesî. Lêbelê zêdebûna herî mezin ji ber derbideriya xelkê gundewaran bo bajêr bû. Bajêr dest bi berfirehbûnê li bexçeyên Xûtaya Dîmeşqê û girên El-Mezê, kir. Hevdemî nebûna karîna vehewandina wan, niştecêyên nû li koxikine bê molet li dergehên bajêr û li bilindahiyên Çiyayê Qasiyûnê niştecê bûn. Di naverasta salên heştêyî de, heşt navçe bûne taxine hejar ku tê de milyonek kes niştecê ye. Hukûmetê dan bi niştecêyên ne yasayî weke niştecêne domane, da, û elektirîk û av ji bo navçeyên wan peyda kirin.[49]

Rêjîma Sûriyê berfirehûna bajarî ya bêserûber[50] ji bo kontirol û wergirtina dilsoziyê, bi kar anî, û ew yek weke reşweyeke civakî ji bo niştecêyên ku nû hatine, bi kar anî, gelek raport û lêkolînan ew yek piştrast kir, mînak «Rastiya mafên mulkiyet û zevî û niştecêbûnê li Sûriyê»[51] ya Rêxistina El-Yewm El-Talî, û «Navçeyên niştecêbûna bêserûber li Sûriyê: Mafên niştecêbûn û nakokiyên mulkiyetê[52] ya Navenda Heremûn ya Lêkolînan. Serbarî şirovekirina Komîteya Vekolînê ya Neteweyên Yekgirtî ya teybet bi Sûriyê ku tekezî li ser wê yekê kir ku bidestnexistina mafên niştecêbûn û zevî û mulkiyetê li seranserî Sûriyê tevgêrê sereke yê milmilaniyê ye piştî sala 2011an, û got jî ku Hêzên Hukûmeta Sûriyê bi şêweyekî rêbazkirî rêveberiya mafên mulkiyetê dikin.[53]

Weke diyariyeke hukûmî ji bo bihêzkirina desthilatê li ser hemwelatiyan, û weke ku weha bibêje ku mafên wan yên sereke bi asta girêdan û dilsoziya wan ve, girêdayî ye, ku ew yek bi rêya derxistina biryarekê derbarê bicînekirina pirojeyên niştecêkirinê û piştguhkirina berfirehkirina navçeyên niştecêbûna bêserûber li paytextê, Hukûmetê niştecêbûn û ava paqij pêşkêşî navçeyên niştecêbûna bêserûber, kir, bê ku kêmtirîn mercên cîhanî bicî bike. Sala 1980yî, û hevdemî berfrehbûna navçeyên bêserûber li Dîmeşqê û veguhertina koşkên wê yên dîrokî bo dibistan yan embar yan avahîne vala, Hukûmetê dest bi avakirina Koşka Serokatiyê ya herî mezin di dîroka welêt de bi rûberê 31500 mitir çargoşe, kir, hate pêşbînîkirin ku

49 Patrîk Sêl, »Hafiz El-Esed û milmilaniya li ser Rojhilata Navîn«, Rûpela 715, 2004, Kompaniya Çapemeniyan ya dabeşkirin û belavkirinê.

50 Di alozkirina kêşeya xanûberî de, alîkar bû.. hewldan ji bo têgehiştina doza niştecêbûnên bêserûber li Sûriyê15 ,«ê Tîrmeha 2020î, Ineb Beledî, https://www.enabbaladi.net/archives/400902

51 » Rastiya mafên mulkiyet û zevî û niştecêbûnê li Sûriyê«, Berfanbara 2020î, El-Yewm El-Talî, https://tda-sy.org/wp-content/uploads/2021/04/HLP-03-Informal-Housing-in-Syria-AR.pdf

52 » Navçeyên niştecêbûna bêserûber li Sûriyê: Mafên niştecêbûn û nakokiyên mulkiyetê5 ,«ê Nîsana 2021ê, Navenda Heremûn ya Lêkolînên Serdem,https://www.harmoon.org/wp-content/uploads/2021/04/%D8%A7%D9%84%D8%B3%D9%83%D9%86-%D8%A7%D9%84%D8%B9%D8%B4%D9%88%D8%A7%D8%A6%D9%8A-1.pdf

Encûmena ,«Raporta Komîteya Vekolînê ya Serbixwe ya Navdewletî ya taybet bi karûbarên Komara Erebî ya Sûriyê 53
54/46/Mafên Mirovan, 21ê Çileya 2021ê, https://undocs.org/ar/A/HRC

lêçûna avakirina wê milyarek dolar bû, ku sala di 1980yî de têra avakirina bi hezaran yekeyên niştecêbûnê ji bo paratina bajêr, dikir.

## Tax û komelgehên niştecêbûnê yên bêserûber li Dîmeşqê

Ji salên heştêyî yên sedsala bûrî ve, nîşanine Endazyariyeke Demografîk ya Leşkerî li Dîmeşqê derketin holê, ku Bajarê Dîmeşqê ber bi navçe û civatine biçûkkirî ve daxist, hin ji wan bi nasnamene tayîfî û hin jî bi nasnamene aborî bûn. Wê yekê bajar ji aliyê civakî ve ji hev xist. Bajar weke binkeyeke leşkerî hat berfirehkirin, ku dewûrûberên wê komên sivîl in. Tax û niştecêbûnine leşkerî û hizbî hatin avakirn û berfirehkirin ku derbasî tevna bajêr ya avahî û niştecêbûnê dibin û wan dorpêç dikin û dergehên çûn û hatina wan, kontirol dikin. Serbarî derbaskirina saziyên Partiya El-Be`is û yên ewlekariyê, û dabeşkirina asêgeh û avahiyên ewlekariyê û xalên çavdêriyê û baregehên pasewanan di nexweşxane û mexfer û baregehên amûrên istixbaratî û kampên «Ciwanên Şoreşger» û cihne din jî.

Tenê li dewûrberê bajarê Dîmeşqê derdora 18 navçeyên bêserûber hebûn ku li hin ji wan navçeyan zorîneyek ji girûpine destnîşankirî hebûn, Xiristyanî li Diwêl`a û Tebalê, û Elewî li Mezê 86, û `Iş El-Werwer, bicih dibûn, Zorîneya Sunî jî li navçeyên Cober û Berze El-Beled, û Bexçeyên Mezê, û Kefersûsa El-Lewan, û El-Dehadîl û Beyadir Nadir, û Nehir `Êşê û taxên Qedem El-`Esalî û Def El-Şewk û El-Zuhûr, bicih dibûn, Kurd jî li navçeyên bêserûber yên taxa Riz / Zorava, li ser sînorê Meşrû` Dumer, bicih dibûn, li navçeya bêserûber ya El-Tedamun komeke tevlîhev ya olî û tayîfî û neteweyî ji Sune û Elewî û Durzî, serbarî penaberine Filestînî, niştecê ne.

Weke tê naskirin ku navçeyên bêserûber û yên hejar, koka xwepêşandan û tevgerên li dijî Hukûmetê ne, lêbelê hin ji wan navçeyan bûn hêlên yekem yên berevaniyê di ber Hukûmetê de, bûn xezneya mirovî ji bo Hêzên alîker di serdema Şoreşê de. Encamên tişta ku bi deh salan ji bo parastina paytextê bi rêya navçeyên bêserûber, hatiye çandin, hat xuyakirin, weke taxa Mezê 86 yan `Iş El-Werwer ya ku bi piranî Elewî ne, Elewiyên ku Dîmeşq dagîr kirine û hejmara wan ji 300 sala 1947an gehişt bihtirî 500 hezarî beriya Şoreşê[54]. Çarenivîsa navçeyên bêserûber yên ku dengê kolanê bûn û navenda xwepêşandanan sala 2011an bûn; koçberkirin û herifandina xaniyên wan, bû, dinav de jî El-Tedamun û Qabûn û Bexçeyên Mezê.

## Mezê: Bexçeyên El-Razî li Mezê

Siyasetên koçberkirin û niştecêkirinê bi rêya bikaranîna yasa û Biryarên rêveberî û rewşa aborî ji bo guhertina demografîk li navçeyê, zelal bûn. Sala 2012an Mersûma jimare 66 derket ku li gorî wê Mersûmê navçeya Bexçeyên Mezê û navçene din li Dîmeşqê, weke navçene niştecêbûna bêserûber ku divê dubare wein birêkxistin, hatin binavkirin, ew Mersûm heman pilana berê ye ku Hukûmetê bû ku nikarî bicî bike, û li bendê ma heta sala 2012an. Hat xuyakirin ku ew yek weke sizadaneke wê taxê li dijî Tevgera Aştiyane ya li dijî Hukûmetê, bû, û berdewamkirina hewlên Balyozxaneya Îranî ji bo destnanîn li ser wê taxê bû ku rûberekî

54 Henîn Xedar, »Stratejîka »Sûriyeya bi Sûd« ku Îran dişopîne, gehişt qonaxa timamkirina praktîkî11 ,«ê Îlûna 2016an, Navenda Lubnanî ya Lêkolîn û Rawêjkariyan, http://www.center-lcrc.com/index.php?s=13&id=17972

berfireh ji zeviyên wê ji bo Îranê bi mebesta avakirina balyozxaneyeke nû, hatin diyarîkirin.

Pilanên birêkxistinê tayîfî jî dihatin xuyakirin. Navên gelek taxên bêserûber ku piraniya niştecêyên wan Elewî û alîgirên Hukûmetê bûn, û tê de gelek binpêkirin û serpêçiyên avakirinê ku gelekî ji yên Bexçeyên Mezê bihtir bûn, weke Mezê 86, û `Iş El-Werwer, û El-Someriye, qet di ti plilaneke birêkxistinkirinê de nehatin û niştecêyên wan rastî ti metirsya şerpezebûn û jidestana niştecêbûnê, nehatin, ew pilana birêkxistinkirinê weke xelatekê ji bo piştevanên Hukûmetê re bû, weke  bazirganên girêdarî wê, û hevpeymanê wê yên biyanî, ango weke xelatekê beramberî alîkariyên wan jî, parêzgeha Dîmeşqê ew yek di bicîkirina pirojeya 66ê bi rêya radestkirina wê bo kompanîne Îranî, bicî kir.

Çalakiyeke ne normal ya Balyozxaneya Îranî ku li ser Cotrêya Mezê li ser sînorê taxa Bexçeyan e, hebû, dest danî li ser gelek zeviyên navçeyê, zeviyên herî mezin jî yên beramberî kolêja Pizîkê, û avahiyeke pir mezin ku li derdora wê zeviyek bi rûberê bîst donimî jî hebû, ava kir. Herweha dest danî li ser mizgefta El-Zehraa li Mezêya kevin ku nêzîkî Balyozxaneyê ye, û zeviyên derdora wê jî ji Hukûmetê, kirîn. Bi mulikkirina Îraniyan li Mezê netenê ji aliyê Hukûmeta Îranê ve bû, lêbelê ji aliyê bazirgan ve jî bû ku sûd ji xizmetguzariyên bankên girêdayî Pasdarên Îranê wergirtin, weke Banka Ensar û Saziya Muhir ya Darayî ku hesankarî û dana qerzan ji bo her kesê ku dixwaze xanûberan li Sûriyê bikire, pêşkêş dike, di beramberî hesankariyên Îranî de, astengî ji bo niçtecêyên wê taxê bi rêya van tedabîran, dihatin kirin:

- Serbarî bilindkirina qebeareya bidestxistina zaviyan ya bêberamber ku yekeyên niştecêbûnê ji bo dabînkirina xizmetguzariyên sereke weke «rê û park û rawestgehên otombîlan», pêşkêş dikin, beramberî sûda ku xwediyê mulk ji tevlîkirina xanûberê xwe dinava navçeya rêxistinê de, dibîne, Mersûmê dabeşkirina bi neçarî nehişt, û bijradeya taybetmedkirina parçezeviyan, yan bijardeya alîkarî di damezrandina kompaniyeke pişikdar de li gorî Yasaya kompaniyan, yan bijardeya firoştinê di zêdekirina eşkere de, danî li pêş xwediyên mulkan. Ji ber ku piraniya mulkên navçeyê biçûk in û têra taybetmendkirinê nakin, û ji ber zehmetiya alîkariyê di damezrandina kompaniyekê de, piraniya xwediyên mulkan berê xwe dan zêdekirina eşkere, û nikarîn careke din vegerin li vê navçeyê niştecê bibin.
- Tevî rewşên şer û nêzîkbûn ji hilweşana tevahî ya aborî, karên valakirin û herifandinê berdewam bûn, û navçe bi giştî sala 2017an hat valakirin. Fakterên weke bidawîbûna sala xwendinê, yan dana demeke zêdetir beriya valakirin û herifandinê ji ber zehmetiya bidestxistina cihekî niştecêbûna bi kirê li Dîmeşqa ku bi derbiderin tije bûye, nehatin berçavbirin. Hevdemî hilweşana Lîreya Sûriyê û bilindbûna kirêyan, parêzgeha Dîmeşqê elektirîk û av li ser navçeyê birîn, heta ku xelkê neçar bike ku ji wê navçeyê derkevin.
- Tevî bûrîna 8 salan li ser dîroka derxistina Mersûmê, û tevî ku Mersûma 66an di madeya xwe ya 44an de dibêje divê qerebokirina du salan ji bo niştecêyên ne şayîste were dan, û kesên şayîste divê salane werin qerebokirin heta ku niştecêbûna şûngir ji wan re were pêşkêşkirin, û divê ew qerebokirin di heyama heyvekê de ji dema agaehdarkirina valakirinê were dan, lê hîn jî 150 hezar kes ji niştecêyên Mezê û Kefersûsê heta niha bê niştecê ne, û li benda niştecêbûneke şûngir in. Ji ber daketina buhayê Lîreya Sûrî û buhabûna bêhempa li bazarê, piraniya malbatên ku ji xaniyên xwe derketine qerebokirineke guncaw ji bo peydakirina niştecêbûnekê di dema cîbicîkirinê de, nebirine.
- Madeya «d» ya Biryara jimare 122 ya Wîzareta Niştecêkirin û Geşepêdana Avahîiyê ya Sûriyê, ku hevpêça Mersûma 66an e û taybet e bi destnîşankirina mîkanîzma dana niştecêbûneke şûngir, dibêje ku divê kesê şayîsteyê niştecêbûna şûngir, mulkiyeta

xwe ji dema derketina Mersûmê heta valakirinê, piştrast bike. Lêbelê parêzgeha Dîmeşqê merceke din li ser piştrastkirina mulkiyetê zêde kir, ku divê belgeyeke tevgerê / barkirinê jî pêşkêş bike, bi mebesta rêgirtinê li ber tesbîtkirina mulkiyeta kesên ku ji Sûriyê derketine, li navçeyên rêxistinî, ew yek biryarê binpê dike ku niştecêbûn di xanûberî de weke merc nedanî, tenê daxwaza piştrastkirina mulkiyetê kir.

- Tevî ku herdu madeyên 19 û 20 yên Mersûma 66an dibêjin ku divê niştecêbûna şûngir di hundirê Navçeya Yekem de be «Marota Sîtî», lê di 11ê Cotmeha 2019an de, parêzgeha Dîmeşqê niştecêbûna şûngir ji navçeya rêxistnî «Marota Sîtî» bo «Basîliya Sîtî» veguhest, wate veguhestina cihê niştecêbûnê ji navçeyeke ku 3 km dûrî navenda bajêr e bo dewrûberên bajêr, û dûrxistina niştecêyn resen yên Mezê ji navçeyên xwe.

# Taxa Ixlas

Mulkiyeta Navçeya Bexçeyan, ku ji sala 1985an ve ji bo avakirina «Perlemana» nû hatiye desteserkirin, derveyê hukmên Mersûma 66an ma, tevî ku ew mulkên hatine desteserkirin dinava mulkên wan de ne, lê xelk ji qerebokirinê, bêpar kirin. Sala 2001ê li gorî Biryara jimare 2973 ya 17ê Cotmeha 2001ê ya Saziya Karûbarên Xanûberan, mulkiyeta zaviyên ku hatine desteserkirin ji bo Perlemanê hat veguhestin. Piştî pênc salan Perlemana Sûriyê nivîsa jimare 1868/sd ya bo parêzgarê Dîmeşqê pêşkêş kir ku tê de dibêje ew ji Biryara xwe vegeriya û baregeha xwe venaguhêze, û li şûna maf vegere xwediyên xwe, mulkiyeta wan zeviyan bo parêzgeha Dîmeşqê hat veguhestin. Tevî ku mulkiyet li gorî belgenameya Destdanîna li ser mulk, girêdayî avakirina Perlemana nû ye, wate Perleman beriya avakirinê ne xwediyê zeviyî ye û mafê wê yê devjêberdanê jî tuneye, Yasaya Desteserkirina Mulkan ya jimare 35 sal 1985an, devjêberdana Perlemanê ji wan zeviyan re û veguhestina mulkiyeta wan bo parêzgehê, pûç dike.

# Taxa El-Tedamun

Taxa El-Tedamun dikeve başûrê rojavayê bajarê Dîmeşqê, dergehê başûrî yê paytextê ye ku sînorê navbera bajêr û gundewarên wê ye. Beriya Tevgera Aştiyane, hejmara niştecêyên taxa «El-Tedamun» derdora 250 hezar kesî bû ku piraniya wan ji Ereb û Tukumanên ku Isra`îlê sala 1967an ew ji Colanê koçberkirin e, bûn, serbarî hin niştecêyên ji parêzgehên Siwêda û Idlib û Dêrazor û Der`a û Laziqiyê û Tertûs, û hejmarek ji penaberên Filestînî.

Girûpên çekdar karîn sala 2012 kolanên başûrî yên wê taxê kontirol bikin, hevdemî berfirehbûna şerûpevçûnan hejmara niştecêyên wê daket 65 hezar kesî. Piştî ku Hukûmetê sala 2018an ew tax kontirol kir, komîteyek ji parêzgeha Dîmeşqê ji bo zanîna ziyanan û destnîşankirina xaniyên ku bi kêrî niştecêbûnê ji nava 25 hezar xaniyî tên, hat erikdarkirin, wê komîteyê got ku piraniya wan xaniyan bi kêrî niştecêbûnê nayên.

Tevî derketina Biryara 3191-2018 ji parêzgeha Dîmeşqê ku dibêje divê neh navçeyên wê taxê ji bo vegera xelkên wê, bêne dubareavakirin, hejmareke kêm karî di Îlûna sala 2019an de vegere. Lê veger bi mercê nebûna ti kêşeyeke ewlekarî ya xwediyê mulk ve hat girêdan, û xwediyê mulk hat neçarkirin ku soznameyekê imze bike ku dibêje divê xwediyê mulk beriya her karekî

dubareavakirinê, moleta dubareavakirina xanûber ji şaredariya El-Mîdan bidest rbixe, û divê di dema 60 rojî de ji dîroka wergirtina xanûberî, paşmayan kom bike û bavêje. Serbarî anîna pakaneyê (Beraet zime) ji saziyên darayî û avê û elektirîkê û têlêfonê û parêzgeha Dîmeşqê. Serbarî mercê niştecêbûna xwediyê xanûber di xaniyê xwe de yan bi şêweyekî yasayî bi kar bîne, eger firoştin yan bikirêdan be, û li ser perpisyaretya xwe ya kesayetî bê wergitina berpisyaretiya silametiya avakirinê ya xanûberî ji aliyê ti saziyeke Hukûmî ve. Herweha navçe bi tevahî rastî dubarerêxistinkirinê li gorî Yasaya jimare 10 hat, tevî ku bi tenê 10% ji mulkên wê taxê birêkxistinkirî ne û ti belgeyeke tomarkirî ya mulkbûnê (Tapo) di saziyên xanûberan de li cem piraniya niştecêyên wê tunene, lêbelê xwedî niştecêname ne ku bi rêya wê karîn sûdê ji xizmetguzariyên jêrxaneyê û dana bacan werbigrin. Wate jêrxaneya niştecêbûnê ya wê taxê bi tevahî li gorî Yasaya jimare 10, tê guhertin.

## Taxa Cober

Taxa Cober dikeve bakurê rojavayê Dîmeşqê, navbera taxên Bab Tûma û El-Qesa` û El-Tîcare ji aliyê rojava ve, û herdu bajarokên Ên Tirma û Zemelke ji aliyê rojhilat ve, û bajarokê Ên Tirma û navçeya Diwêl`a ji aliyê başûr ve, ye. Ew tax 7 km dûrî Koşka Komarî ya Serokatiyê ye, yek ji taxên herî nêzîkî meydana El-`Ebasiyîn ya Dîmeşqê ye. Li gorî amareke fermî ku sala 2008an derket, hejmara niştecêyên taxê di wê demê derdora 300 hezar kesî bû ku piraniya wan ji musilmanên Sune bûn[55]. Piştî girûpên çekdar ên Opozisyonê ew tax di naverasta 2013an de kontirol kir, rastî bombebarankirineke asmanî û topbaraneke rojane ji aliyê Çiyayê Qasiyûn ve ji bo parastina Dîmeşqê, û ji bo rêgirtinê li ber her pêşveçûneke Hêzên Opozisyonê, hat. Piştî ku Hêzên Hukûmetê havîna sala 2018an kontirola xwe li ser wê taxê vegerand, hat xuyakirin ku rêjeya wêrankirinê bihtirî 80% bû, û bû navçeyeke kavil û koçberkirî, ku xelkê wê nikarin tê de bijîn.

## `Iş El-Werwer

Taxa `Iş El-Werwer dikeve ser bilindahiya çiyayekî kevirî li bakurê rojhilatê taxa Berzê El-Beled, hejmara nişecêyên wê derdora 100 hezar kesî ye, piraniya wan Elewî ne. dema Tevgera Aştiyane li Qabûn û Berzê El-Beled yên cîranên wê dest pê kir, xelkê `Iş El-Werwer piştevaniya Hukûmetê kir, û êrîşî Berzê El-Beled bi darik û kêr û dermance û tifinkan ji bo serkutkirina niştecêyan, kirin[56].

Hukûmetê tawaneke kuştinê ku sala 1975an li taxa Berzê El-Beled rûdabû, istixlal kir, efserekî artêşê çar kes ji niştecêyên taxê piştî nakokiyekê li Qehwehaneyekê, kuştin, xelkê taxê nerazîbûna xwe bi rêya daxistina dergehên taxê nîşan dan, artêşê navçe dorpêç kir û derbasî taxê bû. Lêbelê Hukûmetê hest bi wê yekê kir ku divê qebareyeke niştecêyên alîgir li Berzê hebe[57]. Dest bi anîna malbatine Elewî ji Berava Sûriyê kir, û Hazfiz El-Esed navçeyeke bilind ku navê wê Ibrahîm El-Xelîl e ku ji ber gora ku li wê derê bû ew nav lê hatibû kirin, diyarî wan kir. Van malbatan niştecêbûnine bêserûber ava kirin ku piştre navê wê bû `Iş El-Werwer, û

55 Çeka birêxistinkirina navçeyên bêserûber nêzîkî alîgirên Rêjîmê dibe: Xwepêşandan li dijî biryara Hukûmetê ji bo bicîkirina Yasaya jimare 10 di taxine ku bejdarî şer bûne. Jêdereke ku berê amaje pê hatiye kirin.

56 Heman jêder

57 Ehmed Hemze, »Navçeyên bêserûber ên Erebî: Bi deh salan ji guhertina ku Dîmeşqê wêran dike« El-`Erebî El-Cedîd, malpera elektironî, 8ê Sibata 2020an li vir hat dîtin: http://bit.ly/389k1vP.

hevdemî destpêkirina Tevgera Aştiyane ew tax bû weke komelgehine mirovî bi çek û alîgr ji Hukûmeta Sûriyê re. bi vê yekê, Hukûmetê karî qebareyeke niştecêbûnê di hundirê taxa Berzê de biçîne, ku beriya wê yekê civateke xwecihî heta astekî hevgirtî bû.

## Navçeya Mezê 86

Navçeya Mezê 86 dikeve rojavayê Dîmeşqê. Heta salên heftêyî yên sedsala bûrî daristan û kevir û zevîne çandiniyê bû ku mulkên xelkê Mezê bûn. Lê Lûtkeya çiyayê ku digihe hata zincîra Çiyayê Qasiyûn û zeviyên derdorê mulkên Wîzareta Berevaniyê bûn. Piştî ku Rif`et El-Esed «Lîwayên Berevaniyê» ku nav lê kir «Lîwaya 86» ava kir ku baregeha wê li heman navçeya ku niha navê wê Mezê 86 e, bû, di destpêkê de rê ji avakirina xanîne axî biçûk ji bo efser û endamên «Lîwaya 86» hat dan, û hin bi hin van serbazan malbatên xwe ji Berava Sûriyê anîn, u piştre bû navçeyeke niştecêbûnê weke navçeyeke leşkerî.

Sala 2011an, hejmara niştecêyên navçeyê 300 hezar kes bû, lê serokê Komîteya taybet bi bicîkirina Yasaya jimare (3) ya sala 2018 got ku hejmara niştecêyên wê digihe yek milyonî. Ji destpêka xwepêşandanên aştiyane li navçeya Mezê Besatîn û herdu bajarên Dareya û Me`demiyê li gundewarên başûrê Dîmeşqê ku nêzîkî taxa Mezê ne, niştecêyên Mezê 86 xwe nêzîkî Hukûmetê kirin, milîş ji bo serkutkirina xwepêşandanan li van taxan ava kirin, Hukûmetê weke xelat beramberî dilsoziya yekcarî ya niştecêyên navçeyê bo wê, Yasaya jimare 10 li ser wan bicî nekir[58].

# Beşê sêyem: xuyatirîn operasiyonên koçberkirina bi neçarî ji sala 2011an ve

## Koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran li ser destê Hêzên Hukûmeta Sûriyê

Piraniya lêkolîn û raportan li ser wê yekê tekez dikin ku bikaranîna bombebarankirin û wêrankirina navçeyên niştecêbûnê û bikaranîna bombebarankirina bêserûber ji aliyê Hukûmeta Sûriyê ve weke siyaseteke rêbazkirî di şerê xwe yê li dijî bajar û bajaroka de, ji ber sedemine gişt leşkerî girêdayî bi bicîkirina serkeftina leşkerî bûn, dinav de jî tawanine cengî. Armanca vê tekeziyê piştrastkirina wê yekê ye ku siyaseta bombebarankirina bêserûber ya rêbazkirî û berçavnebirina gihandina ziyanê bi sivîlan û bi Cihên Sivîl, bingehek e ji bo tawanbarkirina Hukûmeta Sûriyê bi encamdana tawanine cengî û tawanine li dijî mirovahiyê.

Lê ev piştrastkirin û destnîşankirina hebûna niyaza Hukûmetê ji bo wêrankirina tevahî ya Cihên Sivîl, rola sereke di piştrastkirina pilana Endazyariya Demografîk de, nalîze. Siyasetên

58 Çeka birêxistinkirina navçeyên bêserûber nêzîkî alîgirên Rêjîmê dibe: Xwepêşandan li dijî biryara Hukûmetê ji bo bicîkirina Yasaya jimare 10 di taxine ku bejdarî şer bûne. Jêdereke ku berê amaje pê hatiye kirin.

Hukûmetê piştî wêrankirinê beramberî navçeyên wêrankirî, dinav de jî ya ku nav lê dike dubareavakirin, û tişta ku em di vê raportê de bi hurgilî şirove dikin û weha dibînin ku ew yek timamkirina Jinavbirina Bajaran e; weke bingeh e ji bo piştrastkirinê bicîkirina Endazyariya Demografîk ji aliyê Hukûmeta Sûriyê ve ji bo bihêzkirina kontirola xwe li ser pişta niştecêyên resen.

Heger niyaza sereke ya beriya bombebarankirina tevahî ya bajar û bajarokan, bicîkirina serkeftina leşkerî be (dinav de jî yên bi rêya tawanên cengê), yan beşek ji pilana Endazyariya Demografîk be, lê tişta ku Hukûmet piştî wêrankirinê dike, timamkirina tawana Endazyariya Demografîk, destnîşan dike. Di herdu haletan de jî: Hukûmetê sûd ji rewşa heyî ya ji encama tawanên koçberkirina bi neçarî û wêrankirinê, ji bo timamkirina stûnên Endazyariya Demografîk, wergirtiye û istixlal kiriye, wate eger hewla vegerandina mafan bo xwediyê xwe û danîna mafê mulkiyetê weke bingeh ji bo her operasiyoneke avakirin û dubareavakirinê, nede, dibe berpirs di ber de.

Ji siyasetên Hukûmetê yên piştî wêrankirinê:

* Girêdana tedabîrên Yasayî yên girêdayî mulkiyetê bi erêkirinên ewlekariyê ve ku bi giştî ji bo xelkê bajêr nayê dan, dana erêkirinê bi hewlwesta siyasî ve girêdayî ye.
* Rawestandina xizmetguzariyan li navçeyên ku li jêr kontirola Opozisyonê de bûn, weke Dareya, Li beşê Dareya vegere.
* Dana girêbestan bo kompanîne Îranî ji bo avakirina niştecêne taybet ji bo şervanên xwe yên ji Sûriyê derneketine. Li beşê Dareya vegere.
* Destanîna artêş û saziyên hukûmî li ser mulkên nêzîkê wan. Li beşê Dareya û Wadî Bereda vegere.
* Derxistina mersûm û yasayên ku demine kurt ji bo piştrastkirina mulkiyeta zevî û xanûberan, destnîşan dikin, û rênadin xwediyên mulk ên resen ku wê yekê ji ber gelek sedeman bicî bikin, dinav de jî koçberkirina wan, û nemana wan li navçene ku bikarin tedabîrên yasayî bicî bînin, û serdestiya erêkirinên ewlekariyê. Li beşê Dareya û El-Qisêr vegere.
* Serbarî rênimayên destdanîn û desteserkirina mulkên kesên dijebrî Hukûmetê yan kesên bejdarî şerûpevçûnan bûne. Rênimayên desteserkirinê, mulkên hevjîn û zarok û kesûkarên wan kesan jî li xwe digre.

Srokê dewletê Beşar El-Esed gelek caran amaje bi niyaz û ramanên xwe derbarî niştecê û koçberkiriyan, di gotarên xwe yên giştî de, kirine.

Di hevdîtina xwe bi serok û endamên rêxistinên gelêrî û sendîkayên pîşeyî û odeyên pîşesazî û bazirganî û çandinî û geştuguzariyê roja 26ê Tîrmeha 2015an de, di gotara xwe de spasiya Îran û Hizbulah û milîsên din ên Şî'î, kir:

> «Hêzên ku şer dikin, ew Hêzên ku li tenişt artêşê ne… Berxwedaniya Lubnanî li gel me şer kir û tişta herî karîn pêşkêş kir..Rola wan giring û karîger bû, em spasguzariyê ji bo lehengî û hêza wan û palpiştiya wan ji bo me, dikin»,

û weha serbar kir[59]:

> «Birêzan, niştîman ne yê kesê lê niştecê dibe yan kesê paseport yan regeznameya wî hildigre ye, niştîman yê kesê ku berevaniyê di ber de dike û diparêze ye. Gelê ku berevaniyê di ber niştîmanê xwe de neke, bê niştîman e û ne hêjayî ye ku xwedî niştîman be».

Di Tebaxê de, di gotara xwe[60] ya derbarê pilanên tayîfî û fedralî, El-Esed weha axaftina xwe berdewam kir:

> Ez dixwazim em têbigihin ku em di qunaxeke necuda de dijîn, ev qonax girêdayî qunaxine berê ne ku ji deshên salan ve hene. Rast e ku me baştirîn ciwanên xwe û jêrxaneyek ji dest daye, ku me baca wê ya darayî û mirovî heta gelek nifşên bê, daye, lê di beramber de me civateke tenduristir û hevgirtîtir bi wateya xwe ya rasteqîne ne bi wateya avakirî yan axaftinên xweş, bidest xist. Ev hevgirtin bingeha yekîtiya niştîmanî ye, hevgirtina baweriyan, hevgirtina ramanan, dabûnerît, têgeh, dîtin, bi hemî şêweyên xwe yên corbicor e. Hevgirtin nayê wateya yeksaniyê, hevgirtin tê wateya ku em hev û du timam dikin, yekrengiya niştîman bi hev û du timam dibe, ev yekrengiya niştîman bingeha yekîtiya niştîmanî ya komkar ji bo hemî hemwelatiyên yek niştîmanî ye.

El-Esed wê yekê bingeh dibe ku yekrengiya niştîmanî, rengê alîgirên wî ye, ew reng e ku dirav û xwîn û ked dane ji bo tinekirina Sûriyên din, yên ku nabe bibin beşek ji civaka Sûriyê, ango li gorî wî[61], ew terorîst in. «Tenê du beş li Sûriyê hene, terorîst û Sûriyên din».

Rojnamevan Dêvîd Gardner di gotara xwe ya di Rojnameya Faynênşel Taymz[62] de hatiye belavkirin, bi gotineke zelaltir behsa ramanên El-Esed beramberî niştecêyan dike û dibêje ku El-Esed hewla «Gerentiya dubareava-nekirina zorîneyea Sunî» bi rêya «Endazyariyeke Demografîk dijwar», dide.

59 » Serok Beşar El-Esed: Şer, şerê tewerekî tevahî ye, nûneratiya rêbazeke serxwebûn û rûmetê dike«, Ajansa Nûçeyan ya Hukûmî ya Sûriyê, SANA, 26ê Hizêrana 2015an, http://www.sana.sy/?p=245771

60 » Gotara Birêz Serok di dema destpêkirina Kongirê Wîzareta Derve û ya Koçberan20 ,«ê Tebaxa 2017an, Wîzareta Derve û ya Koçberan, http://mofaex.gov.sy/ar/pages903/%D9%83%D9%84%D9%85%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D8%B3%D9%8A%D8%AF-%D8%A7%D9%84%D8%B1%D8%A6%D9%8A%D8%B3-%D8%AE%D9%84%D8%A7%D9%84-%D8%A7%D9%81%D8%AA%D8%AA%D8%A7%D8%AD-%D9%85%D8%A4%D8%AA%D9%85%D8%B1-%D9%88%D8%B2%D8%A7%D8%B1%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D8%AE%D8%A7%D8%B1%D8%AC%D9%8A%D8%A9-%D9%88%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%BA%D8%AA%D8%B1%D8%A8%D9%8A%D9%86

61 » Serok Beşar El-Esed: Şer, şerê tewerekî tevahî ye, nûneratiya rêbazeke serxwebûn û rûmetê dike«, Ajansa Nûçeyan ya Hukûmî ya Sûriyê, SANA, 26ê Hizêrana 2015an, http://www.sana.sy/?p245771=

62 "Syria is witnessing a violent demographic re-engineering", 2 Oct 2019, David Gardner, The Financial Times. Retrieved 13 Oct 2021. https://www-ft-com.proxy.choate.edu/content/e40cb754-e456-11e9-b112-9624ec9edc59

## Yasakirina Endazyariya Demografîk ji sala 2011an ve

Ji sala 2011an heta sala 2020an, derdora 40 yasa û mersûmî girêdayî niştecêbûn û zevî û mulkiyetê, derketine, ew yek wateya hebûna arasteyeke rêbazkirî ji bo dubarebirêkxistina rêvebirina mafên mulkiyetê li Sûriyê, ye, li gorî Komîteya Vekolînê ya Neteweyên Yekgirtî ya taybet bi Sûriyê.

Komîteyê di raporta xwe ya giştî sala 2021ê ku tê de encamên karê xwe û karên sereke yên girêdayî bi mafên mirovan bi dirêjahiya milmilaniyê û arasteyên berdewam, pêşkîş dike, got:

> Bi awayekî bi niyaz, yasadanan û siyaset û praktîkan, nemana ewlekariya mafên niştecêbûn û zevî û mulkên bi milyonên Sûriyên ziyandîtî, zêde kir. Ji sala 2011an ve, herî kêm 40 yasayên girêdayî niçtecêbûn û zevî û mulkan, derketine, ew yek wateya hebûna arasteyeke rêbazkirî ji bo dubarebirêkxistina rêvebirina mafên mulkiyetê li Komara Erebî ya Sûriyê, ye, ku metirsiyê derbarê karîna xwediyên berjewendiyên xanûberî, nexasim derbider û penaberan, ji bo gerentiya mafên xwe, durist dike. mafê mulkbûnê ji bo gelek malbatan li navçeyên gundewarî tune bû, herweha gelek malbatên din ku veguhêzî bajar û bajarokên Sûriyê di çarçoveya berfirehbûna bajarî ya bilez û nefermî di naverasta sedsala bûrî de, bûn, belgeyên wan yên fermî yên mulkiyetê, nebûn[63].

Komîteyê di şiroveya xwe de tekez kir ku bidestnexistina mafê niştecêbûn û zevî û mulkiyetê li seranserî Sûriyê, tevgêrê sereke yê milmilaniyê ye, ji xwe çarçoveya niştecêbûn û zevî û mulkiyetê, pêwîstî çaksaziyê bû, beriya milmilaniya niha jî.

Hevdemî ku pilaneke Endazyariya Demografîk xwedî armancine destnîşankirî ji bo desteserkirina mulkiyeta xelkê û dubaredabeşkirina niştecêbûnê dihat xuyakirin, Hêzên bi ser Hukûmeta Sûriyê û milîsên çekdar yên alîgirên wê, stratejîka dorpêşkirin û sizadana bi kom li dijî niştecêyan weke alavele şer, bi kar tanîn, bi behaneya şerê komên çekdar ku ew nav lê dikin «terorîst» , ji bo behanekirina siyaseta dorpêçkirina navçeyên niştecêbûnê û bombebarankirina bêserûber bi çekên corbicor û teqemeniyan, û bêparkirina niştecêyan ji alîkariyên xwarin û pizîşkî yên giring, û rêgirtin li ber gehiştina rêxistinên hawarçûnê yên mirovî bo van navçeyan.

Bi niyaz, navçeyên dorpêçkirî ji niştecêyên xwe hatin valakirin, ew yek jî bi rêya Rêkeftinên bi komên çekdar yên dijber re, li ser derketina çekdaran li gel sivîlên ku dixwazin derkevin, bo navçene din ku li gorî Rêkeftinê destnîşankirî ne. Piraniya niştecêyên sivîl, ji navçeyên dorpêçkirî derketin û derbideriya bi neçar weke tirs ji tolhildan û dirindeyîa Hêzên Hukîmetê, xwestin.

---

63 » Raporta Komîteya Vekolînê ya Navdewletî ya Serbixwe ya taybet bi Komara Erebî ya Sûriyê«, Encûmena Mafên Mirovan, A/HRC21 ,54/46/ê Çileya 2021ê, https://undocs.org/ar/A/HRC/46/54

# Koçberkirin li bajarê Himsê

Li gorî jêderên Opozisyonê, piştî koçberkirina derdora 65% ji niştecêyên resen yên bajarê Himsê berev welatên cîran û navçeyên Opozisyonê, hejmara niştecêyên wê ji 1.5 milyonî beriya destpêkirina Şoreşê daket derdora 400 hezar kesî, niha. Dîmenên koçberkirinê ji dema destpêkê de hatin xuyakirin, topbarankirinên bi topên hawinê ji destpêka tevgerê ve rastî taxên Baba `Emro û navçeya Cober û El-Sultaniye di Çileya sala 2012an de ji aliyê Artêşa Hukûmeta Sûriyê ve, dihatin, bû sedema rûdana yekem pêlên derbideriyê ku gehişt derdora sî hezar kesî, ku li ser koçberkirinê hatin neçarkirin. Herweha taxa El-Xalidiyê di Sibata heman salê de rastî derbideriyekê ji encama bomebarankirina ji aliyê Artêşa Hukûmetê ve dihat, hat, piştre derbideriya navçeya «Taxa `Eşîre» li rojhilatê bajêr piştî ku Hêzên Hukûmetê derbas bûn û ew navçe ji xelkê wê vala kirin, piştre taxên Kerem El-Zeytûn û El-Rîfa`î û taxên El-Beyaze û Wadî El-Ereb û taxa El-Sebîl li bakurê rojhilatê bajêr ku bitmamî ji xelkên xwe hat valakirin, û cara yekê niştecêyên wê berê xwe dan taxa El-We`ir.

Di Gulana sala 2014an de, dawîn sivîl ji 13 taxên navend û dewrûberên bajarê kevin, derketin, ew yek jî piştî dorpêçkirina ku sê salan dirêj kir, ku tê de Himsa Kevin rastî operasiyonine berfireh û wêrankirineke tevahî hat ku piraniya xelkê wê neçar kir ku derbider bibin, ew dorpêçkirin bi derketina şervanên Opozisyonê berev gundewarên bakurê Himsê, li gorî rêkeftinekê navbera Hukûmet û Opozisyonê de bi serpereştiya Rûriyayê, bi dawî hat.



Rê berev wêraniyê. Sûriye, Çileya 2017an - beşine mezin yên bajarê Himsê bi timamî hatin wêrankirin. Sêyekê Himsê kavil in. Otobmîleke kirê divana kavilan de diçe. ©Kirîstyan Wîrner / Tsaytinsbîgil

# Tax El-We`ir

## Rêkeftinên koçberkirinê li taxa El-We`ir, salên 2015, 2016, 2017

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukîmî û Istixbarat, milîsên bi ser Hukûmeta Sûriyê, Hizbulaha Şî`î.

**Aliyên bejdarî Rêkeftin û serbereştiya wê bûne:** Polîsên leşkerî yên Rûsî, Nûnerê Şanda Neteweyên Yekgirtî li Sûriyê Ye`qûn El-Hilû, û Nûnerek ji nivîsgeha Şanderê Neteweyên Yekgirtî Stîvan Dî Mestora li Dîmeşqê.

**Koçberkirî:** Sune

li dewrûberên Taxa El-We`ir hejmarek navçeyên leşkerî hene, dinav de kolêja Piyadeyan, Kolêja Cengî, Kolêja Werzişê ya leşkerî, Kolêja Berevaniya Asmanî, kolêja Zanyariyên leşkerî ji aliyê bakur û rojhilat ve, û zevîne ku hêzine alîgirên Hukûmetê lê dimînin, ji aliyê başûr ve, û hejmarek gundên alîgirên Hizbulaha Lubnanî ya Şî`î nêzîkî parzûngeha Himsê, ji aliyê rojava ve. Naverasta sala 2013an siloganek li ser dergehê taxê, nêzîkî «Meydana El-Mezre`a» hat bilind kirin ku tê de weha nivîsandiye «Birçîbûn yan çokdanîn», piştî wê yekê dergehên taxê bi tevahî hatin daxistin û rê li ber derbaskirina keresteyên xwarin û pizîşkî û şîrê zarokan û pêdiviyên din ên jiyanê, hat gitin. Hêzên Hukûmetê dergehê taxê tenê ji bo derketina bêveger, vekir. Piştre Hukûmetê dest bi bombebarankirinê kir û elektirîk di dirêjahiya Zivistana sala 2014an de birî, ew yek bû sedema pêleke din ya derbideriyê.

Sala 2015an, 150 hezar kes ji niştecêyên taxê li jêr rehma êrîşên asmanî yên berdewam, û top û mûşekên firehteqîn de, bûn, çend mehan vê rewş domand, li gel qedexekirina derbasbûna keresteyên xwarin û pizîşkî, ji ber wê yekê, hejmareke din ya niştecêyan koçber bûn. Di Berfanbara 2015an de, Hukûmeta Sûrî û Opozisyon gehiştin rêkeftinekê bi serpereştiya Neteweyên Yekgirtî, ku li gorî wê Rêkeftinê, beramberî rahiştina dorpêçê û derbaskirina alîkariyên hawarçûnê, dê du hezar şervan û sivîl ji taxa El-We`ir bo navçeyên kontirola Opozisyonê li gundewarên Idlibê, werin koçberkirin, serbarî serastkirina rewşên şervanên ku dixwazin çekên xwe radest bikin.

Careke din, Hukûmetê dest bi bombebarankirina taxê kir, û di destpêka Îlûna 2016an de, careke din herdu aliyan li ser rawestandina operasiyonên bombebarankirina taxa dorpêçkirî, û eşkerekirina çarenivîsa bihtirî heft hezar şervanî ku Opozisyonê navên wan pêşkêş kirine, beramberî dubarekar bi Rêkeftina sala 2015an bi serpereştiya Neteweyên Yekgirtî, rêkeft in, li gorî wê, divê şervanên Opozisyonê li ser pênc qonaxan berev bakurê Sûriyê, derkevin.

**Qunaxa yekem:** Derketina sêsed çekdarî li gel malbatên xwe ji taxa El-We`ir berev navçeyên jêr kontirola Opozisyonê li parêzgeha Idlibê ya li bakurê rojavayê welêt, weke koma yekem.

**Qunaxa duyem:** Serbestberdana dused girtiyên xelkê taxê ji aliyê Hukûmetê ve, û derketina pênsed şervanî ji şervanên Opozisyonê li gel malbatên xwe berev navçeyên jêr kontirola Opozisyonê li Idlibê.

**Qonaxa sêyem:** Eşkerekirina çarenivîsa girtiyan li gorî lîstên navan ku komîteya Danûstankar pêşkêş dike, beramberî derketina sêsed şervanên Opozisyonê li gel malbatên xwe.

**Qunaxa çarem:** Opozisyon dev ji binke û sazîne hukûmî li taxê, berdide, û derketina şervanên mayî li gel malbatên xwe.

**Qonaxa dawî:** radestkirina taxê bo Hukûmeta Sûriyê, û di 11ê Adara 2017an de bi sedan malbat ji taxê derketin, herweha avakirina komîteyeke giştî ku ji nûnerên «Komîteya taxa El-We`ir - Komîteya Ewlekarî li Himsê - aliyê Rûsî» pêk tê, ku serpereştiya bicîkirin û çareserkirina binpêkirinên vê Rêkeftinê, dike.

# Praktîkên koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran li Gundewarên Dîmeşqê

## Dorpêçkirin û koçberkirina xelkê Dareyayê

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat, milîsên Îranî û yên Îraqî û Hizbulaha Lubnanî ya Şî`î.

**Koçberkirî:** Sune

Di Mijdara 2012an de, Hêzên Hukûmetê Dareyaya Xûtayê (Gundewarên Dîmeşqê), dorpêç kir[64], û sala 2013an av jî li ser birî, û niştecê neçar bûn ku ava netendurist ya bîran ji bo mebestên paqijî û karûbarên rojane, bi kar bînin. Niştecêyan pişta xwe bi berhemên çanidiniyê û jiyana bê elektirîk heta agirbesta Tebaxa 2015an, girê da, piştre niştecêy bi tevahî hatin «derxistin».

Dareya mezintirn bajarên Xûtaya Rojavayî ye. Ji ber berfirehbûna avahiyê, Dareya gehişt başûrê rojavayê Dîmeşqê ku taxên li dijî Rêjîma Sûriyê derketine, dinav de jî taxa El-Mîdan, û El-Qedem, û bajarên El-Me`dimiye û Cideydit Ertûs, li xwe digre, herweha zeviyên wê digihin Bexçeyên Mezê û Kefersûsê û Balafirxaneya Mezê ya Leşkerî, wê yekê hişt ku bibe cihekî stratejîk nêzîkî paytextê û baregehên ewlekariyê. Dareya tevlî Mersûma jimare 66 ya sala 2012an bû ku li gorî wê Mersûmê dê du navçeyên birêxistinkirî di sînorê parêzgeha Dîmeşqê de, werin avakirin, navçeya duyem jî: Navçeyên xanûberî - Qenewat Besatîn - Dareya - Qedem, li xwe digre.

Hevdemî cihê wê yê nêzîkî paytextê, bajarê Dareya nerastiya çîroka Hukûmetê derbarê Opozisyonê ku bi terorîst bi nav kir, eşkere kir, Dareya bajarê ku gul pêşkêşî endamên Artêş û ewlekariyê li rêbendên dewrûberên, kirin, û xebata sivîl û gotara niştîmanî ya komkar, tevî salên dijwar yên dorpêçkirin û bêdengiya navdewletî, parast. bajarê ku çand û xwendin ji bo rûbirûbûna bombebarankirin û tundûtujiyê, bi kar anîn û pirtûkxaneyeke nihênî ku bi deh hezaran pirtûk tê de hebûn, parast, pirtûkên ku rojamevan Dilvîn Mînûyî di pirtûka xwe de bi»: «Komkerên pirtûkan» binav kir,  xelkê wê hatin neçarkirin ku rêkeftineke valakirina bajêr[65] ji xelkê xwe û koçberkirina wan berev bakurê Sûriyê di Tebaxa 2016an de, qebûl bikin. Herweha Encûmen wê ya xwecihî ku pabendî rewatiya hilbijartinî dibû, bizava herî serkeftî, pêşkêş kir, sivîlan ew Encûmen birêve dibir û girûpên çekdar destwerdan di karê wê yê li bajêr de nedikirin, di birêvebirina bajêr û serpereştiya çalakiyên sivîl de heta rojên dawî yên dorpêçkirinê, berdewam bû.

Dareya rastî derbasbûnên Artêşa Hukûmetê û bombebarankirinê hat, ku tê de Hêzên Hukûmetê gelek corên çek û teqemaniyan, weke bermîlên teqîner û çekên şewatker, bi kar anîn, û avahîne xizmetguzariyê, dinav de jî nexweşxaneya Dareya ya tekane ku ji kar ket, armanc kirin, di Mijdara 2012an de Hukûmetê dorpêçek danî ser derdora 7000 kesî ji niştecêyên ku li Dareyayê mane, piştî ku bi deh hezaran kes ji ber derbasbûna leşkerî û kiryarên kuştinê ku hin ji wan sê rojan di meha Tebaxa 2012an de dirêj kirin, reviyan, û «Komîteya Vekolînê ya Navdewletî ya Serbixwe ya Neteweyên Yekgirtî» ew yek bi kuştargeh, bi nav kir.

---

64 » Dorpêçkirin weke çekeke cengê: Dorpêçkirin, birçîkirin, istislamkirin, û valakirin29 ,«ê Gulana 2018an, Komîteya Vekolînê ya Navdewletî ya taybet bi Sûriyê, https://www.ohchr.org/Documents/HRBodies/HRCouncil/CoISyria/PolicyPaperSieges_29May2018_AR.pdf

65 »Xwendin û lêgerîna pirtûkine li jêr kavilan...Çawa şoreşvanan hêvî li Sûriyê peyda kir?20 ,«ê Adara 2021ê, El-Cezîre, https://www.aljazeera.net/news/cultureandart/2021/3/20/%D8%A7%D9%84%D9%82%D8%B1%D8%A7%D8%A1%D8%A9-%D9%88%D8%A7%D9%84%D8%A8%D8%AD%D8%AB-%D8%B9%D9%86-%D9%83%D8%AA%D8%A8-%D9%81%D9%8A-%D8%A7%D9%84%D8%A3%D9%86%D9%82%D8%A7%D8%B6-%D9%83%D9%8A%D9%81

Temam Cenah (Ebulxêr) şarezayê civaknasiyê, ku di Encûmena Xwecihî di dema dorpêçkirinê, û piştre di beşê rêveberî yê bi ser nexweşxaneya meydanî, de kar dikir, di şehadeta xwe ya ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirina de, got:

> Piştî ku Hêzên ewlekariyê û milîsên li gel, derbasî bajêr bûn, û bihtirî du hezar sivîlî girtin, û gelek kes winda bûn, di 25ê Tebaxa 2012an de, mezintirîn komkujî li Dareya rûda ku dedora 700 şehîdî bû qurbanî, piştre operasiyonên derxistina terman bi dema deh rojan ji Bexçe û jêrzemîn û rêyan, berdewam kirin. Hemî şehîdên komkujiyê di gorine bi kom de hatin veşartin. Artêş ji bajêr vekişiya û li pişt xwe bajarekî kavil hişt ku bihna xwînê heta du hefteyan jê dihat.

Piştî dopêçeke sê salan dirêj kir, li gorî rêkeftineke xwecihî navbera Hukûmet û Komîteyeke ku ji sivîl û şervanên Dareyayê pêk dihat, di 26 û 27ê Tebaxa 2016an hemî niştecê ku hejmara wan navbera 2500-4000 kesî bû, ji bajêr hatin derxistin, ew Rêkeftin bi koçberkirina niştecêyan berev bakurê Sûriyê yan berev navendeke nêzîkî Dîmeşqê ya Hukûmetê ya teybet bi valakirinê, bi dawî bû, piştî wê yekê bajêr rastî operasiyonine talankirina malûmulkan hat, Hukûmetê heta du salan rê neda xelkê derbasî malên xwe bibin.

Di şehadeta xwe derbarê Rêkeftinê, Temam Cenah got:

> Piştî ku Dareya bi tenê ma û rastî kêmbûnekê di her tiştî de dihat, û ji bilî derketinê li pêş me nema, danûstandin li gel nûnerên Hukûmetê li aliyê rojhilatî bajêr dest pê kirin, biştî ku gefa derbasbûna leşkerî hat xwarin eger Rêkeftina ku di 2016an de hatiye imzekirn, encam nede, , Rêkeftin li ser valakirina bi timamî ya bajêr hat kirin, ango bîranîna komkujiya herî mezin ya Dareya 25ê Tebaxê, roja din pasên kesk ji bo derxistina nişecêyan derbasî bajêr bûn, niştecê û şervanan çenteyên xwe amade kirin, karwana yekem ku ji şeş pasan pêk dihat, berê xwe da bajarê Idlibê, û pasine din berê xwe dan bajarê El-Hercele yê gundewarên rojavayê Dîmeşqê.

Piştî derbasbûna çar salan li ser koçberkirinê, hîn jî bajarê Dareya bi timamî ji nişecêyên xwe vala ye, mercê derbasbûna bajêr girêdayî bidestxistina karta şaredariyê ye, bi rêya tomarkirina nav li cem nivîsgeha cîbicîkar ya şaredariyê, û dagirtina formeke zanyariyên hurgul derbarê kes û endamên malbata wî kesî, serbarî navnîşan û hejmara mulkê wî yê xanûberî li Dareya, û pêşkêşkirina lênûska malbatî yan şirovenameya malbatî û belgeya mulkiyetê, piştre divê ew kes li benda bilindkirina navan bo nivîsgeha Ewlekariya Niştîman ji bo xwendina wê ji aliyê ewlekarî û erêkirinê ve, bimîne. Li gorî wê kartê, sivîl dikarin derbas bibin lê divê di heman rojê de derkevin bê ku dinava mala xwe de bimînin, gelek tedabîrên din hene ku Hukûmetê ji bo qedexekirina vegera xelkê Dareyayê, standine, mînak:

- Di Nîsana 2018an de, Yasaya jimare 10 bi behaneya birêkxistinkirinê derket, û li ser her hemwelatiyekî Sûrî yê li navçeyên ku Yasayê li xwe girt, ku xwedî mulkê xanûberî ye, dinav de jî Dareya, feriz kir ku mulkiyeta xwe bi şêweyekî rastewexo yan bi rêya wekilandina kesûkarekî xwe di heyama sî rojî ji dîroka destpêkirina ragihandina dubarerêxistinkirnê, li jêr egera jidestdana mafê mulkiyetê, piştrast bike.
- Hukûmetê piroseyên firoştina xanûberan li Dareyayê bi behaneya ku komîteyên bişkinina bi çav yên ser bi darayiya Dîmeşqê nikarin bigihin Dareyayê, qedexe kirin, tevî ku piroseyên berê yên firoştinê tenê pêwîstî şirovenameyeke darayî bûn, û ew yek jî girêdayî erêkirina ewlekariyê ye ku ji bo xelkê bajêr, nayê dan.

- Rêgirtin li ber vegera bihtirî 70 hezar derbiderî ku ji Dareyayê berev Cideydit Sehnaya û El-Kuswe û Kenakir û Zakiye û Muqbiliye û Ceremanayê ve derbider bûne, serbarî kesên ku sala 2016an berv navendên vehewandinê li Hercele ya gundewarên Dîmeşqê û parêzgeha Idlibê, koçber bûne.
- Hebûna sazî û xizmetguzariyên sereke tenê ji bo navçeya yekem ya bajêr ku li jêr kontirola Hêzên Hukûmetê ji sala 2012an ve mane, ye, ku taxên Şirêdî û El-Nekaşat û El-Şamiyat û Meydana El-Zeytûne û El-Kornîş û Kolana şaredariyê û kolana Dibistana Şir`î û taxa El-Xewlanî û taxa El-Xelîc, ku rastî wêrankirinê nehatine, li xwe digre, û hiştina navçeya duyem ku li jêr kontirola Opozisyonê bû, ku bi timamî wêran bûye, bê xizmetguzariyan, ew navçe taxên rojava û başûr, serbarî navçeya sînorê navbera El-Me`demiye û Dareya de, li xwe digre.
- Herifandina mulkan li bakurê bajêr û desteserkirina zeviyan ji balafirxaneya Mezê ya Leşkerî heta dergehê bajêr ji aliyê rêya giştî ya başûrî ve «Meydana El-Basil», bi behaneya ku ew navçe bi tevahî di dikeve sînorê yasayî yê Balafirxaneyê de.
- Fakterê Îranî jî zelal bû, bi behaneya parastina mezargeha «Seyide Sekîne» ku ji ber hebûneke mezin ya milîsên Îranî û Hizbula, bû çargoşeyeke ewlekarî, raportine rojnamevanî imzekirina girêbestan bi kompanîne Îranî ji bo avakirina komelgehine niştecêbûnê ji bo niştecêkirina Îraniyan li bajêr, pişt rast dikin.

## Dorpêçkirin û koçberkirina niştecêyên Me`demiyet El-Şam

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat, milîsên Şî`î yên Îranî û yên Îraqî, û Hizbulaha Şî`î ya Lubnanî

**Serpereştyar:** Artêşa Rûsî

**Koçberkirî:** Sune

Me`demiyet El-Şam ku cîrana Dareyayê ye, dikeve naverasta gelek xalên leşkerî û xalên alîgir ji Hukûmeta Sûriyê, weke balafirxaneya Mezê ya Leşkerî û taxa El-Meşrû` ji aliyê rojavayî ve, û ji aliyê bakurî ve çiyayên Me`demiyê ku Firqeya Çaran lê bicî bû, û Mesakin Someriye û Mesakin El-Şurte. Tenê 12 hezar kes ji eslê 32 hezar kesî ji niştecêyên wê man, û rastî dorpêçkirineke dijwar di 25ê Mijdara 2012an de û bombebarankirinê hatin, û gihandina alîkariyên mirovî yên hawarçûnê û keresteyên pizîşkî, li ser hatin qedexekirin[66].

66 Jibîrkiriyên li jêr dorpêçê: Raporteke taybet li ser kampa Yermûk li Dîmeşqê û Me`demiyet El-Şam li Dîmeşqê. Navenda Belgekirina Binpêkirinan, Îlûna 2013an, di 30ê Adara 2020a de li vê lînkê hat dîtin: https://bit.ly/3atrtDe.

Nûr mixêbir ji Me`demiyet El-Şam e - endamê Desteya Giştî ya Şoreşa Sûriyê û endamê Navenda Ragihandinê ya li bajêr e, di şehadeta xwe ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirinan de, got:

- Piştî derbasbûna Hêzên Artêşa Hukûmetê û milîsên Îraqî û Hizbulahê ku komkujiyek derheqê niştecêyan bi rêya serjêkirin bi kêran yan bi şewtandinê yan sêdaredana meydanî, encam dan, serbarî girtina bi dehên sivîlan, dorpêçkirina Me`demiyet El-Şam bi şêweyekê beşekî di Tebaxa sala 2012an de, dest pê kir. Piştre dorpêçkirin bi tevahî li jêr navê «birçîbûn yan çokdanîn» hat bicî kirin, hemî niştecêyên bajêr istislamkirin, red kirin, lê ji ber dijwariya dorpêşkirinê, nîşanên kêmxwariniyê li ser hemiyan derketin. Di 21ê Tebaxê de bajêr bi çekên kîmawî hat bombebarankirin, û 65 kes hatin kuştin û bi sedan kes birîndar bûn, piştre danûstandin dest pê kirin ku encama wê agirbestek di Îlûna 2013an bû ku piştî mirina bihtirî 15 zarok û jinan ji ber birçîbûnê, hat. Ew yek destpêkek ji bo danûstandinên 2016an bû ku li gorî wan danûstandinan, kankoçberkirin hat encamdan.
- Beşê bihtir yê Danûstandinên navbera şanda Me`demiyê «Serkirdeyên girûpan û serokê Encûmena Xwecihî» û şanda Hukûmetê li baregeha Firqeya Çaran, ku dikeve navbera bajêr û Dîmeşqê de, û li Hotêla Forsîzin li Dîmeşqê, bû, hemî civatên danûstandinan bi amadebûna efserine Rûsî yan nûnerine wan weke aliyê «gerentor»ê Rêkeftinê, dihatin encamdan. Danûstandin bi zimanekî gef û tirsandinê ji aliyê efserên Artêşê, û serokên şaxên ewlekariyê, dihatin encamdan. Ji xwe em nikarin nav lê bikin «rêkeftin», ji ber ku li ser bajêr bi gefa pejirandin yan şewtandina bajêr bi niştecêyên xwe, li jêr piştguhkirina cîhanê debarê tişta dihat rûdan, dihat feriz kirin.
- Ji encama danûstandinan, roja 19ê Cotmeha 2016an, pasên kesk derbas bûn ji bo veguhestina herkesê ku derbasbûna Hukûmetê bo bajêr di çarçoveya nav lê tê kirin «Lihevhatin», bo Idlibê li bakurê Sûriyê, red dike, dinav wan de çalakvan û şervan û kesên daxwazkirî ji bo leşkeriya neçar û kesine din jî hebûn, hejmara wan gehişt 3 hezar kesî.

# Koçberkirina bi neçarî li Wadî Berede

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat û Hizbulah

**Koçberkirî:** Sune

Rola Ewlekariya Avî ya paytextê di operasiyonên dorpêçkirin û koçberkirina «Wadî Berede» ya li jêr kontirola Opozisyona çekdar de, hebû, heta çend salan Wadî Berede ji ber cihê xwe yê simbolî û praktîkî ji bo niştecêyên Dîmeşqa paytext, di pêşengiya dîmenê de bû. Armanca êrîşên Hêzên Hukûmetê û milîsên Îranî, kontirolkirina Wadî Beredeyê bû, di dawiya sala 2016an armanca pambên wê yên avê kirin, piştre herdu alî gehiştin rêkeftinekê, li gorî wê Rêkeftinê divê şervanên Opozisyonê û malbatên xwe ji Wadî Berede berev Idlibê, derkevin, û Hukûmet kanî û gundên dewrûberên wê, kontirol bike.

Wadî Berede li gundewarên bakurê rojavayê Dîmeşqê ye, 20km dûrî navenda bajêr e, 14 gund lê hene «Cideydet El-Şeybanî - Eşrefiyet El-Wadî - Besîme - Ên Xezre - Ên Fîcê - Dêr Muqren - Kifêr El-Zeyt - Dêr Qalûn - El-Huseyniye - Bazara Wadî Berde - Kefir El-`Ewamîd - Berhelya - Efreh - Hureyre». Ji ber ku li hawirdorê wê girên ku beramberî Dîmeşqa paytext in, hene, serbarî hebûna kaniya Ên Fîcê; giringiyeke stratejîk ya Wadî Berede heye. Ji aliyê rêveberî ve, gundên Wadî Berede bi ser navçeya Zebedanê ya li parêzgeha Gundewarên Dîmeşqê ve ne.

Salim Nesrulah, serokê Encûmena Xwecihî ya gundên Wadî Berede, dibêje:

> «Ji destpêka Şoreşê ve, xwepêşandan li gundên Wadî Berede dest pê kirin, ew xwepêşandan rastî rûbirûpûneke tund ji aliyê Hêzên ewlekariyê û Artêşa Sûriyê ve hatin, destpêka sala 2012an, niştecêyan karîn piraniya gundên Wadî Berede kontirol bikin û Hêzên ewlekariyê û Artêş jê derxin, û mefrezeyeke ewlekariya Dewletê ku li Kaniya Fîcê bicih dibû, derkirin, bi wê yekê berdana ava kaniyê bo bajarê Dîmeşqê ket destê wan. Hêzên Hukûmetê nikarîn bi rêya bombebarankirin û dorpêçkirinê jî Wadî Berede careke din kontirol bikin. Di dawiyê de niştecê û Hukûmet li ser mana kaniya Fîcê li jêr destê karmendên rêvebirina kaniyê yên ku bi xwe ji xelkê Wadî Beredeyê ne, rêkeft in, ew rewş derdora sê salan weke xwe ma».

Cemaludîn ku bi «Ebû Muhemed El-Birdawî» tê naskirin, ji niştecêyên gundê Ên Fîcê ye, û rêveber û berdevkê Desteya Ragihandinê ya Wadî Beredeyê ye, dibêje:

> Ji salên pêncîyî yên sedsala bûrî heta sala 2011an, hukûmetên Sûriyê hewl dane ku dest deynin ser gundê Ên Fîcê û xelkê wê ji mal û zeviyên wan ku ji sedên salan ve ji bavûkalên xwe mîrat birine, derxînin, û beramberî perene kêm dest deynin ser wan mulkan yan beramberî xanûberinan ku nehêjayî çaryekê nirxê xanûberên resen in, ji van hewlan pirojeya destdanîna li ser mulkan sala 1978an ku rastî redkirinê ji aliyê xelkê ve hat, lê ji ber fişaran, Hukûmetê di dema du salan de piraniya mulkên nêzîkî Kaniyê kirîn, û rêjeyeke kêm ya xwediyên mulkan firoştina xanî yan xanûberên xwe, red kirin, ji wan bapîrê min ku red kir xaniyê xwe bifroşe û jê derkeve. Di salên notî de, li bo Pasewanên Komarî, Wîzareta Berevaniyê dest danî ser rûberine berfireh ji zeviyan bilindahiyên dewrûberên Wadî Berede, ku herdu Lîwayên 104 û 105 yên Pasewanên Komarî, lê bicih bûn.

Sala 2017an, Hukûmetê Biryara Dewletê û rijdbûna wê li ser valakirina bi tevahî ya Ên Fîcê û qerebokirina xelkê wê bi xaninyan li bajarê Karkeran li `Edraya Xûtaya Dîmeşqê, bi hin rîsipiyên gund ji xelkê re şand, ev Biryar rastî nerazîbûneke mezin ji aliyê xelkê ve hat, û biryar dan eger ev Biryar were bicîkirin, ew dê derkevin xwepêşandaneke mezin ku tê de jin û mêr bejdar dibin, ji ber wê yekê, ew Biryar hat paşxistin.

Kemal Cemaludîn di şehadeta xwe de, weha berdewam dike:

> Sala 2015an, hin serkirdeyên girûpên leşkerî yên Opozisyonê yên li Ên Fîcê, ava kaniyê li ser Dîmeşqê, birîn, û dubareberdana avê ji bo paytextê bi rawestandina hilmeta leşkerî li ser bajarê Zebedanê ve, girêdan. Weke bersiv li dijî birîna ava kaniyê, Hukûmetê gundên Wadî Berede dorpêç kirin û ew gund topbaran û bombebaran kirin, bi taybet gundê Ên Fîcê, ji ber wê yekê hejmareke mezin ji xelkê weke rev ji bombebarankirinê, derbider bûn. Dorpêçkirin şeş mehan dirêj kir, piştre rêkeftinek li ser rahiştina dorpêçê û dubareberdana ava kaniya Fîcê, serbarî xaline din girêdayî kesên daxwazkirî û girtiyan, hat imzekirin, beşekî pir kêm ji wê Rêkeftinê hat bicîkirin.

22ê Berfanbara 2016an, Hêzên Hukûmetê bi bejdariya milîsên Hizbulaha Lubnanî, dest bi hilmeteke nû û dijwar li ser hemî gundên Wadî Berede kirin, û dorpêçkirin li ser gundên ku rastî bombebarankirinê bi bermîlên teqîner û topbarankirinê bi şêweyekî bêserûber hatine, dijwartir kir, û rê li ber derketina sivîl, jin, zarok, û nexweşan, girt. Hilmet heta mêjûya Rêkeftina koçberkirinê di 27ê Çileya 2017an de, berdewam kir, Hukûmetê hewlên agirbestê red kirin û Danûstankarê ku nûnerê xelkê Wadî Beredeyê bû, Lîwaa Ehmed El-Xedban, teror kir, û karî rêkeftinekê feriz bike ku xelk û çekdaran berev bakurê Sûriyê, piştî komkirina wan li gundê Ên Fîcê, dê koçber bike. 28ê heman mehê, operasiyona koçberkirina derdora 2250 kesî, ji wan (50) şervan bûn, û yên din sivîl bûn, dest pê kir.

Piştre, Hukûmetê rê da hin niştecêyên alîgir ku vegerin, ji bilî xelkê herdu gundên Ên Fîcê û Besîme ku rê neda ti kesî vegere wan herdu gundan. ji bo Saziya Avê, Hukûmeta Sûriyê herweha dest danî ser hemî xanûber û zeviyên dewûrûberên Kaniya Fîcê, û bi dehên xaniyan bi navê «zeviyên kaniyê» yên rastewxo û nerastewxo, hatin wêrankirin û herifandin, di heman demê de hin aborîkarên nêzîkî desthilatê xanûber û mulkên hin niştecêyên ku bi neçarî ji gund derketine, dikirîn.

## Timamkirina koçberkirinê

Xûtaya Rojhilat - El-Tel û Xan El-Şêx - Qudseya û El-Hamê - Başûrê Dîmeşqê - Qelemûna rojhilat

## Xûtaya Rojhilat

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat, Balafirên Rûsî, milîsên Îraqî û yên Îranî û Hizbulah

**Aliyên Rêkeftinan:** Rêjîma Sûriyê, û Rûsiya, Ehrar El-Şam ya dijber, Feyleqa El-Rehman ya dijber, Artêşa El-Islam ya dijber

**Koçberkirî:** Sune

Piştî wêrankirineke hemahema tevahî ya bajar û gundan û bombebarankirina berdewam li ser Cihên Sivîl û li ser mizgeft û dibistan û navendên pizîşkî û yên xizmetguzariyê, bi çekên corbicor yê navdeletî yên qedexekirî, ji wan çekên kîmawî, Taxên Xûtaya Rojhilat rastî koçberkirineke bi neçarî hatin. Bi rêkeftinekê navbera Rûsiya û Tevgera Ehrar El-Şam di Adara 2018an de, bajarê Heresta ji kontirola Opozisyona çekdar derket, û Qitaa El-Ewset bi tvahî bi rêkeftinekê navbera Rûsiya û «Feyleq El-Rehman» di heman demê, ji kontirola Opzozisyonê derket, û bi rêkeftinekê navbera Rûsiya û girûpa «Artêşa El-Islam» di Nîsanê de piştî dorpêçkirineke demdirêj û operasiyonine leşkerî bê rawestan bi dirêjahiya her pênc salan, bajarê Dûma ji kontirola Opozisyonê derket. Danûstandin li Xûtayê li ser sê beşên navçeyê bû, piştî Rûsiya bi yekcarî avakirina şandeke danûstankar ya yekgirtî ji bo hersê navçeyan, red kir, danûstandin li gel her beşekî bi cuda dihat kirin, Rûsiya li ser danûstandinê bi her navçeykî re û bi her girûpekê re, bi şêweyekî cuda, rijd bû, li gorî Neteweyên Yekgirtî di dema bicîkirina Rêkeftinan navbera 19ê Adarê heta 18ê Nîsanê, bihtirî 158 hezar kesî ji Xûtayê derketin, wate derdora 40% ji niştecêyên Xûtaya Rojhilat.

Koçberkirina Xûtaya Rojhilat û kontirolkirina herdu bajarên Heresta û Dûma, weke ragihandineke kontirola Hukûmetê ya tevahî li ser dewrûberên paytextê bû, wê yekê serdestiyeke siyasî û leşkerî da Hukûmetê, û rê da ku tekeziya leşkerî bo başûrê paytextê, ji bo kontirolkirina taxên El-Qedem, El-Tedamun, El-Hecer El-Eswed û kampa Yermûk, were veguhestin.

## Qudseya û El-Hamê

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat

**Aliyên Rêkeftinan:** Rêjîma Sûriyê, Hêzên Rûsî, Hêzên Opozisyona Sûriyê

**Koçberkirî:** Sune

Piştî hilmeteke leşkerî ku tê de Firqeya Çaran ya Hêzên Hukûmetê hewl da berev navçeyê, bi rêya topbaraneke pêşîn ji aliyê Rehbe, saziya Kargehên Berevaniyê û Qişleya Hêzên Taybet li El-Dirêc, pêş bikeve; Opozisyona çekdar li herdu bajarokên Qudseya û El-Hamê yên dewrûberên rojavayê Dîmeşqê li ser Rêkeftina «lihevhatinê» bi Hukûmetê re di Cotmeha 2016an de, erê kir, hevdemî wê yekê Hukûmetê pirojeyeke valakirina navçeyê pêşkêş kir ku tê de hatiye jî -Weke hemî serastkirinên ku li  Dîmeşqê hatine encamdan- beramberî rawestandina bombebarankirina bêserûber li ser navçeyê, û derbaskirina alîkariyên xwarinê ji bo sivîlan, û avakirina komîtene gelêrî ji xelkê navçeyê ku bi şêweyekî rastewxo li jêr fermana Pasewanên Komarî de bin, divê şervan û her kesê çek hildigire berev Idliba bakurê Sûriyê werin derxistin.

Herdu bajarên Qudseya û El-Hamê yek ji giringtirîn binkeyên Opozisyonê li tenişt dergehê Dîmeşqê yên  Dîmeşqê ne, û bihtirî nîv milyon kesî, serbarî bi deh hezaran ji derbideran li xwe digrtin. Ji ber nêzîkbûna wan ji Koşka Komarî û piraniya baregehên Firqeya Çaran, Hukûmet ji bo kontirolkirina wan weke beşek ji pilana parastina dewrûberên Koşkê, bi rêya neçarkirina bajar û bajarokên dewrûberên wê, li ser imzekirina agirbestê û derketina girûpan berev bakurû Sûriyê, rijd bû.

El-Tel û Xan El-Şêx: Di Mijdara 2016an de, Opozisyona çekdar rêkeftinek bi Hukûmetê li ser «derxistina» şervanên Opozisyona çekdar û malbatên wan û sivîlên ku dixwazin, ji herdu bajarokên ku li  rojavayê Dîmeşqê ne, berev navçeyên Idlibê, imze kir, ku bi wê yekê bi sedan niştecê bi neçarî koçber bûn.

Koçberkirina Qelemûna Rojhilat: Navçeya Qelemûn dikeve rojhilatê rêya navdewletî ya ku Dîmeşqa paytext bi bajarê Himsê ve girê dide, gelek bajaran weke El-Dimêr, El-Nasiriye, El-Riheybê, û El-Qiteyfê, li xwe digire, sala 2011an hejmara niştecêyên wê derdora 400 hezar kesî bû, herweha bi sed hezaran derbider jî lê niştecê dibûn, ku hejmara niştecêyên wê gehişt yek milyon kesî.

Di 19ê Nîsana 2018an de, girûpên leşkerî yên li Qelemûnê li ser xalên rêkeftinekê bi Rûsiyayê re, erê kir, li gorî wê Rêkeftinê çekên giran têne radestkirin û bi hezaran sivîlên ku lihevhatina berev navçeyên bakurê Sûriyê nedixwestin, têne koçberkirin, serbarî serastkirina rewşên kesên ku dixwazin bimînin, bi rêya navendekê di hundirê navçeyê de.

# Kampa Yermûk

**«Hemahema, hemî penaberên Filestînî yên li wê kampê, revîne»**

Berdevkê fermî yê Emîndarê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî, weha behsa Kampa Yermûk sala 2018an, dike.

«Kampa Yrmûk» sala 1957an, 8km dûrî Dîmeşqa paytext, ji bo vehewandina penaberên Filestînî yên ku li ser mizgeft û dibistan û cihên giştî dabeşkirî bûn, hat avakirin. Sala 2011an, derdora 160 hezar penaberên Filestînî li wê kampê dijiyan, mezintirîn kampa nefermî ya penaberên Filestînî li Sûriyê bû, weke paytexa derbideriya Filestînî li cîhanê bû, li gorî Neteweyên Yekgirtî[67].

Piştî kontirolkirina kampa Yermûk ji aliyê Opozisyona çekdar ve sala 2012an, Hukûmeta Sûriyê û girûpine Filestînî yên bi ser ve, ji wan «Eniya Gelêrî ya Rizgarkirina Filestînê - Serkirdayetiya Giştî», dorpêçeke dijwar li ser kampa Yermûkê, feriz kir.

Li gorî Neteweyên Yekgirtî[68], ji ber şerûpevçûnan, derdora 140 hezar kesî ji niştecêyên Kampê, neçar bûn di Berfanbara 2012an de, ji Kampê derkevin. Di Nîsana 2015an de, DA`IŞê dest danî ser sêyekê Kampê, û «bi hezaran niştecêyên din berev bajarokên Yelda, Bîbla, Bêt Lehim û taxa El-Tedamun, derbider kirin»[69].

Di Tîrmeha 2013an de, Hêzên Hukûmetê[70] û Hêzên alîgirên wê dorpêçkirineke tevahî danîn ser derdora 18 hezar kesên sivîl, û derbaskirina alîkariyên mirovî jî, qedexe kir.

Di Gulana 2018an de, Rêjîma Sûriyê bi serpereştiyeke Rûsî / Turkî / Îranî rêkeftineke valakirinê imze kir, ji encama wê 10 hezar kesên sivîl ji kampa Yermûk, derbider bûn. Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya taybet bi Sûriyê, got ku «Piraniya 10 hezar sivîlî yên ku dorpêçkirî li hundirê kampê heta vegera kontirolê li ser, di 21ê Gulanê de, mabûn, li gorî «Rêkeftina valakirinê» bi neçarî derbider bûn. «Ajansa Neteweyên Yekgirtî ya Hawarçûn û Karûbarên Penaberên Filestînî» UNRWA, got ku kampa Yermûk li jêr rewşeke wêrankirinê de ye, û hemahema xaniyek tuneye ku nehatibe wêrankirin yan ziyan nedîdibe. Berdevkê fermî yê Emîndarê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî, got: «Hemahema, hemî penaberên Filestînî yên li wê kampê, revîne».

67 Kampa Yermûk (Kampeke nefermî ya penaberan e), UNRWA - Ajansa Neteweyên Yekgirtî ya Hawarçûn û Karûbarên Penaberên Filestînî li Rojhilata Jêrtirîn.

68 Neteweyên Yekgirtî, Encûmena Mafên Mirovan, raporta Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya Serbixwe ya taybet bi Karûbarên Komara Erebî ya Sûriyê, A/HRC9.65/39/, Tebaxa 2018an, https://digitallibrary.un.org/record/1641475?ln=en

69 Jêdera berê.

United Nations, Human Rights Council, Report of the Independent International Commission of Inquiry on the Syrian Arab Republic, A/HRC/39/65, 9 August 2018, https://digitallibrary.un.org/record/1641475?ln=en

70 Jêdera berê.

# Rêkeftina koçberkirina Yermûk û Kefreya / Fû`a

Di 28ê Nîsana 2018an de, Ajansa Nûçeyan ya Sûriyê ya Hukûmî got ku rêkeftinek hat imzekirin ku li gorî wê, beramberî derketina xelkên herdu bajarokên Kefreya û Fû`ayê, dê şervan û malbatên xwe ji kampa Yermûkê derkevin.

**Aliyên Rêkeftinê:** Hukûmeta Sûrî û Desteya Tehrîr El-Şam bi şweyekî sereke, û bi serpereştiya Îran û Rûsiya û Turkiye.

Rêkeftinê valakirina şervan û malbatên xwe ji kampa Yermûkê berev Idlibê, û valakirina hemî niştecêyên herdu bajarokê Kefreya û Fû`a yên Şî`î li gundewarên Idlibê, ku hejmara wan derdora 7 hezar kesî ye, berev Helebê, li xwe girt.

Sala 2020an, Parêzgeha Dîmeşqê pilana rêxistinî ya jimare 105 ku kampa Yermûkê jî li xwe digire, ragihand, û tenê yek meh derfet da xwediyên mafan û xelkê navçeyê ku nerazîbûnên xwe pêşkêş bikin. Pilan ji aliyê bi hezaran niştecêyan ve rastî nerazîbûnê hat. Hukûmet ji pilan venegeriya, lê paşxistina wê ragihand.

Hukûmetê heta çend salan rê neda xelkê kampa Yermûkê vegerin, sala 2020an mercine astem[71] ji bo vegerê danîn, ji wan: Erêkirina ewlekarî, û piştrastkirina mulkiyetê, û silametiya xanî, tevî ku Hukûmetê qebareya wêrankirina ku rastî piraniya avahiyan hatiye, dizanî. Heta destpêkên sala 2021ê, tenê çend sed[72] malbat vegeriyan kampa Yermûkê.

# Koçberkirina bi neçarî li rojhilatê bajarê Helebê

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê, Istixbarat, milîsên Îranî û yên Îraqî û Hizbulah, û Rûsiya

**Aliyên Rêkeftinan:** Hêzên Hukûmeta Sûriyê, Rûsiya, Turkiye, û Ehrar El-Şam ya dijber

**Koçberkirî:** Sune

Ji sala 2012an ve, bajarê Helebê dabeşî du beşan bû, beşê rojhilat kete jêr kontirola komên çekdar yên Opozisona, û beşê rojava kete jêr kontirola Hukûmeta Sûriyê. Di 7ê Tîrmeha 2016an, hevdemî êrîşine asmanî ji aliyê Artêşa Hukûmî bi piştevaniya Hêzên Rûsî ku armanca sivîl û Cihên Sivîl dikirin, û tê de çekên şewatker, û bombeyên weşî yên qedexekirî, bi kar tanîn; Hêzên Hukûmetê dorpêçek li ser beşê rojhilat ku derdora 275.000 - 250.000 kesî lê dijiyan, feriz kir, û mercine dijwar li ser gehiştina xwarin û derman ji bo dorpêçkiriyan, danîn. Van êrîşan di serî de armanca taxên ku niştecêbûnê, bazar û nexweşxane yên li navenda bajêr bê ku ti armancine leşkerî li dewrûberên wan cihan hebin, dikir.

Ehmed Ebû Mucahid `Etar ku bi «Mucahid Ebû Cûd» tê naskirin, rojamevanekî ji bajarê Helebê ye, û li gel Navenda Helebê ya Ragihaninê û Televizyona TV News ya Birîtanî kar dike, got: Ji aliyê praktîkî ve, dorpêçkirina Helebê beriya sala 2016an derst pê kir, bi taybet beriya ragihandina dorpêçê bi heşt mehan, ango dema pêşveçûna Hêzên Hukûmetê li herdu gendên El-Melah

71 » Vegera niştecêyên kampa Yermûk bo malên xwe yên bi kêrî niştecêbûn tên, di çend rojan de«, Rojnameya El-Weten/ Facebook, 5ê Cotmeha 2020an.

72 Kampa Yermûk (Kampeke nefermî ya penaberan e), UNWRA - Ajansa Neteweyên Yekgirtî ya Hawarçûn û Karûbarên Penaberên Filestînî li Rojhilata Jêrtirîn.

û Hendarat li bakurê rojhilatê bajarê Helebê, li ser rêya «Kastêlo» ku dergehê tekane bû ji bo niştecêyan, rêya ku berdewam rastî topan ji aliyê Yekîneyên Parastina Gel yên li taxa Şêx Meqsûd ku beramberî wê rêyê ye, dihat, û ji ber wê yekê çûnûhatin li ser wê rêyê pir metirsîdar kir, û derbasbûna keresteyên xwarinê bi şêweyekî mezin kêm kir, piştre Hêzên Hukûmetê û milîsên biyanî yên piştevanên wê, karîn dorpêçê li ser taxên rojhilatê bajar Helebê bi tevahî roja 1ê Hizêrana 2016an de, bicî bikin.

Berdewam dike û dibêje:

Tîmên Berevaniya Sivîl ya Sûriyê navbera 15 û 28ê Cotmeha 2016an, armanckirina bajêr bi bihtirî du hezar êrîşên asmanî û heft hezar topên topxane û mûşek, serbarî mûşekên Balistîk û çekên ji aliyê navdewletî ve qedexekirî ne, belge kirine. Serbarî armanckirina berdewam li ser cadeyên giştî ku gihandina tîmên Firyakeftin û Berevaniya Sivîl bo cihên ku rastî bomebarankirinê tên, zehmet kir, û hişt ku ew tîm nikaribin ti xizmetê pêşkêşî niştecyan bikin. Herweha hemî nexweşxane di dema dorpêçkirinê de, bi şêweyekî tevahî ji kar ketin, serbarî armanckirina embar û navendên hawarçûnê, ku bi wê yekê karên saziyên hawarçûnê û nanxane bi şêweyekê hemahema tevahî, rawestan.

Di Berfanbara sala 2016an de, piştî danûstandinan navbera «Tevgera Ehrar El-Şam ya Islamî» û nûnerekî Hukûmeta Rûsiyê, Rêkeftin li ser derketina hemî şervanên Opozisyonê berev bakurê parêzgeha Helebê, hat kirin. Tevî ku wê Rêkeftinê behsa koçberkirina sivîlan nekiriye, lê ezmûma koçberkirinê û bombebarankirina rojane, û nebûna baweriyê bi soznameyên Hukûmî, û tirsa sivîlan ji ber sitemkarî û tolhildana Hukûmetê, li ser jiyana xwe, bûn sedema derketina piraniya mezin ya niştecêyên navçeyê ku hejmara wan derdora 37.000 kesî bû.

Ehmed Mucahid `Edar di şehadeta xwe de, got:

Derketina koma yekem ya dorpêçkiriyan (Karwana birîndaran) roja 15ê Berfanbara 2016an, dest pê kir, Hêzên Hukûmetê derketina wê komê asteng kir û birîndar û endamên Berevaniya Sivîl bi guleyên rastewxo armanc kirin, kesek hat kuştin û sê kesên din birîdar bûn. Piroseya valakirinê heşt rojên tevahî, dirêj kir, roja 22ê Berfanbara 2016an, bi dawî hat.

Şehadeta Salim El-Etreş, jidayikbûyê bajarê Helebê ye, û Sekretêrê Encûmena Xwecihî ya bajarê Helebê ji 3ê Adara 2013an heta Hizêrana 2015an, piştre endamê Desteya Giştî ya Encûmena bajêr bû:

Piştî pêşçveçûna Hêzên Hukûmetê û yên Îranî, bi piştevaniyeke asmanî Rûsî, dorpêçkirin li ser bajêr di 4ê Tîrmeha 2016an de, hat feriz kirin. Ji ber dorpêçkirinê, 300 hezar kes rast rewşeke nexweş û kêmbûneke mezin ya keresteyên xwarinê, hatin. Bi dirêjahiya dorpêça ku şeş mehan berdewam kir, Neteweyên Yekgirtî nikarî ti alîkariyan derbas bike, ji bilî herdu hefteyên vekirina rêya Ramûsê ku hin niştecê ji ber dorpêçî derketin, û gelek ji wan niştecêyan dema derketinê rastî bombebaranê dihatin; ti keresteyên xwarinê nehatin derbaskirin, dorpêç ji aliyê sê hêzan ve hatibû bicîkirin: Artêşa Sûrî, Hêzên Îranî: Lîwaya El-Quds ya Filestînî, milîs, Hizbulah, Lîwaya El-Baqir, Fatimiyûn, û ji aliyê asmanî ve Hêzên Rûsî ku jêrxane û hemî rê û tax, wêran kirin, 90% ji qurbaniyên bombebarankirinê, sivîl bûn.

Di Îlûna 2015an de, Rûsiya dest bi piştevaniya Hêzên Hukûmetê li ser gelek eniyên şer yên sereke, kir, «di nav de jî Heleb, ku êrîşên asmanî bi armanceke giştgîr ango dorpêçkirina rojhilatê Helebê, hat bikaranîn».[73]

Hukûmeta Sûrî û Rûsiya dest bi êrîşine asmanî bêserûber li ser rojhilatê Helebê bi şêweyekî rojane, kirin, jêrxaneyên corbicor yên giring ji bo jiyanê, dinav de jî dibistan û nexweşxane û navendên tendurûstiyê û nanxane û bazar, li xwe girtin. Di naverasta sala 2015an de, Hukûmeta Sûriyê bi piştevaniya asmanî ya Rûsî, dorpêçkirinek li ser beşê rojhilat yê bajarê Helebê, ku derdora çaryek milyon kes lê dijiyan, feriz kir, û hemî alîkarî li ser qedexe kirin.

Di Îlûna 2016an de, balafirên Sûrî û yên Rûsî. Hilmeteke bombebarankirina asmanî ya dijwar bi dirêjahiya mehekê, li ser navçeyên Opozisyonê, encam da, ku tê de çekên qedexekirî, bi kar anîn.

Di 14ê Berfanbara 2021ê, Dadgeha Odinse ya Danîmarkî kompaniyeke Danîmarkî bi binpêkirina sizayên Ewropî, tometbar kir, ji ber ku wê kompaniyê sotemeniya pêwîst ji bo encamdana êrîşên asmanî li Sûriyê, ji bo Rûsiyê dabîn dikir, û got ku gerek wê kampaniyê zanîba egereke mezin heye ku Rûsiya dê wê sotemeniyê di hilmeta xwe ya samaî li Sûriyê, bi kar bîbne.

Kompaniya Danîmarkî, dinavbera Cotmeha 2015an heta Gulana 2017an, sotemenî ji Rûsiyayê re, dabîn dikir.

Şarezayê leşkerî yê Danîmarkî, Ra`id Mîkêl Storim Yinsin, got ku giringiyeke mezin ya sotemeniya ku kopmaniya Danîmarkî firoştiye Rûsiyê ku 172 hezar ten bû, di bihêzkirina Rûsiya ji bo encamdana êrîşên asmanî de, hebû.[74] Yinsin di şehadeta xwe li pêş dadgehê got ku roleke yekalîker ya êrîşên asmanî yên Rûsî di payîza 2016an de, di ketina Heleba Rojhilat de, hebû.[75]

Andirês Rîşindov, Dozgerê Dewletê yê Giştî yê taybet bi tawanên aborî yên taybet û yên navdewletî, got:[76]

> Du kompanî û rêveberek, bi firoştina bihtirî 170 hezar ten ji sotemeniya balafiran bo kompanîne Rûsî ku ew sotemenî şandine Sûriyê, hatin tometbarkirin. Ev yek nîşana metirsiya binpêkirinê ye, ku ew sotemenî derbasî tankên balafirên şerker yên Rûsî bû, ku li şûna El-Esed, Sûriye bombebaran kir. Bêguman mjareke pir metirsîdar e dema kompaniyeke Danîmarkî sizayên Ewropî yên ku li ser bingeha rewşeke pir dijwar, li ser dewleteke din, hatine feriz kirin, binpê dike.

Di 1ê Berfanbara 2016an, hevpeymaniyeke cîhanî ku ji 223 rêxistinên nehukûmî pêk tê, dinav de Navenda Sûriyeyî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê jî, bang li welatên endam di Neteweyên Yekgirtî de kir ku civateke awarte ya Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî li dar bixin ku tê de daxwaza rawestandina hemî êrîşên ne yasayî li ser sivîlan li Helebê, were kirin.[77]

---

73 Neteweyên Yekgirtî, Encûmena Mafên Mirovan, raporta Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya Serbixwe ya taybet bi Karûbarên Komara Erebî ya Sûriyê, A/HRC2 ,9 ,65/39/ê Sibata 2017an.

74 Eksperter: Brændstofmængde i dansk sag var afgørende for Syrien-krig, DR.dk, 19 November 2020. https://www.dr.dk/nyheder/indland/eksperter-braendstofmaengde-i-dansk-sag-var-afgoerende-syrien-krig?fbclid=IwAR0rHnzlqclfnEMLPuMRm1HVc-AU6oDWC1C9d0mrxkFPVEVH15324PQ-vR0

75 Dan-Bunkering trial: Denmark also bombed Syria, confirms defence counsel, Mainfold Times, 25 November 2021. https://www.manifoldtimes.com/news/dan-bunkering-trial-denmark-also-bombed-syria-confirms-defence-counsel/

76 Dan-Bunkering, Bunker Holding og direktør dømt for at sælge brændstof til Syrien, Anklagemyndigheden, 14 December 2021. https://anklagemyndigheden.dk/da/dan-bunkering-bunker-holding-og-direktoer-doemt-saelge-braendstof-til-syrien

77 » Yekgirtiyên ji bo aştiyê li Sûriyê: Bangewaziyek ji civaka sivîk ya cîhanî ji bo welatên endam di Neteweyên Yekgirtî de«, Human Rights Watch, 1ê Berfanbara 2016an, https://www.hrw.org/ar/news/2016/12/01/297034

# Xuyatirîn piroseyên koçberkirina bi neçarî yên ku Îran û milîsên bi ser ve, encam dane

## Koçberkirina El-Qisêr li ser destê milîsa Hizbulah

Şerê bajarê El-Qisêr yê ku 35km dikeve başûrê rojavayê Himsê, û 15km dûrî sînorê Lubnanê ye, ku bi kontirolkirina bajêr ji aliyê Hukûmeta Sûriyê ve, bi dawî bû, bûyreke movikî bû ku bi xwe re bandorine mezin ji aliyê me`newî û leşkerî ve, bi xwe re anîn. El-Qisêr xala peywendiyê navbera bakurê Lubnanê û gundewarên başûrî yê Himsê ye, 10 km dûrî xala ku piraniya rêyên navdewletî li hundirê Sûriyê digihîne hev, e.

Ji aliyê rêveberî ve, bihtirî çil gundên têkel ji aliyê olî û yayîfî ve, bi ser ve ne, musilmanên Sune, û xiristiyan li bajêr û dewrûberên wê yê nêzîkî herdu gundên El-Mûh û Ebû Hûrî, bicih dibin, û hejmarek gundên Şî`e hawirdorê wan in, ji wan yên herî xuya gundê El-Burhaniye, û El-Dumêneya rojhilat, û El-`Qerbiye, û El-Nîzariye, û gundine Elewî weke El-Heyderiye û El-`Ibûdiye. Piştî hilmeteke leşkerkirina tayîfî ji bo razîkirina alîgirên xwe bi erkê şerê berevaniyê d iber gundên Şî`î li navçeya El-Qisêr, li El-Qisêr, destwerdana fermî ya Hizbulah ji bo şerê li Sûriyê, hat ragihandin.

Di Hizêrana sala 2013an de, bajêr rastî yekemîn û mezintirîn operasiyona koçberkirina bi neçarî di şerê Sûriyê de, hat, ew yek jî piştî êrîşeke mezin ku tê de Hêzên Hukûmetê û milîsa Hizbulah hemî corên çek, serbarî bombebarankirina asmanî ya tund, bi kar anîn, wê yekê sivîl ji bo derbideriyê berev bakurê Sûriyê, neçar kir, herweha hin sivîlan berê xwe dane bajarokê `Irsal yê nêzîk li Lubnanê, heta dema amadekirina vê lêkolînê jî hejmara kesên vegeriyane bajêr ne zêdeyî 10% ji koçberkiriyan e.

«Hizbulah» di salên bûrî de, El-Qisêr kir baregeh û xala destpêkirina operasiyonê xwe yên leşkerî ku berfirehî navçeyên din yên Sûriyê bû, bi taybet li ser hêla sînorî bi Lubnanê re, serbarî tevgereke çalak ya Hizbulah û alîgirên xwe bi kirîna xanûberên niştecêbûn û zeviyên çandiniyê, ku pêwîstiya xelkê û hejariya ku bi ser de hatiye, isixlal kir, û sûd ji Yasaya jimare (11) ya sala 2011an ya taybet bi hukmên mulikkirina kesên ne Sûrî ji mafên ne madî yên xanûberan re ku rê dide biyaniyan ku li gorî biryarekê ji Encûmena Wezîran piştî pêşinyareke herdu wezîrên Navxwe û Derve, bibin xwedî mafên xanûberî.

Di Cotmeha sala 2018an de, pilana rêxistinî ya bajarê El-Qisêr, li gorî Yasaya jimare (10), hat ragihandin, û dema pêşkêşkirina nerazîbûna li ser pilanê bo dîwana Encûmena bajêr ji 10ê Cotmehê heta dawiya dewamê roja 9ê Mijdarê, destnîşan kir, ew yek jî hevdemî ne amadebûna niştecêyên bajêr û nekarîna wan ji bo vegerê heta ku mulkên xwe piştrast bikin, û hevdemî rêjeya wêrankirina 7% ji bajêr, tê.

Xalid Herba (Ebû Mu`awiye), jidayikbûyê El-Qisêr e, 57 salî ye, di şehadeta xwe de ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirina li Sûriyê, dibêje:

> Weke navçeyên din yên Sûriyê, Şoreş li El-Qisêr bi aştiyane dest pê kir, heta şeş mehan Hukûmetê dirindetirîn tawan û komkujî tê de encam didan, ya herî navdar komkujiya El-`Asî bû ku tê de 13 kes şehîd bûn serbarî kuştin û işkencekirina girtiyan, wê yekê niştecêyên bajêr neçar kir ku çek hilgirin. Tevî dorpêça ku heta Hizêrana 2013an berdewam kir, firqeyên leşkerî û Hizbulah Hêzên xwe lê zêde kirin, Hukûmetê bajêr kontirol kir, Hizbulah bi tundî derbasî bajêr bû û şerek bi girantirîn çekên zevîdarî û balafirên şerker û hoverkraftan, encam da, yekemîn navçeya ku bermîlên teqîner li ser hatin bi kar anîn, bû, şer berdewam bû û xelkê El-Qisêr derdora 3300 şehîd û bi qasî wê hejmarê birîndar ku piraniya wan sivîl ji temenên corbicor, pêşkêş kirin. Serbarî wêraniya derdora sêyekê bajêr bi tevahî, û şewtandina mulk û zeviyên çandiniyê heta gehişt asta nemana debara jiyanê, hevdemî birîna piştevaniya teduristî û nebûna kadiran û nebûna cihên aram ji bo parastina birîndaran.

«Xalid Herba» berdeam dike:

> Roja 5ê Hizêrana 2013an, şervanan biryar da ji El-Qisêr bi şêweyekî bêserûber bi rêya «Korîdora El-Dimîne» vekişin berev aliyê rojhilatê rêya Dîmeşqê ku nav lê hat kirin *korîdora mirinê* ji ber hejmara mezin ya di dema derbaskirina wê korîdorê de dihatin kuştin, ji ber ku ew korîdor navbera du rêbendên leşkerî yên piştevankirî navbera çiyayan de, bû, ji encama wê yekê bi sedan şervan hatin kuştin û bi sedên din birîndar bûn. Di heman demê de, xelkê El-Qisêr rastî koçberkirina yekem ji bajarê xwe û koçberkirina duyem ji Qelemûna rojavayî, piştî kuştin û wêrankirin û êrîşên balafiran, hatin, beşê mezin neçar bûn careke din berev `Irsal û beşê din berev bakurê Sûriyê, derbider bibin.

Derbarê Koçberkirina bi neçarî ya xelkê El-Qisêr, di raporta Komîteya Vekolînê[78] ya Serbixwe ya taybet bi Karûbarên Komara Erebî ya Sûriyê de, sala 2013, weha hatiye:

> Di Adar û Nîsanê de, sivîline ku derbiderî navxwe bûne - piraniya wan ji parêzgeha Himsê bûn - hewl dan berê xwe bidin Dêr `Etiyê, ku bajarokekî bakurê parêzgeha Dîmeşqê ye, û dinavbera 19 û 23ê Nîsanê de Hukûmetê Dêr `Etiye bombebaran kir û peyameke fermanî gihand desthilatên bajêr ku divê bi neçarî derbiderên navxwe ji bajarok derxînin, û eger ew yek rû nede, bajarok dê rastî êrîşê were. Di dawiya Nîsanê de, serokê şaredariya Dêr `Etiye çar roj derfet dan derbideran ku derkevin, yan jî ewê parên wan yên nan bibire. Piştî wê yekê, derbiderine navxwe ji Dêr `Etiye derketin, piraniya wan ji bajarê Hims û El-Qisêr bûn.

Di raporta Neteweyên Yekgirtî de herweha hatiye:

> Bi rêya pêşkêşkirina belgeyên ku ji Çileyê ve hatine komkirin, Komîte gehiştiye wê baweriyê ku metirsiya tawanên ku Hêzên Hukûmetê û milîsên bi ser ve û komên çekdar yên dijberî Hukûmetê, encam dane, û berbelavbûna van tawanan, û berdewamiya pêkînana wan bi rêjene metirsîdar; raspardeya Komîteyê derbarê giringiya veghustinê bo dadgehê li ser herdu astên niştîmanî û navdewletî, bihêztir dike… û nabe rastiya bicîkirina aştiyeke domane bê dadweriyê, astem e, piştguh bike.

78 «» Raporta Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Vekolînê ya Serbixwe ya taybet bi Karûbarên Komara Erebî ya Sûriyê,« 18ê Tîrmeha 2013an, Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî, https://undocs.org/ar/A/HRC/23/58

Niha, navbera 2 heta 5 hezar kesî li bajarê El-Qisêr niştecê ne. Ewlekariya Leşkerî di Tîrmeha 2019an de, rê da bihtirî hezar kesî ku vegerin, ew yek jî piştî sistiya Hizbulah û milîsên xwecihî û redkirina wê li ser vegera bi kom ya niştecêyan, eger ew kesên dixwazin vegerin karmend bin jî, yan kesên bi «dilsoziya xwe ji Hukûmetê re têne naskirin» jî bin, û tevî ku Hesen Nesrulah Rêberê Hizbulahê li ser ragihandinê gelek caran derket û banga vegera xelkê bajêr dikir, tê.

## Rêkeftina herçar bajaran: Zebedanê, Medaya, Fû`a, Kefreya

**«Di milmilaniya li ser desthilatê di şerekî dirindaneyî yê bi wekalet navbera Dewletê û aliyên kara yên ne hukûmî de, Mirov li Sûriyê bûne keresete, danûstandin pê tê kirin, rastî bombebarankirinê tên, û rastî birçîbûnê heta mirinê tên».**

- Anabîl Botşer, Pirofesor di zanîngeha Berlîn a Azad de, di lêkolîna xwe ya şirovekarî de[79]: «Operasiyonên veguhestina niştecêyan li ser asteke berfireh li Sûriyê».

**Pêkîner:** Hêzên Artêşa Hukûmetê û Istixbarat, milîsine Şî`î yên Îranî û yên Îraqî, Hizbulaha Şî`î ya Lubnanî, Desteya Tehrîr El-Şam ya Sunî

**Alî û serpereştyarên Rêkeftinê:** Hêzên Hukûmeta Sûriyê, Îran, Qeter, û Desteya Tehrîr El-Şam

**Koçberkirî:** Sune, Şî`e

Rêkeftina herçar bajaran zelaltirîn û rastewxotirîn nîşanên pirojeya Îranî ji bo têkbirina demografîka Sûriyê bû. Rêkeftin nîşana lihevkirina aliyên Rêkeftinê li ser bicîkirina Endazyariyeke Demografîk ya tayîfî bû, pirojeya ji hilkirina niştecêyan û veguhestina wan; li ser bingeheke dabeşkirina tayîfî ya eşkere, bû, tê de zorîneya Sune rastî piroseyeke koçbarkirina bi neçarî hat, û li şûna wê, komine Şî`î biyanî serbarî Şî`eyên Sûrî, hatin bicih kirin, û kêmîneya Şî`î rastî koçberkirinê hat û li şûna wê, komine Sune hatin bicih kirin.

Rêkeftina herçar bajaran «Zebedanê - Medaya - Fû`a -Kefreya» ku li Dewhaya paytexta Qeterê navbera nûnerên Îran û Artêşa El-Fetih «Desteya Tehrîr El-Şam û Tevgera Ehrar El-Şam» serbarî girûpine din, hat imzekirin, di xala xwe ya sereke de behsa valakirina herdu bajarên Fû`a û Kefreya, beramberî derketina çekdar û malbatên xwe ji herdu bajarên Zebedanê û Medaya, dike, ew Rêkeftin dawiya pêvajoyeke danûstandinên ku ji Îlûna 2015an dest pê kirin, bû. Li gorî wê Rêkeftinê, di destpêkê de agirbest li herçar bajaran bicî dibe, û rê ji bo derbasbûna alîkariyên mirovî ji bo wan bajaran tê dan, Hukûmet û milîsa Hizbulah pabendî wê yekê nebûn, û Hêzên wan pirosene astengkirin û talankirina alîkariyan encam didan, di beramber de alîkariyên xwarinê û yên pizîşkî û çek jî bi berfirehî derbasî Fû`a û Kefreya bi rêya asmanî, dibûn.

Tevlîbûna Dewha dinava danûstandinan de û fişarên ku li ser Opozisyona çekdar dikirin, li gorî xwestekeke serkirdayetiya Îranî «Qasim Silêmanî» bû, ji bo hesankirina operasiyona azadkirina revandiyên Qeter yên sala 2015an li Îraqê[80], ku kesine nenas 26 hemwelatiyên Qeterê ji kampa Seyd ya li navçeyeke biyabana başûrê Îraqê, nêzîkî sînorê Siûdiyê, revandin,

---

79 Böttcher, A. «Large-scale forced population transfers in Syria: details of the recent «four towns agreement» May 2017, https://www.sdu.dk/-/media/files/om_sdu/centre/c_mellemoest/videncenter/artikler/2017/ab+article+may+17.pdf

80 The Guardian, 'Qatari Royal Family Members Used as Leverage in Syrian Population Swap', 14 April 2017. Accessed on 22/02/2020, at: http://bit.ly/3c0YAj4.

dinava wan de kesin ji malbata hukumdar jî hebûn, piştre hat xuyakirin ku milîsa «Ebulfesil El-`Ebasî» ya bi ser Îranê ve, ew kes revandibûn, û hevdemî nekarîna yekcarî ya Hukûmeta Îraqê, tevî hebûna yasayî ya revandiyan li ser xaka wê; Qeterê berê xwe da Îranê, Îranê soz da ku fişarê bixe ser wê milîsa bi ser ve ji bo radestkirina revandiyan beramberî fidyeyeke darayî ku Hukûmeta Qeterê wê yekê red dike, û beramberî xistina fişarê li ser Opozisyona Sûriyê ji bo bicîkirina valakirina niştecêyên Fû`a û Kefreya.

Rêkeftin berfireh bû û gelek bajar û bajarok li xwe girtin: Medaya, Zebedanê, û Kefreya û Fû`a û dewrûberên wê, serbarî «Teftenaz û Ti`ûm û Mezari` Biroma û Zerdena û Şelix û Me`eret Misrîn û Ram Hemdan û herdu bajarên Biniş û Idlib», herweha bajarokên «Yelda û Bîbla û Bêt Sehim» li başûrê Dîmeşqê, bi mercê ku hemî niştecêyên Kefreya û Fû`a di dema herî zêde 60 roj li ser du qonaxan werin derxistin, ku ji 4ê Nîsana 2017an dest pê dike, beramberî derxistina şervanên Zebedanê û malbatên wan ji Medaya û Zebedanê û navçeyên dewrûberên wan berev bakurê Sûriyê,  li gorî Rêkeftinê gerek di qonaxa duyem de 1500 girtî ji zîndanên Hukûmetê serbest werin berdan, û kar ji bo dosyaya dîlgirtiyan were kirin, ku herdu alî dê lîstine hevbeş bi hejmar û navên dîlgirtiyan bêşkêş bikin, û şervanên «Desteya Tehrîr El-Şam» jî ji kampa Yermûk ya li başûrê Dîmeşqê dê werin derxistin.

Rêkeftina ku ji ber pêwîstiya mirovî ya ji encama rewşên dorpêçkirin û birçîkirina ku li ser xelkê Wadî Berede, hat bicîkirin, hat qebûlkirin. Ji aliyê praktîkî û strtejîkî ve bi tevahî di berjewendiya Hukûmetê û Pirojeya Îranî li navçeyê de bû:

- Niştecêyên Fû`a û Kefreya ku hejmara wan herî kêm 30 hezar kes in, piraniya nêrên wê yên gihayî şervan in û li ser bikaranîna çek rahênankirî ne, û di gelek şerûpevçûnan de, li teniştHukûmeta Sûriyê bejdar bûn. Pejiriandina koçberkirina xelkê wan herdu bajaran, hat wateya zêdekirina Hêzên Hukûmetê bi hezaran şervanên rahênankirî, nexasim di wê demê de Hêzên Hukûmetê rastî kêmasiyê ji aliyê mirovî yê rahênankirî û karîna şerûpevçûnan, dihat.

Fû`a û Kefreya hevsengiyeke stratejîk di berjewendiya Opozisyonê de, ava kir, û parastineke beşekî dan bajar û bajarokan li parêzgeha Idlibê, ew yek bi sedema dilsoziya yekcarî ya xelkê herdu bajaran ji Îranê re, û rijdbûna Îranê li ser parastina wan, bû. Piştî bicîkirina Rêkeftinê bi dawî bû, kaxeza herdu bajaran ji destê Opozisyonê hat kişandin, û êdî bajarên Opozisyonê ketin jêr rehma balafirên Artêşa Rûsî.

Ji ber sedemine girêdayî biryarê li Tehranê, niştecêyên Fû`a  Kefreya li Wadî Berede nehatin bicîkirin, koçberkiriyên herdu bajaran li ser navendên vehewandinê li Hims û Laziqiyê, hatin dabeşkirin, niştecêyên ku mabûn, li benda Rêkeftina sala 2018an ya valakirina bi tevahî, man, piştre bo navenda vehewandinê li Cibrîn ya li rojavayê Helebê hatin veguhestin, piştre bi demeke kurt, heta ku di xaniyên koçberkiriyên taxên El-Salihîn û El-Miyeser û El-Meşhed û El-Sikerî û El-Firdews de, werin bicîkirin, ji bo Helebê hatin veguhestin, û alîkariyên madî ji aliyê komeleyên xêrxwazî yên Îranî «Komelgeha Mîhad» û «Komelgeha El-Seqleyn» û « Navenda El-Bisêra « li ser wan hatin belavkirin. Ji bo vehewandina koçberkiriyên Fû`a û Kefeya, di havîna sala 2019an de, Milîsên «Lîwaa El-Baqir» û «Feyleqa El-Mudafi`în en Heleb» bi piştevaniyeke rastewxo ji «Desteya Dubareavakirinê ya Îranî», 50 mal ji eslê 300 malî li taxa El-Mercê ku hatine nûjenkirin, radest kirin.

Heleba rojhilat li jêr kontirola milîsên «Lîwaa El-Baqir» û «Feyleqa El-Mudafi`în en Heleb» de ye ku serpereştya operasiyona radestkirina malan kir. Ji dema şikandina Opozisyonê sala 2016an ve, ti hebûneke mezin ya Hukûmeta Sûriyê li navçeyê tuneye, di operasiyona radestkirina malan de, Hukûmet tenê weke temaşevanekî bû. Alavine ragihandinê yên alîgir, nûçe bi vî rengî belav kir: «Xelkê taxa El-Mercê ya Helebê 300 şuqe diyarî xelkê Kefreya û Fû`a kirin, û Komara Islamî ya Îranî alîkarîne bingehîn pêşkêşî malbatên derbider kirin, dinav de jî pêdiviyên niştecêbûnê û nûjenkirina xaniyan».

# Medaya û Zebedanê

Navçeya Zebedanê ji aliyê rêveberî ve bi ser parêzgeha Gundewarên Dîmeşqê ve ye, nêzîkî sînorê Lubanî-Sûrî ye. Zebedanê navenda navçeyê ye, 45km dûrî Dîmeşqa paytext e. Giringiyeke stratejîk û leşkerî mezin ya navçeya Zebedanê û gund û bajarokên bi ser ve, bi taybet herdu nahiyeyên Medaya û Serxaya, heye, ji ber ku li ser sînorê Lubnanî-Sûrî ye, û xala girêdana Sûriye û Lûbnanê ji aliyê bazirganî û aborî ve ye, herweha ji ber cihê wê yê li ser rêya navdewletî ya navbera Dîmeşq û Beyrûtê jî, wê yekê hişt ku Hukûmeta Sûriyê û Hizbulaha Lubnanî kontirola xwe li ser van navçeyan bihêlin û ji dest nedin.

Ji sala 2015an ve, hebûna leşkerî ya Hizbulah li navçeya Zebedanê, zêde bû. Beriya wê yekê, Hêzên Hukûmetê û milîsên Berevaniya Niştîmanî bi erkê hilmetên leşkerî yên corbicor û ferizkirina dorpêçê radibûn. Weke bersiv li ser dorpêçkirina Kefreya û Fû`a di Adara 2015an de ji aliyê «Desteya Tehrîr El-Şam» û «Tevgera Ehrar El-Şam» ve, Hêzên Hukûmetê û milîsên hevpeymanên wê di Tîrmeha 2015an de dest bi dorpêçkirina Medaya û Zebedanê kirin.

Amir Burhan, jidayikbûyê Zebedanê sala 1963an e, û berê Rêveberê Desteya Pizîşkî li Zebedanê, û endamê Encûmena Xwecihî û endamê Komîteya Danûstandinên bi Desthilatê re, bû, got:

> Sala 2012an, Zebedanê ji kontirola Hukûmeta Sûriyê, derket, Hukûmetê bi komkirina Hêzên Nuxbe û bi hilmeteke leşkerî û topbaraneke dijwar ji bo derbasbûna bajêr, bersiv da, ji ber wê yekê pêla yekem di Şoreşê de ya derbideriyê, rûda, piştre Artêş vekişiya û li dewrûberên Zebedanê bicih bû, topbarankirina ku bajêr hemahema vala kir, berdewam kir. Di naverasta 2013an de, Hukûmetê dest bi bikaranîna bermîlên teqîner ji bo wêrankirinê û ji bo koçberkirina niştecêyên mane, kir, ku ti sûdeke leşkerî ya bermîlên teqîner ku hejmara wan beriya hilmeta Zebedanê di Tîrmeha sala 2015an de, gehişt 4800 bermîlî, tunebû.

Amir Burhan serbar dike:

> Di destpêka sala 2015an de, Hizbulahê hewla timamkirina kontirolkirina xwe li ser sînor da, amadebaşî ji bo hilmetekê bi bejdariya Artêşa Sûriyê li ser Zebedanê, xuyayî bûn, hevdemî kontirolkirina tevahiya Idlibê ji aliyê Artêşa El-Fetih ve, ji bilî herdu gundên «Kefreya û Fû`a» ku çarenivîsa wan piştre dê bi çarenivîsa Zebedanê ve, were girêdan. Di 3ê Tîrmeha 2015an de hilmeta Artêşê li ser Zebedanê bi serkêşiya Hizbulahê, dest pê kir, dorpêçkirina Medaya ya ku li jêr kontirola Ehrar El-Şam bû, hat tundkirin, Zebedanê bi tevahî dorpêçkirî bû, û ketina wê, xuyayî bû, lê Ehrar El-Şam di şerûpevçûnan û gihandina ziyanê bo Hizbulah û Artêşê de, berdewam kir.

Ji bo xistina fişarê li ser şervanan, Hizbulahê bersiv bi rêya koçberkirina kesûkarên wan bi neçarî ji navçeyên derbideriyê weke Bilûdan û Inşa`at û El-Me`mûre ku li jêr kontirola Hukûmeta Sûriyê ne, û vegerandina wan bo Medayayê, da. Bi fermana Hizbulahê, Artêş derbasî malan ji bo girtina malbatan û ihanekirina wan û destdirêjî li ser hekesê ku red dike, dibû, herweha malbat bi otombîlên taybet bi veguhestina serbazan vediguhestin Medayayê. Dema ketina bajêr nêzîk bû, Tevgera Ehrar El-Şam ferman da Artêşa El-Fetih ku ji bo rawestandina derbasbûna Artêşê, destwerdanê bike, wê demê Artêşa El-Fetih heta ku Hizbulah neçar bike êrîşê li ser Zebedanê rawestîne, xwe ji bo derbasbûna gundên Şî`î li Idlibê amade kir. Piştî şerûpevçûn û danûstandinine ku 88 rojan dirêj kirin, her du alî «Artêşa El-Fetih û Hizbulah» bi serpereştiyeke Qeterî Îranî bi rêya navbênkariya Turkiye, gehiştin rêkeftinekê,

ku ji van xalan pêk tê:

- Rawestandina operasiyonên leşkerî li ser Zebedanê û Medaya û Kefreya û Fû`ayê.
- Derbaskirina alîkariyên mirovî bo herçar bajaran.
- Derxistina birîndaran ji navçeyên dorpêçkirî ji bo dermankirinê.
- Derketina herkesê dixwaze ji Zebedanê û Medaya berev Idlibê, derkeve, û ji Kefreya û Fû`a berev navçeyên kontirola Hukûmetê.

Bi mercê ku xalên Rêkeftinê di dema sê hefteyan de bicî bibin, lê heta du salan sistî di bicîkirinê de dihat kirin, di wê demê de birçîbûnek li Medeaya û Zebedanê encam da.

Amir serbar dike:

> Birçîbûn bû sedema mirina bihtirî heftê kesî. Piştî imzekirina Rêkeftinê, alîkariyên xwarinê bo herçar bajaran hatin derbaskirin, wate piştî 3 mehan ji dorpêçê. Alîkarî tenê dexlûdan bûn, keskatî û goşt û nan jî li Zebedanê û Medayayê neman. Xelkê ji bo ardûyê xwarinê û ji bo gerimkirinê, dar dibirîn, di demê ku pêwîst bû ku kesên dixwestin derkevin, piştî derbasbûna alkariyan bi sê hefeteyan, derkevin. Bicîkirina Rêkeftinê ji kar ket û dorpêçkirin berdewam bû, û alîkariyên xwarinê dest bi nemanê bûn, û birçîbûneke dijwar, dest pê kir. Hin kesan se û pisîk ji bo xwarina zarokên xwe, serjê kirin, çînên herî lawaz di civakê de, dest bi têkçûnê bûn, û mirin serdestî bajarokê Medayayê bû, û kesê hewla revê dida, rastî girtinê ji aliyê rêbendên leşkerî û rastî mayînên çandî li dewrûberên bajarokî, dihat.

Emanî Ednan Burhan, û hejmarek şahidhalên din, ji wan Semîre Ebduletîf Re`ed, dibêjin:

> Komîteyên gelêrî li Medaya li gel endamine Hizbulah û kesine ji Zebedanê ku em wan nas dikin weke Ibrahîm El-Eyûbî (Xwebexş e di ewlekariya Leşkerî de) û Ebdulah El-Tel (xwebexş e di komîteyên leşkerî yên bi ser Hukûmetê ve), dest bi neçarkirina malbatan li ser koçberkirinê ji Zebedanê kirin, li taxa El-Me`asir nêzîkî daristanên Bilûdan, malbat neçar dikirin ku ji xaniyên xwe tenê bi çenteyekî biçûk derkevin, û ew bi siwarbûna otombîlên taybet bi veguhestina serbazan, û gihandina wan bo Medayayê, neçar dikirin. Di van derbasbûnên leşkerî de, bi dehan malbat, hin ji wan malbatên kesûkarên min û malbatên hevalên min jî bûn, hatin veguhestin, ew yek bi serê niştecêyên Zebedanê jî hat ku derbiderî Dîmasê bûn. Li taxên nêzîkî bajêr, di yek mehê de piraniya malbatên bi dijberiya Hukûmeta Sûriyê, dihatin naskirin, hatin koçberkirin, û hemî ji bo bajarokê Medaya hatin birin. Hukûmetê hin alîgir û malbatên serbaz û kesên ku tevlî Berevaniya Niştîmanî ya hevpeymanê Hukûmeta Sûriyê, bûne, hiştin.

Rêkeftinê bi zelalî behsa derketina hemî niştecêyên herdu bajarên Medaya û Zebedanê, nekir, tenê behsa derketina çekdar û malbatên wan û herkesekî sivîl yan ne sivîl ku dixwaze ji bo serastkirina rewşa xwe li gel Hukûmeta Sûriyê, derkeve, kir. Lê, nepabendiya Hêzên Hukûmetê bi xalên din weke derbaskirina alîkariyên mirovî û rêpêdan ji bo gihandina birîndaran, fişareke bihtir li ser kesên biryara manê dane, dixist. Serbarî operasiyonine girtin û armanckirina sivîlan ji aliyê nîşanbazan ve di dema bicîkirina xalên Rêkeftinê de.

Meysûn di şehadeta xwe de ji bo Navendê, weha got:

> Piştî derketina çekdaran ji navçeyê, Hukûmetê ji kesên mane -yan kesên piştî bidawîbûna karên leşkerî vegeriyane, belgeyên mulkiyetê yên resen yên xanî û mulkan, xwestin, tevî ku Hukûmet berê dizane ku niştecêyên navçeyê ev xanûber wke mîrat ji bavûkalên xwe birine, û kêmcaran belgeyên mulkiyetê yên kesên niha niştecê ne, peyda dibin.

Ji ber kiryarên leşkerî û Rêkeftina çar bajaran, Hukûmetê piştî koçberkirina bi neçarî, bi rêya bikaranîna behaneyên yasayî heta ku kesên mane yan derbiderên bi wêrekî vegeriyane navçeyên nêzîk, neçar bike, bi yekcarî derkevin; berê xwe da tektîkeke zêde.

Di Adara 2017an de, aliyên milmilaniyê li ser rahiştina dorpêçê, û derxistina tevahî ya şervan û sivîlan ji Kefreya û Fû`a, herweha derxistina şervanan ji Medaya û Zebedanê, û kampa Yermûk ya Filestînî, rêkeft in. Hukûmeta Sûriyê û Hêzên hevpeymanên wê, dorpêç li ser Medaya û Zebedanê piştî derxistina şervan û sivîlan, di Nîsana 2017an de, bi dawî kir. Lê, piştî mehekê, derxistina şervanan ji Yermûkê asteng bû. Di wê demê de, tenê 8 hezar kes ji eslê 16 hezar kesên sivîl û şervanî ji Kefreya û Fû`a, hatibûn derxistin. Operasiyona derxistinê rawesta û «Desteya Tehrîr El-Şam» û «Tevgera Ehrar El-Şam ya Islamî» dorpêçkirina herdu bajarokan, berdewam kirin. Beriya vê Rêkeftinê, aliyên milmilaniyê bi rêya danûstandinan gehiştibûn rêkeftinine din ji bo agirbestê, lê bê encam bûn.

Di şehadeta Husam de hatiye: «Operasiyona koçberkirinê li navçeya Zebedanê di 20ê Nîsana 2016an de, dest pê kir, derdora 400 kesî dinava wan de birîndar û nexweş li gel malbatên xwe, berev bakurê Sûriyê hatin derxistin, piştre di 14ê Nîsanê de bi derxistina derdora 2400 kesî ji herdu bajarokên Medaya û Biqîn berev bakurê Sûriyê, berdewam kir, û bi derxistina derdora 600 kesî di 21ê Nîsana 2017an, bi dawî bû».

# Xuyatirîn operasiyonên koçberkirina bi neçarî yên ku Rêveberiya Xweser ya Demokratîk encam dane

Hevdemî xwepêşandanên gelêrî li Sûriyê, bandora Kurdan li navçeyên xwe serî hilda. Hukûmeta Sûriyê piranya Hêzên ewlekariyê ji navçeya Cizîrê sala 2012an, kişandin, û bi nihênî desthilata xwecihî radestî Partiya Yekîtiya Demokrat PYD û baskê wê yê leşkerî kir. Wê Partiyê gelek kiryarên Hukûmetê dubare kirin, û tekezî li ser tundkirina destê xwe yê ewlekariyê bi rêya şopandina rêbazeke ku giringiyê dide ewlekariyê, dike, wate asoyên hukumraniyeke kara li navçeyê dorpêç dike[81].

Di 13ê Tebaxa 2013an, PYD bidawîbûna qonaxa yekem ya pirojeya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ragihand. Bi dirêjahiya van salan, peymana ne fermî yan lihevtêgihiştina nihênî navbera Hukûmeta Dîmeşqê û PYDê, herêm dûrî bombebarankirina asmanî kir, û cêgîriyek peyda kir, ev rewş heta piştî destpkirina milmilaniyeke leşkerî li gel DA`IŞê sala 2014 li wê herêmê, berdewam bû.

Rêveberiya Emerîkî piştevanê herî diyar yê Hêzên Rêveberiya Xweser bû, bê ku piştevaniya

81 Xidir Xedûr, »Çawa karên ewlekarî yên herêmî, astengiyan li pêş Hukumraniyê li bakurê rojhilatê Sûriyê durist dikin,« 23ê Adara 2017an, Navenda Malkom Kêr - Karnîgî ya Rojhilata Navîn, https://carnegie-mec.org/2017/03/23/ar-pub-68399

girûpên din yên Opozisyonê bike, bi behaneya derbasbûna rêxistinine tundirew dinava hemî pêkhateyên leşkerî yên Opozisyonê de, û bi behaneya ku ezmûnê piştrast kir ku tenê Kurd dikarin DA`IŞê bişkînin û rêveberiya navçeyan bikin û ewlekariyê feriz bikin, beramberî bêserûberî û rikberiya ku gehişt asta şerûpevçûnan navbera girûpên Opozisyonê de. Hin nerînan gotin ku tişta ku Emerîka pêk tîne; bicîkirina siyaseta «Demokratîka esnî» ye ku Lênîn li dijî musilmanên Asyaya naverast bicî kir, ango bihêzkirina neteweyan ji bo cudakirina wan ji nasnameya wan ya olî ya komkar. Emerîka bi piştevaniya Kurdan û ciyawazkirina wan ji dewrûberên wan, gerentiya mana dilsoziya kurdan ya neteweyî li ser hisabê nasnameya wan ya olî, dike.

Sala 2015an, YPG bi piştevaniya Hevpeymaniya Navdewletî ya bi serkirdayetiya Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê, karî DA`IŞê ji navçeyên xwe derxîne. Ew yek alîkar bû ji bo berfirehkirina pirojeya keyana Kurdî. Armanc zêde bûn heta gehişt asta ragihandina Rêveberiyekê bi fermî di Îlûna 2018an de. Rêveberiya Xweser weke hemî aliyên milmilaniyê siyaseta dîfakto ji bo bikaranîna wê dîfaktoyê piştre di danûstandinan de, bi kar tîne, di serî de jî guhertin di pêkhateya niştecêbûnê de û praktîkên koçberkirin û niştecêkirinê.

Rêxistinine navdewletî koçberkirina bi neçarî ya ku Hêzên Rêveberiya Xweser encam dane, belge kirine, ji wan Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî di raporta xwe de[82]: «Me ti cihekî din nebû ku em biçinê: Derbideriya bi neçarî û operasiyonên herifandina xaniyan li bakurê Sûriyê « ku behsa pêleke operasiyonên koçberkirina bi neçarî û herifandina xaniyan weke tawanine cengî, ku ji aliyê Rvebereya Xweser bi serkirdayetiya «Partiya Yekîtiya Demokrat» ku navçeyê kontirol dike, hatine encamdan, dike.

# Koçberkirin li gundewarên Reqayê - Girê Sipî, Ên Îsa, û Silûk

Bajarê Girê Sipî ji aliyê rêveberî ve bi ser parêzgeha Reqayê ve ye, 100km ji aliyê bakurî ve dûrî bajarê Reqayê ye, navenda bazirganî ya gundewarên wê ye. Li gorî amara 2010an, hejmara nişecêyên bajêr û wê 300 hezar kes bû, ji wan 30 hezar kurd in. ji aliyê wê yê bakur ve bajarê Aqçe Qele yê Turkiyê ye ku beşê bakur yê Girê Sipî bû dema ku yek bajar bû, hêla Tirênê di serdema Rêkeftinên sazkirina sînor di salên çilî yên sedsala bûrî de, ew dabeşî du beşan kir, li Aqçe Qele kampa Silêman Şah ya penaberên Sûriyê heye, ku mezintirîn kampên Turkiyê ye.

Cihê wê yê stratejîk li ser sînorê Sûriye-Turkiye û li ser yek ji çavkaniyên çemê Belîx «Ên El-`Erûs» hişt ku rastî gelek kontirolan ji aliyê Hêzên serdert were, Artêşa Azad ya Sûriyê di naverasta sala 2012an de, piştre DA`IŞ sala 2014an de, piştre Yekîneyên Parastina Gel, DA`IŞ derxist û kontirola xwe di naverasta sala 2015an li ser ragihand, û bû xaleke sereke ya bicihbûna YPG. Hin nerîn dibêjin ku Rêveberiya Xweser pabendî parastina xelkê bû û encûmeneke sivîl li bajêr ava kir, ku rêveberiya navçeyê dike û nûneratiya dadwerane ya pêkhateyên bajêr dike, ji 15 kesan pêk tê, 10 ji war Ereb in, sê Kurd, û yek Ermenî û Yek Turkumanî, lê hin nerînên din dibînin ku Rêveberiya Xweser hewl da nasnameya navçeyê bi rêya guhertina navê wê yê Erebî bo Kurdî, biguhere, bê ku hewlên wê serbikevin, ew yek jî bi rêya zorîneya Erebî û kêmîneyeke Ermenî û kêmîneyeke Kurdî ya li gundên Yabise û Bexdîk û Til Exder û Sûsik, û heft gundên Turkumanî, weke El-Dadat û Hemam El-Turkuman.

82 » Sûriye:Me ti cihekî din nebû ku em biçinê: Derbideriya bi neçarî û operasiyonên herifandina xaniyan li bakurê Sûriyê,« 15ê Cotmeha 2015an, Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî, https://www.amnesty.org/en/documents/mde24/2503/2015/ar/

Sala 2019an, Girê Sipî yek ji armancên operasiyona Turkiyê ya li bakurê rojhilatê Sûriyê bû, operasiyona ku Serokê Turkiyê bi navê «Kaniya Aştiyê» li dijî şervanên YPG yên ku Enqere wan weke gefekê li ser xwe, dibîne, ragihand. Piştî çend rojan ji şerûpevçûnên dijwar navbera Hêzên Sûriyaya Demokratîk û Artêşa Niştîmanî ya Sûrî ya piştevankirirî ji Turkiyê, bajarê Girê Sipî yê gundewarên Reqayê ket jêr kontirola Opozisyona Sûriyê û dagîrkeriya Turkî de.

Di şehadeta xwe ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirinan de, Wa`il got:

> Sala 2015an, serdema kontirola DA`IŞ, û Partiya Islamî ya Turkistanî, hejmara niştecêyên Girê Sipî 250 hezar kes bû, ku li ser bajêr û bihtirî 600 gundên Erebî û derdora 43 gundên Kurdî, dihatin dabeşkirin, piştî YPG derbas bû, astengî ji Ereban re durist dikirin, weke ku hemî aliyên şerker yên armanca sivîlan dikirin û hewla koçberkirina wan didan. DA`IŞ hewla dubarekontirolkirina bajêr da, û dest bi topbarankirineke dijwar ji derveyê bajêr kir, di wê demê de, YPG ji bo dûrxistin ji topbarankirinê, rê li ber derketina Kurdan xweş kir, û derketina Ereban qedexe kir. Partiya «Kurdistanî» herweha leşkeriya neçarî li ser Ereban feriz kir, û her kesê ku bi a wê nedikir, dihat terorkirin.

> Di Remezana sala 2015an de, 60% ji Ereban ji ber bombebarana dijwar di dema êrîşên dawiyê yên ji bo derkirina DA`IŞê, derbider bûn, ew bombebarankirin gehişt gundine Ereban ku ti hebûneke DA`IŞê lê nebû, xelkê wan gundan neçar bûn derbider bibin, dema YPG derbas bû, malûmulkên wan talan kirin, derbideran berê xwe dane Reqayê ku li jêr destê DA`IŞê bû, gelek ji wan derbideran hatin kuştin yan girtin, yan berê xwe dane sînorê Turkiyê ku derbasbûna sînor ji bo derbideran, hesan bû.

Peyamnêrê Navenda Belgekirina Binpêkirinan li Sûriyê di raporta xwe derbarê bûyerên wê demê yên li parêzgeha Reqayê rûdidan, de got:

> Ji ber gotegotên ku DA`IŞê belav dikirin û digot ku YPGê dê komkujîne mezin li dijî niştecêyan pêk bîne, hin gund bi tevahî ji navçeyê derbider bûn, li gundê Zehle yê nêzîkî gundê Şerî`an û gundê Xirbet El-Riz, tenê 180 kes ku hemî jin û zarok bûn, man. Niştecêyên gelek gundên derbiderkirî ji bo vegera gundên xwe hatin qedexekirin, dinav de jî niştecêyên bajarokê Silûk û gundên wê, û niştecêyên gund û bajarokên Ebdî Koyî û El-Sewre û Ebû Xerze, û hin gundên din ên rojavayê navçeya Girê Sipî. Hêzên hevbeş yên bi serkirdayetiya YPG ji niştecêyên gundê El-Doxaniye ku ji derdora 100 malî pêk tê, bi behaneya ku endamên DA`IŞ nêzîkî gund bûne, xwestin ku ji gund derkevin.

Şerûpevçûnên ku navbera «Odeya operasiyonên Volkana Fratê» ji aliyekî, û DA`IŞ ji aliyekî din ve, rûdidan, serbarî êrîşên Hevpeymaniya Navdewletî ku beriya derbasbûna wan hêzan dihatin encamdan, sedema sereke ya derbideriya rêjeya herî mezin ya niştecêyên rojhilatî û navçeya Silûk û bajarê Girê Sipî, bû. Bi hezaran Ereb beriya gehiştina wan hêzan, ji navçe û gundên xwe derbider bûn, hejmara wan bihtirî 23 hezar kesî bû.

Roleke sereke ya hilmetên ragihandinê yên beriya şerûpevçûnan dihatin kirin, di zêdebûna hejmara derbideran de hebû, weke hilmetên ku ji aliyê kesine bi ser YPGê ve dihatin kirin ku «lîsteyên daxwazkiyên» ji aliyê wan hêzan ve, belav dikirin û gef li niştecêyên gundine destnîşankirî dixwarin, û / yan ji ber hilmetên ku DA`IŞê encam didan ku hişdariya niştecêyan derbarê Hêzên ku dê werin, didan.

Li gorî şehadetên ku gehiştine Navenda Belgekirina Binpêkirinan, YPG bi neçarî niştecêyên gelek bajar û gundan, bi taybet di destpêka Tîrmeha sala 2015an de, bi neçarî koçber kirne.

Dema YPG bajarokê Silûk û gundên derdorê kontirol kirin, niştecê koçber kirin û malên wan herifandin û ji niştecêyên gundê Esîlim ku 35km ji aliyê başûrî ve dûrî Silûkê ye, xwestin ku ji gund derkevin, û ji wan re gotin ku ew dikarin piştî sê rojan vegerin gundê xwe, dema niştecê vegeriyan, dîtin ku 100 xanî ji eslê 103 xaniyên gund hatine herifandin.

Li gundê Hemam El-Turkuman yê nêzîkî Silûkê, YPG niştecêyên gund di dibistanekê de kom kirin û ji wan xwest ku ji gund derkevin. Herweha endamên YPG bi cilûbergên xwe yên fermî li gundên El-Mexat û El-Xibên ji niştecêyan xwestin ku ji gundên xwe derkevin, bi behaneya ku ew alîkariya DA`IŞê dikin, û gef li wan xwarin ku dê ji Hevpeymaniya Navdewletî re bibêjin ku şervanên DA`IŞ dinava gundên wan de hene, heta ew gund ji aliyê balafiran ve werin bombebarankirin.

YPG operasiyonên koçberkirinê red dike, û DA`IŞê berpirs dibîne, koçberkirin ne bi şêweyekî bi kom bû, tenê kesûkarên endamên DA`IŞ yên ku peywendiya wan bi DA`IŞê re hebû, dihatin koçberkirin, wate dihatin dûrxistin.

## Xuyatirîn operasiyonên koçberkirinê yên ku dagîrkeriya Trukî û komên alîgirên wê encam dane

Roja 29ê Cotmeha 2019an, Turkiyê destpêkirina operasiyona «Kaniya Aştiyê» ya leşkerî bi operasiyonên balafirên şerker yên Turkiyê li ser bajar û bajarokên sînorî li herdu navçeyên Girê Sipî li parêzgeha Reqa û Serê Kaniyê li parêzgeha Hisiçayê ku li jêr kontirola Hêzên Sûriyaya Demokratîk de bûn, ragihand. Hin girûpên Opozisyona Sûriyê di operasiyonê de bejdar bûn, weke berdewamî ji «Mertala Fratê» ku armanca wê derxistina çekdarên DA`IŞ ji Cerablus heta Bab û I`izazê bû, û «Çiqla Zeytûnê» ku armana wê Efrîn di destpêka sala 2018an de ji bo rûbirûbûna pirojeya ku Turkiyê nav lê dike Pirojeyeke Cudaxwaziyê bi serkêşiya Hêzên Sûriyaya Demokratîk li bakur bû, ku bi du Rêkeftinan li gel Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîka û Rûsiyayê, bi dawî bû, li gorî wan Rêkeftinan Turkiyê operasiyona xwe rawestand, rêxistinine mafperwerî yên navdewletî Turkiye û girûpên Sûrî yên alîgirên wê bi kiryarine ku dibe ku weke tawanine cengî werin hejmartin, serbarî koçberkirina bi neçarî, tometbar kirin, ji encama wê yekê pêla derbideriyê ku ji destpêka milmilaniyê ve ya herî mezin e, rûda, bi taybet ku mertisya li navçeyên ku derbideran berê xwe piştî jidestdana mal û bajarokên xwe, danê, heye, bi xwe, ji metirsiya navçeyên ku jê hatine, ne kêmtir e.

Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî di raporta xwe ya sala 2019an de: «Sûriye: belgene dijwar li ser tawanên cengê û binpêkirinên ku Hêzên Turkiyê û girûpên çekdar yên hevpeymanên wê, encam dane», got:

> Di êrîşa li ser bakurê rojhilatê Sûriyê de, Hêzên Turkiyê û hevpeymaniya girûpên çekdar yên Sûrî yên piştevankirî ji Turkiyê, sivkatiyeke erzan bi jiyana sivîlan nîşan dan, binpêkirinine dijwar û tawanine cengî encam dan, dinav de jî kuştina bi niyaz, û êrîşên ne yasayî ku sivîl kuştin û birîndar kirin.

## Koçberkirna bi neçarî li Efrînê

Efrîn ku 6 nahiye bi ser ve ne: Şeran, Şiyê, Cindirês, Raco, Bilbilê, û Mabeta, 360 gund û baxçeyî li xwe digire, sala 2015an hejmara niştecêyên wê 350 hezar kes bû, piraniya wan kurd in, serbarî hejmarek ji derbiderên parêzgeha Heleb û navçeyên din ên Sûriyê, di 19ê Hizêrana 2012an de ket jêr kontirola Yekîneyên Parastina Gel. Tevî ku beriya kontirola YPG, civaka xwecihî pêşwaziya derbideran dikir, lê piştî kontirolê, YPG siyasetên rêgirtin li ber derbideriya navxwe şopandin û weke merc ji bo derbasbûna Efrînê, hebûna girêbesteke kevin ya kirêdariyê yan peydakirina kefîlekî, feriz kir. Piştî operasiyona «Çiqla Zeytûnê» ya leşkerî ya Turkî di Adara 2018an de, piraniya niştecêyên Kurd derbider bûn, 5 hezar kes koçberî derveyê Sûriyê bûn û 145 hezar kes derbiderî navxwe bû, ji wan 60 hezar kes li kampên Şehba «Berxwedan, û Serdem, Efrîn, û Şehba» li bakurê Helebê, dimînin.

Turkiye koçberkirina niştecêyên Xûtaya Rojhilat di Nîsana 2018an de, û koçberkiriyên ji gundewarên Himsê di Gulana 2018an de, ji bo niştecêkirina wan li navçeya Efrînê, bi kar anîn. Li gorî amarên Encûmena Xwecihî ya Efrînê di naverasta 2019an de hejmara koçberkiriyan gehişt 88.000 kesî, 51% ji wan, ji koçberkiriyên Xûtayê ne, derdora 20% ji koçberkiriyên parêzgeha Helebê ne, û serbarî 2600 malbatî ku ji ber şerûpevçûnên gundewarên Hemayê reviyane, û 600 malbatên Turkumanî, û 600 malbat ji kampa «El-Bil» ya li rojavayê I`zazê, serbarî malbatên şervanên girûpa Sultan Murad ya «Mertala Fratê». Weke pêngavekê ji bo niştecêkirina koçberkiryan bi şêweyekî hetahetayî li Efrînê, Turkiyê di 17ê Gulana 2019an de Desteya Koçberkiryan ku belgeyên isbatkirin û niştecêbûnê ji bo parastina qeydên resen derdixistin, hilweşand, û ew neçar kirin ku nasnameyan ji Encûmena Efrînê bi dest bixin.

Şêrîn Efrîn navê ku şahidhalê li xwe kiriye, ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirinan, got:

> Ji pênc salan ve, Efrîn li jêr dorpêçeke dijwar ji aliyê girûpên çekdar ve ye, kereste bi qaçaxiya ku bazirganên şer dikirin û bi pir buha derbasî Efrînê dibûn. Heta ku Artêşa Turkiye û girûpên çekdar yên Opozisyonê 20ê Çileya 2018an dest bi êrîşê li ser bajarê Efrînê kir, ku bihtirî 70 heazr sivîl serbarî derbiderên ji bajarên din ên Sûriyê, lê niştecê bûn, roja 27ê heman mehê, Turkiye malên sivîlan yên gundê me bombebaran kirin, em neçar bûn xwe di şkefteke jêrzemînî de veşêrin, em derdora 60 kesî bûn, dinav wan de zarok û jin û kesên bi temen jî hebûn, bêguman, ev şkeft ji bo niştecêbûnê, ne amade bûn.

Renda Muhemed ku ji gundê Kumreşe yê sînorî ye, ji niştecêyên bajarê Efrînê ye, behsa rewşa karesat ya di destpêka êrîşa Turkiyê de, û kiryarên tolhildanî dike, û neçar bû berev bajêr bireve.

Salim Erfan ji Cindirêsê ye, di şehadeta xwe de, got:

> Hevdemî destpêkirina êrîşê li ser navenda Cindirêsê, cîranine me di êrîşa ku Hêzên Mertala Fratê yên alîgirên Turkiyê, tê de bejdar bûn, jiyana xwe ji dest dan, wan hêzan jî bi topên giran û bi mûşekan bombebaran dikirin, bi nêzîkbûna Hêzên êrîşker, niştecê rastî tirseke mezin hatin, derbideriyeke mezin berev Efrînê rûda. Tevî ku Hêzên Sûryaya Demokratîk rê li ber derketina me digirt, lê mana me weke mertalên mirovî, astem bû, em berev çolên bakurê rojhilatê Helebê derketin. Piştre min zanî ku mala min hatiye desteserkirin, û hejmarek mulkên me hatine şewitandin, û kesê ku di mala min de bicî bû, ji min xwest ku ez venegerim ji ber ku navê min di lîsteyên girûpan de heye, ji ber ku ez mamosteyê zimanê Kurdî li navçeyê bûm.

Şêrîn behsa rojên dawî yên operasiyonê dike:

> Hevdemî pêşveçûna Hêzên Turkî û yên Artêşa Azad, bombebarankirin dijwartir bû, ji ber wê yekê, hemî sivîl ji gund berev bajarê Efrînê ve, derketin. Ji ber hejmara mezin ya derbideran, em sê hefteyan di kilînîkekê de man, bi hêviya ku em vegerin mala xwe li gund, lê hevdemî kontirolkirina gundê me ji aliyê girûpan ve, me hêviya vegerê ji dest da.

Şêrîn serbar dike:

> Di naverasta Adara 2018an dema me biryar da vegerin gundê xwe, me li gel karwaneke sivîlan berê xwe da Cindirêsê, rêbenda Artêşa Azad rê li ber me girt, û nehişt em derbas bibin, û em birin gundê Hecîlerê, Artêşa Azad bi hezaran kes li vî gundî kom kirin, û ji ber pirbûna kesên dixwestin vegerin gundên xwe, sivîlan şeva xwe di otombîlan de derbas kir, ji ber ku malek nema ku bihtirî pênc malbatî tê de nebe, piştî bûrîna hefteyekê, karwaneke din ji bo berdewamkirina rêya me berev Cindirêsê, hat amade kirin. Karwan birêket, lê Artêşa Azad bi behaneya hebûna mayînan, rê neda em vegerin gundê xwe. Gelek girûp li wê derê hene, her girûpekê endamên xwe hene, û her endamekî yasayeke xwe heye, binpêkirinan bi hemî cor û şêweyan li dijî sivîlên ku biryara vegerê bo zeviyên xwe li şûna çûna navçeyên kontirola Hukûmetê, dane, pêk tînin.

Êrisa Efrînî di şehadeta xwe ji bo Navenda Belgekirina Binpêkirinan de, got

> Koçberkirina ku berev navçeyên Şehbaya Helebê û navçeyên kontirola Hukûmeta Sûriyê rûdane, bandoreke mezin ya nerênî li ser hemî hemwelatiyan, li pişt xwe hişt, bi şêweyekî nişkave û bilez rûda, û xelk bi şêweyekî nişkave derketin û ji ber tirs û mana li çolan, derbasî gundine ku bi mayinan hatine çandin, bûn. Mala min bi tevahî hatiye dizîn, gundê min bi tevahî mayinkirî bû, piştî ezmûneke pir nexweş li Şehbayê, min bê tefkîr biryar da vegerim gundê xwe, gundê hemahema vala bûye, û girûpên çekdar bi diziyê ve mijûl bûn.

Piştî derbasbûna du mehan li ser destpêkirina operasiyona «Çiqla Zeytûnê», Hêzên Turkiyê û girûpên alîgirên wê yên Sûrî karîn seranserî bajarê Efrînê kontirol bikin, ala Turkiyê li ser saziyên fermî li bajêr hat bilindkirin. Dema me pirsa egera vegerê ji şahithalan bo bajar û gundên xwe kir, gotin ku ew venagerin yan niha hizir nakin vegerin, ji ber gelek sedeman, weke binpêkirin, bandora şer, kiryarên diziyê, girtinên bêserûber, desteserkirina xaniyan, û dana wan bo kesên din.

# El-Nusra / Desteya Tehrîr El-Şam

Serbarî dorpêçkirin û topbarankirina wê li ser gundine Şî`î weke Kefreya û Fû`a, El-Nusre bejdarî rêkeftinine tayîfî yên koçberkrinê bûye, dinav de jî Kefreya û Fû`a, û binpêkirin û tawan li dijî Elewî û Durziyên sivîl encam dane ku bû sedema koçberkrina sivîlan ji navçeyên xwe.

Di 27ê Gulana 2015an de, Kenala El-Jezîre ya Qeterî hevdîtinek[83] li gel Rêberê Eniya El-Nusre yê bi «Abû Muhemed El-Colanî» tê naskirin, weşand, El-Colanî di hevdîtinê de, hewlwestên xwe beramberî Elewî û Durziyan şirove kirin û got ku ola wan şaş e û ew weke derketî ji «ola Xwedê» bi nav kirin. El-Colanî Elewî weke tayifeyeke ku ji «ola Xwedê» derketiye bi nav kir û got ew ne ji «Xelkê Islamê» ne, El-Colanî mercek li pêş Elewiyan danî heta ku ji aliyê Eniya El-Nusre ve ewle bimînin: Veger ji «şaştiyên ola xwe», veger bo Islamê, danîna çek, piştevanînekirina Beşar El-Esed.

Derbarê Durziyan, El-Colanî got ku hin şaştî di ola Durziyan de hene û El-Nusre kar ji bo serastkirina wan şaştiyan dike, û serbar kir «Derbarê perestgehan, tiştek hebû ku ji Şerî`etê derdiket, hin gorên wan hene ku mezargeh in, ew yek şirk e, me ew dûrî vê yekê kir». El-Nusre li navçeyên kontirola xwe, perestgeh û mezargehên Durziyan yên ku El-Colanî wan bi «şirk» bi nav dike, wêran kirin, û Durzî neçar kirin ku guhertina ola xwe, rabigînin.

Di 10ê Hizêrana 2015an de, piştî derbasbûna du hefteyan li ser hevdîtina El-Colanî li ser kenala El-Jezîre, El-Nusre komkujiyek li dijî sivîline Durzî li gundê Qelb El-Loze, pêk anî. Piştî ku El-Nusre hewl dida dest deyne li ser xaniyên Durziyên sivîl, endamên El-Nusre êrîşî sivîlan kirin û ew bi Kufrê tometbar kirin û gule berdane wan, bihtirî bîst kesî kuştin, dinav wan de kesên bi temen û zarok jî hebûn. El-Nusre ji berpirsyaretiya xwe derbarê wê komkujiyê revî û soz da ku pêkîneran siza bide, lê ti raport derbarê dadgehkirina pêkîneran, tunene.

Sala 2011an, hejmara niştecêyên gundê Qelb El-Loze derdora 2000 kesî bû, sala 2015an hejmara niştecêyên wê derdora 300 kesî bû. Sala 2015an El-Nusre Biryara desteserkirina xaniyên Durziyan ên vala[84], desrxist, piştre dest danî ser 60 xaniyî li gundê Qelb El-Loze.

12ê Cotmeha 2015an, El-Colanî banga armanckirina Elewiyên sivîl kir:

> **Divê şer û armanckirina gundên Nuseyriyan li Laziqiyê werin gurkirin, û ez bang li hemî girûpan dikim ku bihtirîn top û mûşekan kom bikin û rojane bi sedên mûşekan bavêjin gundên Nuseyriyan, weke ku ew xirapkar bi ser bajar û gundên Sune pêk tînin.[85]**

83 » Bîla Hudûd |Ebû Muhemed El-Colanî..Stratejîka avakirina Artêşa El-Fetih û erkê Eniya El-Nusre li Sûriyê (1)« El-Jezîre, 27ê Gulana 2015an.

84 Durziyên »Qelb El-Loze« hurguliyên komkujiya El-Tûnisî ji bo »El-Mudun« vedibêjin, El-Mudun, 12ê Hizêrana 2015an.

85 Weke bersiv li ser bombebarankirina Rûsî, El-Colanî banga gurkirina êrîşan li ser cihên Elewiyan li Sûriyê dike, Rueters, 12Cotmeha2015an,https://www.reuters.com/article/oegtp-nusra-attacks-ea3-idARAKCN0S626E20151012

## Koçberkirina gundê Iştebreq

Di Nîsana 2015an de, Artêşa El-Fetih derbasî gundê Iştebreq yê Elewî li Idlibê bû, bi dehan kes kuştin, dinava wan de sivîl jî hebûn, û zarok û jin weke rehîne, revandin. Artêşa El-Fetih ragihand:

> Dema em derbasî Iştebreq li başûrê Cisir El-Şuxûr li Idlibê bûn, me jin û zarokên tayîfa Elewî kom kirin û me xwarin da wan, me lîstik dane zarokên wan, û me ji bo danûstandinê li ser jinên ku Rêjîmê dîlgirtine,[86] peywendî bi Rêjîma Sûriyê re kir.

Niştecêyên Iştebreqê ku neketin destê El-Fetih, berev navçeyên Hukûmeta Sûriyê, revîn.

Sala 2018an, weke beşek ji Rêkeftina derketina Opozisyonê ji Kampa El-Yermûk, Artêşa El-Fetih rehîneyên mayî serbest berdan.

Raporteke rojnamevanî ezmûna yek ji jinên rehîne ku ji aliyê Artêşa El-Fetih li Iştebreqê hatibûn revandin, weha wesif dike:

> Dema ku Artêşa El-Fetih bav û hersê birayên Şirûq Fexro kuştin û ew li gel dayika wê revandin, piştî ku herdu lingên wê birîndar bûbûn, Şirûq wê demê zarok bû. Şirûq li gel dayika xwe sê salan weke rehîne li cem Artêşa El-Fetih man, di dijwartirîn rewş û dûrî xwendin û jiyana xwe ya normal de, bû. Dema Şirûq li gel dayika xwe û rehîneyên din, serbest hatin berdan, çû Laziqiyê heta ku li gel kesûkarên xwe yên ku ji Iştebreqê rizgar bûne, bijî.[87]

86 El-Muhêsnî: Redkirina Rêjîmê ji pevguhrtina dîlgirtiyan nayê wateya gihandina ziyanê bo girtiyên Içtebreqê, El-Quds El-Erebî, 10ê Gulana 2015.


87 Keça Iştebrq, Şirûq Fexro, tehediya şer dike û di xwendina bingehîn de bi ser dikeve, Q Media, 20ê Îlûna 2019an. https://qmedia.one/news/abnh-ashtbrq-shrwq-fkhrw-tthda-alhrb-wttfwq-fy-shhadh-altalym-alasasy

# Dewleta Islamî li Îraq û Şamê-DA`IŞ

Tevî kurtiya rêjeyî ya dema kontirola DA`IŞ li ser rûberine ciyografî berfireh li Sûriyê weke desthilateke hukumdar ji sala 2013an heta sala 2019an, lê DA`IŞ bû sedema bicîkirina siyasetên Endazyariya Demografîk ya berfireh û bilez, hîn jî berdewam e heta piştî DAIŞ kontirola xwe li ser niştecê û avahiyan ji dest da jî. zanîna çarçove û giştgîriya Endaziyariya Demografîk ya ji encama avakirin û ketina DA`IŞê, pêwîstî lêkolîneke yekgirtî ye, lê em ê kurteyeke destpêkî di vê raportê de derbarê wê yekê, pêşkêş bikin.

Hîn piroseya Endazyariya Demografîk ya girêdayî DA`IŞê, berdewam e, herweha çawaniya rûbirûbûna aliyên li ser DA`IŞ bi ser ketine, bi rewşa niha ya niştecê û avahiyan, asta timamkirina van aliyan ji Endazyariya Demografîk ya li ser destê DA`IŞê dest pê kiribû, destnîşan dike.

Di asta herî berfireh de, DA`IŞê derdora sêyekê xaka Sûriyê sala 2015an, kontirol kir, û direndetirîn tawan bi armanca tirsandina niştecêyên li jêr desthilata wê, encam dan, û tenê yek rengê ol û hizran li navçeyên kontirola xwe, feriz kirin [88]. Hevdemî kontirolkirina navçene nû ji aliyê DA`IŞê ve, DA`IŞê tawanên işkencedan, destdirêjiya sêksî, jinavbirina esnî, jinavbirina bi kom, destnanîn li ser mulkan, girtin û bikaranîna zarokan weke serbaz, encam dan. Ji ber van kiryaran, niştecê ji navçeyên kontirola DA`IŞê direvîn, û hin niştecêyên din ji navçene ku dihat pêşbînîkirin ku DA`IŞ dê kontirol bike jî, direvîn. Weke mînak li Kobaniyê[89], ji ber êrîşên DA`IŞê sala 2014an, derdora 150 hezar kesî ku piraniya wan kurd bûn, û hin ji wan koçberkiriyên berê bûn, koçber bûn.»




Navçeyên kontirola DA`IŞê ji sala 2015an heta sala 2019an, BBC, çavdêriya milmilaniyê

88 "Two Years an ISIS Slave", 26 June 2017, Mansour Omari, the Daily Beast, https://www.thedailybeast.com/two-years-an-isis-slave

89 » Rêxistina DA`IŞ dibe sedema koçberkirina bi neçarî ya derdora 150 hezar kesî ji Kobaniyê21 ,«ê Îlûna 2014an, Tora Sûriyê ya Mafên Mirovan, https://sn4hr.org/arabic/2014/09/21/2100/

# Koçberkirin û wêrankirin di şerê li dijî DA`IŞê de

Serbarî wê yekê, ji ber şerê li dijî DA`IŞê bi sed hazaran kes hatin koçberkirin, piraniya wan venegerane yan nikarîne vegerin yan ji bo vegerê bo navçeyên xwe yên resen yên li jêr destê Hêzên Sûryaya Demokratîk û Hêzên Hukûmeta Sûriyê û Opozisyona Sûriyê ya ku Turkiye piştevaniya wê dike, hatine qedexe kirin.

Hêzên Emerîkî şerekî asmanî li dijî navçeyên li jêr destê DA`IŞê pêk anî, rêxistinine mafên mirovan yên navdewletî ziyanên sivîl û wêrankirina giştî ya avahiyan, belge kirine. Weke mînak, li Reqayê, Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî[90] got ku ji encama hilmeta leşkerî ya Hevpeymaniya ku Wîlayetên Yekgirtî serkirdayetiya wê dike, «bi hezaran sivîl navbera kuştî û birîndar, bûn qurbanî, û bombebarankirina bêrawestan bi dirêjajiya çar mehan wêrankirineke berfireh ya bajêr li pişt xwe hişt, mal û avahiyên wê yên xizmetguzariyê û yên bingehîn, kirin kavil». Wê Rêxistinê herweha di raporta xwe ya derbarê ziyanên sivîl li Reqayê, hilmeta leşkerî weke cengeke jinavbirinê [91], wesif kir, di wê demê de ku sivîlan ji bo derbideriyê ji mal û navçeyên xwe, xwe didan kuştin heta ku ji DA`IŞ û şerê li ser wê, birevin.

Komîteya Vekolînê ya Navdewletî ya Serbixwe ya taybet bi Sûriyê behsa dorpêçkirina DA`IŞ[92] ji taxine li jêr destê Hukûmetê li bajarê Dêrazorê di Hizêrana 2014an, kir. Alîkarî ji bo sivîlên dorpêçkirî bi rêya balafirxaneya sereke ya li jêr destê Hukûmetê dihatin gihandin. Bi dirêjahiya sê salan, bihtrî 200 hezar kesî ku li taxitine pir niçtecê yên bajarê Dêrazorê dijiyan, rastî astengiyên zêde, dihatin, ne Hukûmetê û ne jî cîhanê, nikarîn alîkariyên pêwîst ji bo hemî niştecêyan, peyda bikin.

Di Îlûna 2017an de, Hukûmeta Sûriyê ragihand ku Hêzên wê dorpêçkirina ji aliyê DA`IŞê ve, şikand. Tevî ku ew navçe rastî «Rêkeftina valakirinê» nehat, lêbelê operasiyonên asmanî û bejayî yên şerê li dijî DA`IŞê li Dêrazorê, yek ji mezintirîn pêlên derbideriya navxwe ji destpêka milmilaniyê ve, bi xwe re anî. Ji destpêka Tîrmeha 2017an, bi deh hezaran ji Sûriyan ji mêr û jin û zarokan ji Dêrazorê - dinav de jî kesên berê hatibûn dorpêçkirin - bo kampine biyabanê ku ji aliyê Hêzên Sûryaya Demokratîk (HSD) li herdu parêzgehên Bakurê Reqa û Hesekê, têne birêvebirin, hatin veguhestin, û bi deh hezaran bi şêweyekî ne yasayî di serbazgehên derbideran de, hatin girtin. Hejmara derbiderên ku ji parêzgeha Dêrazorê ji Tîrmeha 2017an ve reviyane, gehişt derdora 230 hezar kesî.

Piraniya tedabîrên taybet bi vê wêrankirina giştî û bikaranîna hêza zêde, di çarçoveya giringiya leşkerî ji bo bidawîkirina şer û jinavbirina DA`IŞê, de bûn. Tevî ku dibe ku hejmarek ji van tedabîran nerast bin jî, û pêkanîna tawanine cengê li dijî sivîlan û li dijî Cihên Sivîl, red nakin, lê ev hemî tedabîr piştî bidawîhatina şer, dê bêsûd bin, û dê bikaranîna rewşa peydabûyî ji aliyê Hêzên serdest ve ji bo timamkirina piroseya Jinavbirina Bajaran, di çarçoveya Endazyariya Demografîk ya berfireh de, ne behane bin.

---

90 » Cenga li Reqayê: Kurteraport«, Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî, https://raqqa.amnesty.org/ar/briefing.html

91 » Cenga jinavbirinê: Ziyanine dijwar dinava sivîlan de li bajarê Reqaya Sûriyê2013 ,«, Rêxistina Lêbûrînê ya Navdewletî, https://www.amnesty.org/en/wp-content/uploads/sites/9/2021/05/MDE2483672018ARABIC.pdf

92 » Dorpêçkirin weke çekekî şer: Dorpêçkirin, birçîkirin, teslîmkirin, valakirin29 ,«ê Gulana 2018an, Komîteya Vekolînê ya Navdewletî ya taybet bi Sûriyê, https://www.ohchr.org/Documents/HRBodies/HRCouncil/CoISyria/PolicyPaperSieges_29May2018_AR.pdf

## Ji bo hemî aliyên milmilaniyê û Hukûmetên ku piştevaniya wan dikin

- Rawestandina yekser ya operasiyonên avakirinê li navçeyên wêrankirî, û şopandina siyaseta rêzgirtina mafên mulkiyetê li gorî Pîvanên Navdewletî yên Mafên Mirovan weke bingeh ji bo her piroseyeke avakirin yan «dubareavakirin»ê. Nûjenkirina jêrxaneyê ji bo pêşkêşkirina xizmetguzariyan, û berfirehnekirina nûjenkirina jêrxaneyê bi rengekî ku mafên mulkiyetê binpê bike.
- Vekolîn di kiryarên talankirin û destanîna li ser mulkên kesên din, were kirn, pêkîner werin sizadan, û mulk bo xwediyên xwe werin vegerandin û ji bo tişta ku nayê vegerandin, qerebokirina darayî ya dadwerane were dan.
- Pabendî bi Pirensîpên Neteweyên Yekgirtî yên taybet bi vegerandina cihên niştecêbûn û mulkan bo penaber û derbideran (Pirensîpên Bînhîro), Pîvana Navdewletî ya ku mafên penaber û derbideran, dinav de jî vegera ne tenê bo cihên xwe, lêbelê bo mal û zeviyên xwe yên resen, destnîşan dike.

## Hukûmeta Sûriyê

- Standina hemî tedabîrên pêwîst ji bo gerentiya parastina Cihên Sivîl di serdem û piştî operasiyonên leşkerî de, û pabendî bi yasayên cengê yên ku Cihên Sivîl û sivîlan, diparêzin.
- Hesankirina vegera koçberkiriyan bi şêweyekî aram û bi rûmet bo navçeyên berê yên niştecêbûn û zeviyên wan, divê veger bijardeyeke azad, û bê merc be. Bihêzkirina koçberkiriyan bo vegerandina mulûmulkên xwe ku bi şêweyekî hovane yan ne yasayî, ku ew jê hatine bêparkirin, û hilweşandina her pabendiyeke yasayî yan serastkirin yan guhertin derbarê rewşa wan ya yasayî weke xwediyên mulk yan bikarhênerên xanûberan, û vegerandina rewşê bo rewşa ku beriya koçberkirina wan hebû. Avakirina mîkanîzimine bersivdana bilez ji bo pêşkêşkirina darayî ya bilez ji bo koçberkiriyên ku dixwazin vegerin, û dana xanîne demkî ji bo kesên ku xaniyên wan bi tevahî yan bi beşekî hatine wêrankirin.
- Hilweşandina her yasa yan siyasetên Hukûmetê di nivîs yan di bicîkirinê de, yên ku li ser bingeha ciyawaziya navbera hemwelatiyan li gorî dilsoziya siyasî, ne, yan mafên mirovan binpê dike, û rêzgirtin li mafên mulkiyetê ji bo hemî Sûriyên li hundir û derveyê welêt, di nivîs û bicîkirinê de, di hemî mersûm yan yasa yan fermanan de, were kin.
- Pabendî bi parastina yasayî ji bo mafê niştecêbûna guncaw û gerentiyên parastinê ji derketina bi neçarî, û rêkarên ku desteya ku hatine erkdarkirin bi şirovekirina «Peymana Navdewletî ya taybet bi Mafên Aborî û Civakî û Çandê» di dema yasadanana her

yasayeke girêdayî bi «Rêxistinkirina bajarî, bi taybet (a) derfetek e ji bo şêwirmendiya rasteqîne li gel ziyandîtiyan (b) agahdarkirineke demguncaw û pêşbînîkirî ji bo hemî kesên bandor li ser wan hatiye kirin, beriya dema destnîşankirî ya valakirinê (c) peydakirina awayên qerebokirina darayî ya yasayî û awayên din».

* Ragihandina hilweşandina dosyayên firoştin yan veguhestina mulkên niştecêbûn û zevî û mulkên taybet bi koçberkiriyan, yên ku bi neçarî hatine desteserkirin, çi bi şêweyekî rastewxo yan ne rastewxo be, yan bi rêya istixlala neamadebûna bi neçarî ya koçberkiriyan, yan eger ne li gorî Pîvanên Navdewletî yên Mafên Mirovan hatibin encamdan jî, û tekezî li ser wê yekê were kirin ku divê niyazpakî di van dosyayan de, neyê berçavbirin.
* Çareserkirina hemî dozên girêdayî vegera koçberkiriyan û parastina hemî mafên wan, dinav de jî mafên mulkiyet, qerebokirinê, û avakirina komîtene dadwerî bi hevparî li gel civaka xwecihî ji bo dubarexwendina her biryar yan pabendiyên ku ji encama lihevhatinên niştîmanî bin, ew biryar û pabendî di sîbera neçarkirin û rewşên awarte, nebûna vîna azad û guncaw navbera aliyên wê de, hatine imzekirin.
* Pabendî bi hukmên Rêkeftina Viyêna ya Yasayên Peymannameyan û bi hukmên Destûra Sûriyê, û belavkirina Rêkeftinên du alî yên navbera Komara Îranî û Yekîtiya Rûsî de, û helweşandina her rêkeftin yan piroje yan istisnane rêveberî ku derveyê Yasayê ji bo yek ji van hedu welatan yan hemwealiyên wan hatine dan, û destnîşankirina perpirsyaretiyê derbarê her xwesteke ku dibe ku alîne sêyem ji encama ziyanên ku bi destê Îran û aliyên bi ser ve di salên bûrî de, hatine encamdan, pêşkêş bikin.
* Hilweşandina mersûmên ku ji sala 2011an ve derbarê dana regeznameya Sûrî derketine, û avakirina komîteyeke dadwerî serbixwe ku bi encûmena dewletê ya taybet bi xwendina dozên kesên ku hatine bi zegezkirin, re alîkar be, û guncawbûna wan Mersûman li gel hukmên Yasaya Regeznameyê ya jimare 276 - sala 1969an were nirxandin, û regezname ji bo kesên ji aliyê yasayî ve xwedî maf in, bimîne, û ji kesên ku mafê wan tuneye, were vekişandin.

# Opozisyona Sûriyê

* Tekezî û pabendî bi vegera koçberkiriyên bi neçarî bo bajar û bajarokên xwe û rêzgirtin li mafên mulkiyetê weke merc di her piroseyeke danûstandinê de, û weke pêşekiyeke yekalîker ya her çareseriyeke siyasî, û bihêzkirina van mafan bi rêya yasadanan û yasa û sazîne cîbicîkar.
* Ragihandina helwesteke eşkere û zelal sebaret redkirina yekcarî ya her şêweyekî ji şêweyên niştecêkirinê ku desthilata dagîrker ya Turk li navşeyên desthilata xwe, û bi taybet li Efrînê, bicî dike, û kar ji bo serastkirin û lêvegerek ji bo hemî kiryarên peywendîdar, dinav de jî dana nasnameyan bo derbideran yan destkarî di mulkên xanûberan de li navçeyê, û tekezî li ser wê yekê ku tedabîr û rewşa peydabûyî, demkî ne û ti şêweyê domane nastîne, wre kirin.

## Hukûmeta Turkiyê

* Tekezî li ser yekîtî û serbixweyiya xaka Sûriyê, û hilgirtina perpisyaretiyê weke desthilateke dagîrker sebaret ewlekariya sivîlan li navçeyên desthilata wê û sebaret maf û azadiyên wan ên bingehîn.
* Rawestandina binpêkirinên mafê mulkiyetê û kiryarên Endazyariya Demografîk, û vegerandina mafan bo xwediyên xwe û qerebokirina hemî qurbaniyan.

## Rêveberiya Xweser ya Demokratîk

* Pabendî bi peymana Girêbesta Civakî ya Rêveberiyê û bi taybet pêşekiya wê, ku wekheviyê navbera hemwelatiyan de bê ciyawazî, destnîşan dike.
* Gerentiya mafê koçberkiryan bi rêya vegera xwebexş û ewleh bo malên xwe, ew gerentî di madeya 12 ya Ragihanameya Cîhanî ya Mafên Mirovan û madeya 13 ya Peymana Navdewletî ya taybet bi Mafên Sivîl û yên Siyasî û Rêsaya 132 ji Rêsayên Nerêtî, de hatiye, û standina hemû tedabîrên pêwîst ji bo hesankirina dubaretevlîbûna koçberkiriyan û peydakirina pêdiviyên wan yên sereke.
* Pabendî bi parastina mafê mulkiyetê ku Yasaya Derbasbûna Dema Yasayî li ser nayê bicîkirin û bi veguhestina serweriyê jî nayê rakirin, ew maf di madeya 17an ya Ragihanameya Cîhanî ya Mafên Mirovan, û di Girêbesta Civakî ya Rêveberiya Xweser, û di herdu madeyên 30 - 41 û pirensîpa 21 ji pirensîpên Arasteyî yên taybet bi derbideriya navxwe ya ji aliyê Encûmeta Aborî û Civakî ya Komîteya Mafên Mirovan ya bi ser Neteweyên Yekgirtî de sala 1998an, de, hatiye.

## Neteweyên Yekgirtî û Civaka Navdewletî

* Avakirina mîkanîzimine çavdêriya Navneteweyî yan navdewletî ji bo gerentiya rêzgirtin li mafên niştecêbûn û zevî û mulkên penaber û derbideran, ku yek ji erkên wê, çavdêriya operasiyonên weberhênana derve yên kompanî û weberhêner, û hukûmet û piştevanên navdewletî, ye, bi mercê ku rêzê li mafê mulkiyetê bigire.
* Rawestandina piştguhkirina qurbaniyên koçberkirinê û tevlîkirina wan dinava her piroseyeke girêdayî cihê niştecêbûn û mulk û vegera wan, û bihêzkirina karîna wan ji bo xistina bandorê li ser standina Biryarên girêdayî çarenivîs û mulkên wan.
* Rûbirûbûn bi cidî derbarê kirîza mafên mulkiyetê yên derbider û penaberan, were kirin, û tekezî li ser wê yekê were kirin ku ev maf bingeheke sereke ye ji bo her piroseyeke çareseriya siyasî li Sûriyê, ji bo gerentiya karîna derbider û penaberan heta ku di dema guncaw de vegerin cihên xwe.

* Kar bi şêweyekî cidî ji bo parastina van mafan û rêgirtin li ber bejdariyê di birîna rehên derbider û penaberan ji cih û warê wan, bi rêya lêveger û çavdêriya operasiyonên piştevaniya darayî ya navneteweyî û navdewletî û operasiyonên nûjenkirin û avakirin û dubareavakirinê di pêşerojê de li Sûriyê.
* Bihêzkirina bejdarî û tevlîkirina penaber û derbiderên navxwe û civakên ku ji derbideriyê ziyan dîtine, di pilana Neteweyên Yekgirtî ya sala 2030î ya taybet bi Geşepêdana Domane de. Handankirina tevlîkirina penaber û derbiderên navxwe di sîstemên sereke yên niştîmanî de, dinav de jî tenuristî û xwendin, ew dê çaverêyî çareserîne domane ji bo derbideriya xwe bimînin. Ango armancên Geşepêdana Domane bê berçavbirin li maf û pêdiviyên penaber û derbiderên navxwe, bicî nabin.

## Neteweyên Yekgirtî

* Peydakirina mîkanîzimine çavdêriya yasayî û darayî navdewletî li ser praktîkên aliyên Bexşer û weberhêneran di warê alîkariyên mirovî de ku gerentiya wê yekê bike ku her piroseyeke piştevaniya darayî yan budceyan, bihêzkirina mafên Sûriyan bike, û li ser aliyên peywendîdar feriz bike ku Wirdbîniya Pêwîst ji bo gerentiya rêzgirtina mafên mirovan di her pirojeyeke nû di çarçoveya alîkariyên mirovî yan di her piroseyeke dubareavirina di pêşerojê de, bişopînin, ew yek jî ji bo gerentiya nebûna destê aliyên Bexşer di veşartina binpêkirin û tawanine berê yan binpêkirin û tawanine berdewam.
* Encamdana lêkolîneke rapirsînî ya giştî ji bo xanûberên ziyanlêkirî, bi rêya avakirina formeke yekgirtî ya daxwazan ku weke belgeyeke yasayî were dîtin, û pişt bi belgeya mulkiyetê yan girêbesta bikirêdanê yan her belgeyeke ku bikaranîna xanûberî û hejmara kesên tê de dimînin, piştrast dike, girê bide, bi rêjeya yek daxwaz ji bo her malbatekê, û berçavbirina haletên kesên selt «zewacnekirî» di niştecêbûna xwe de. Peydakirina pereyan ji aliyên Bexşer ve ji bo hewlên lêkolîna ku weke bingeh e ji bo siyasetên pêşerojê yên qerebokirina ziyanê.
* Encamdana rapirsiyeke giştî ya koçberkiriyan bi şêweyekî tevahî serbixwe dûr ji Hukûmeta Sûriyê, û ew lêkolîn weke lêvegera tekane ya ku li ser asta navdewletî pejrandiye, were dîtin, ku weke bingehek ji bo hemî biryar û siyasetên girêdayî dozên veger û dubareniştecêbûn û avakirin û lihevhatinê be, ew yek rê li ber standina Biryarên girêdayî dubareavakirina ji aliyê navdewletî ve piştevankiriye, xweş dike, û rê dide parastina mafên koçberkiriyan û parastina mafên wan.

## Civaka Navdewletî

- Şermezarkirina siyaseta koçberkirina bi neçarî ya niçtecêyan li Sûriyê, bi rêya wesifkirina wê weke tawanine cengê û tawanine li dijî mirovahiyê, û bangewazî ji bo lêpirsîna kes û aliyên ku destê wan di pêkanîna van tawanan de heye, û tekezî li ser bejdariya koçberkiriyên bi neçarî wate bihtirî nîvê Sûriyan, di her danûstandin ya şêweyê çareseriyê û her piroseyeke veguhestina siyasî di pêşerojî de, were kirin.
- Rûbirûbûna tund li dijî kiryara ku weke rêbazkirî û gurkirî li ser destê aliyên milmilaniyê bi mebesta astengkirina vegera xwebexş û aram ya koçberkiriyan, tê xuyakirin weke, û gerentiya tevlîkirina vegera xwebexş ya penaber û derbideran bo navçeyên resen yên niştecêbûna wan, û aramî û silametiya wan dinava hemî rêkeftin û çareseriyên siyasî de.
- Gerentiya guncawkirina Biryarên ku têne standin yên girêdayî veger û qereboyan li gel Yasaya Navdewletî ya Mirovahî û Pîvanên Navdewletî yên Mafên Mirovan, herweha li jêr çavdêriya alîne serbixwe bin û karê pêşîn be ji bo mafê vegerandina mulkên koçberkiriyan, û eger ew yek pêk nehat, ew bêne qerebokirin.

## Civaka Sivîl ya Sûriyê

- Avakirina tîmine awarte yên yasayî li ser asta niştîmanî ku ji parêzer û mafnas, û şarezane xanûberan pêk tên, ku li ser erdê û ji dûrve jî kar bikin, bi rêya xizmetguzariyên hêla gerim ji bo danasîna koçberkiriyan bi mafên wan û hewldan ji bo xwedûrxistin ji egera rûdane her coreke milmilaniya yasayî, bi armaca bihêzkirina serweriya yasayî, û kar ji bo avakirina toreke çalakvanên cihê baweriyê heta ku li gel operasiyonên vegera bi kom di pêşerojê de, amade bin û wan operasiyonan belge bikin.
- Belgekirina berdewam ya yasayî ya pilanên rêxistinî û binpêkirinên mafên mulkiyetê, û çavdêriya berdewam ya rewşa weberhênan û dubareavakirinê li Sûriyê, û peywendî li gel aliyên peywendîdar ji bo zelalkirina binpêkirin û mafan û destnîşankirina berpirisyaretiyan. Agehdarkirina welatên ku van kompanî û weberhêneran himbêz dikin, û avakirina lêkolîn û dosyayên dozên dadgehî ji bo rûbirûbûna kompanî û weberhêneran.
- Berhevkirina pirojeyasayayekê ji bo parastina civakên xwecihî, û erkê dewletê ji bo parastina niştecêyan di navçeyên wan yên dîrokî de û encamdana hewldanên mezin ji bo peydakirina mercên piştevan ji bo mane.
- Tekezî li ser tenê-nekirina dadweriya veguhestinî di têgeha Lihevhatinê de, û pesend-nekirina mîkanîzma Lêbûrîna Giştî ya ser bingeha pêçandina rûpela bûrî û vekirina rûpeleke nû ye, ku ew yek mafê kes û civakê ji bo eşkerekirina rastiyê û parastina bîrdanka niştîmanî û dan bi êşûazarên qurbaniyên binpêkirinên dijwar, winda dike, û pêkînerên tawan û binpêkirinan vedişêre, li şûna wê yekê mîkanîzmine vekolîna rastiyan û şûngirên dozên tawanî werin bikaranîn, ku dê dadweriyeke giştî xwedî karîgeriyeke mezintir di warê aştiya civakî de, bicî bike, yan bi rêya mîkanîzma lêbûrîna taybet ya ku lêkolîn li ser her keskê, bi cuda, dike.

# Kompanî û weberhênerên egerkirî

* Pabendî bi Pirensîpên Mafên Mirovan û Pîvanên Navdewletî, bi rêya bihêznekirina binpêkirinên mafên mirovan, bi şêweyê ku guncaw be li gel «Pirensîpên Arasteyî yên Neteweyên Yekgirtî yên taybet bi Karên Bazirganî û Mafên Mirovan».
* Piştevanî-nekirina darayî ya binpêkirinan yan bejdarî di veşartina wan binpêkirinan de, û kar-nekirin bi Hukûmeta Sûriyê yan bi her aliyekî milmilaniyê re bi armanca timamkirina pilanên ku mafên mulkiyetê binpê dikin.

# Ragihandin û Ekadîmînas

* Encamdana helwên zêdetir, dinav de jî hewlên ji bo vekolînên lêkolînî di kiryarên Endazyariya Demografîk de, dinav de jî koçberkirina bi neçarî û Jinavbirina Bajaran, û peydakirina madeyên ragihandinî bi hemû şêweyên xwe, ji bo hişmendkirina Sûriyan derbarê mafên wan yên niçtecêbûnê û mafên mulkiyetê.
* Bihêzkirina qurbaniyên ji hemû aliyan, bi rêya derbirîna nerînên wan û gihandina deng û çîrokên wan bo alavên ragihandinê.
* Berhevkirina lêkolînine ekademî girêdayî Endazyariya Demografîk û alavên wê, dinav de jî Endazyariya Demografîk û Jinavbirina Bajaran li Sûriyê, ew yek jî bi mebesta dagirtina valahiya mezin di lêkolînên ekademî yên di vî warî, de ye, dinav de jî yên girêdayî hejmar û navçeyên resen yên koçberkiriyan û navçeyên wan ên piştre lê niçtecê bûne, û mafên mulkiyet û kiryarên aliyên desteser li Sûriyê.
* Duristkirina nexşeyeke giştî ya karlihevker ya mulkiyetê heta ku mulkên kesî û yên hukûmî û mulkên din li seranserî Sûriyê bêne xuyakirin, bi taybet li navçeyên wêrankirî.

# Lîsteya çavkanî û jêderên zêde



| | |
|---|---|
| 1 | 1959, Dawûd Iskender - Girava Erwad navbera dema bûrî û niha de- Çapxaneya El-Tereqî, |
| 2 | 5002, Yasîn El-Hazfiz, Hemû berhemên Yasîn El-Hazfiz li Beyrûtê, Navenda Lêkolînan ya Yekîtiya Erebî, |
| 3 | 2015, Farûq El-Şiri`, Romana windabûyî, Navenda Erebî ya Xwendin û Lêkolînên Siyasî, Çapa yekem |
| 4 | 2012, Semîr Imxar, Ixwan El-Nuslimîn li Ewropayê: Lêkolîneke şirovekarî li ser rêxistina islamî, Pirtûkxaneya El-Iskenderiye |
| 5 | 1 Îmanuwêl Kant, pirojeyeke aştiya herdem, wergera Dr Osman Emîn, Pirtûkxaneya Angilo-Mirsî T |
| 6 | Cad El-Kerîm, Bandora cengê û aboriya siyasî li ser saziyên kerta giştî (Koka navendî ya desthilatê), Navenda Lêkolînên Komara Demokratîk, 2015 |
| 7 | 2010, Kovara El-Hîwar, taybetmendiya Doza Kurdî li Sûriyê, herdu hejmarên (62-63), sala 17an Cotmeh, |
| 8 | 2013, Cûrdî Gorgas, Tevgera Neteweyî ya Kurdên Turkiyê li sirgûniyê, wergera Corc El-Betel, Dar Aras - Erbîl. |
| 9 | 2013, Wedî` Ciwîde, Tevgera Neteweyî ya Kurdî, destpêkirin û pêşketin, komek ji wergêran, El-Farabî - Beyrût |
| 10 | 1992, Hamid Mehmûd Îsa, Kêşeya Kurdî li Rojhilata Navîn ji destpêka xwe ta sala 1991ê, Qahîre, |
| 11 | 2012, Dr Muhemed Hamid El-Ahmerî, Rehên demokrasiyê û pirsgirêka cîbicîkirinê, Tora Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê |
| 12 | 2004, Dêvîd Mekdol, Dîroka Nû ya Kurdan , wergera Rac Al Muhemed, Dar El-Farabî, Beyrût |
| 13 | Beşîr Zên El-`Abidîn, 2008, Artêş û Siyaset li Sûriyê, Çapa yekem, Dar El-Cabiye |
| 14 | 1994, Nezîh El-Eyûbî, Mezinkirina Dewleta Erebî, Navenda Lêkolînên Yekîtiya Erebî |
| 15 | Fuwad (Mûsa 1982), Nezanebûn û Geşepêdan, lêkolînek li ser pêşketina aborî - Dar El-Musteqbel El-`Erebî, Beyrût, Lubnan |

FRIEDRICH NAUMANN
STIFTUNG Für die Freiheit.
Lebanon and Syria

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûriyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression